
roman

SIDQIYÊ HIRORÎ



# Kurê zinarê serbilind

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Kurê zinarê serbilind

# Kurê zinarê serbilind

SIDQIYÊ HIRORÎ

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

**Sidqiyê Hirorî:** Kurê zinarê serbilind

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Sidqiyê Hirorî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-6-2

Çapa kevin: Nûdem

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike û di Internetê de bêxe malpera xwe.

*Ev romana min diyarî ye bo dayika min ya pir dilovan*
*û bo canê babê min.*

## Pêşgotineka pir kurt

Min nivîsandina vê romanê di sala 1991-ê de bi dawî anîbû, lê ji ber egerên diravî ez neşiyam wê çap bikim.

Ez, her li vir, dixwazim bibêjim ko nameya li dûmahiya romanê cih girtî pêkhatiye ji naveroka du nameyên hêjayan Rêving Hirorî û Hikmet Hirorî ko her di wê demê de di rojnameya Kurdistan Press de ya ko li Swêdê dihate weşandin hatibûn belav kirin û name ji birayê min Fewzî Hirorî re hatibûn şandin. Herweha ji bo alîkariya hêjayan Rênas Awdal, Elî Belo û Fewzî Hirorî spas dikim.

**Sidqî Hirorî**

## – 1 –

— Dê kî ve çin? bi erebî û bi dengekê xinzirî û bilind serbazî pirsyar ji wan kir. Lê ji kî ve dapîra Zuleyxa û neviya wê Besna erebiyê dizanin! Ajoyê otomobîla pîkap, ya ko Zuleyxa û neviya wê li pişta wê siyar, bû wergêr di navbera serbazên ereb û dapîrê de :

— Dê kî ve çin?

— Kanîmasê.

— Hûn ji kî ve tên?

— Ji Deşta Sêmêlê.

— Çi karê we li Kanîmasê heye?

— Birazayeka min miriye û em dê çin taziya wê.

Piştî bi silametî derbaskirina her zalgehekê, dapîra Zuleyxa qurçek li tifa di gewriyê de asêbûyî dida û pal dida xwarê û digote Besnayê:

— Dê Besê, eve jî çû, ka li ya têt dê çi bi serê me hêt û dê çi pirsyara ji me kin?

Ji Sêmêlê heta Kanîmasê ji pazde zalgehan bêtir di rêyê de bûn. Evca were dil tena di wê rêyê de here û were û li wan her pazdehan te rabiwestînin û te bi pirsyara bializînin.Te bînin û bibin û weko tirî te li zirkê bidin, bes ji bona ko bihanekî li te hilbêxin û ya din dê ew be ya dilê wan dixwaze, hizra dapîrê bi hindê ve mijûl bû.

Li paşiya otomobîla pişt berdayî qute quta dilên wan bû. Tehirka tavê bû û pîkap gelek bi lez diçû, ba dişeqand. Ji ber wê lezê, bayî xwe bi hêz li navçavên dapîrê û Besnayê dida. Lewma Besanyê dersoka xwe ya rengîn û gulgulî weko dapîrê di bin guhên xwe re birbû û baş girêdabû, da ko ba pirça wê qijevij û belav neke.

Qolekê otomobîla di ber wan re buhurî. Zîlên leşkerî bûn û hejmara wan ji sêzdeyan bêtir bû. Xuya bû ew ji devera wan dihatin û ber bi Zaxo diçûn. Piştên wan tijî tişt û mişt û kincir bûn. Xudanên tişta jî li ser barên tiştan bû. Serbazan jî wesa bi lez li tirimbêlan dixurîn, ne ageha wan ji rê hebû neku kesek yan canewerek bikeve ber û ne jî dilên wan bi wan kesan dişewitîn, ewên li piştên tirimbêlan li ser tiştan, ewên hêj rondik di

çavan de zuhanebûyî. Yên ko hêj çavên wan li pişt xwe digeriyan û wan mîna tevrê Ferhadî gir û çiya kun dikirin û ya ko bi serê wan û Şirîna wan hatî didît ve.

Iraqê, ew bi darê zorê ji gundên bab û kalan rakirin û bi lez û bez navmaliya heyî, tişt û miştên wan, havêtine ser pişta wan erebeyan. Her sê çiwar mal û tiştên wan di zîleka leşkerî de. Paşî û li pêş çavên wan agir berda gundên wan, berda xanî û dar û baran, berda darên sêvan û hemî fêqî, heta yên xêve jî ketiyê û gehiştîn.

Besnayê gote dapîrê:

— Diyar e ev mişext û derbider kirin?

— Ma dê çi be ji bilî wê! Zordar e û ya divêt dike. Xulî bi serê me kurdan werbû. Hema hindî min dîtî û guh lêbûyî her ya me koçerî bû û koçerî ye. Her rojekê em li dereka din û li bin sîvandeka din in û nahêlin em bo xwe li cihekî vehewyên û binecih bibin. Were li ser axa xwe derbider û biyanî be!

— Erê dapîr, tu dibêjî wecek di vê hatina me de hebe?

— Kiça min, halê me jî bi halê vî xelkî û çi nema ye, ha em dê gehin binecihê.

— Lê tirsa min zalgeha Bêgova ye, neku li wêderê sergêjiyekê ji me re çêbikin. Xwe hema ew e zalgeha ji hemiyan pîstir. Dibêjin heta jinan jî tînin xwarê û seh û siya cil û bincilkên wan dikin, neku kaxezek, tiştekê qedexe di nav de veşartî be.

— Ma te nezaniye? Nê Hela Îsivî li wê zalgehê hat girtin.

— Hela Îsivî! Kengî ?

— Berî şeş heft rojekan. Dibêjin kurê wê, ewê li nav Qeşûriyan ji wê û babê xwe re nameyek hinartibû. Helê jî çûbû Kanîmasê bo ko tiştekî ji wî kurê xwe bizane; ka di çi rewşekê de ye. Li wê derê niyasekî nameya kurê wê da destê wê. Piştî ko kaxez jê re tê xwendin û li şûna ko bidirîne û bavêje, têxe di berîka xwe de. Çepelên zalgehê kaxezkê di berîka fîstanê Helê de digirin.

— Ma tiştekî wesa ko li ser bête girtin tê de hatibû nivîsandin?

— Ma dê çi ji bilî silavan û pirsyara saxî û silametiya dayik û bab û xizm û niyasan tê de be. Her çend e Hecî Îsivî digot ko kurê wî di kaxezkê de nivîsîbû »Heke we divêt, werin vê derê cem min. Li nik me, nuke rehetî ye«. Lê mihanekê weha biçûk bes e ko mirovî pê bidin girtin û rezîlkirin.

Dema ew nêzî zalgehekê dibûn çavên dapîrê serevrazî esmanan dibûn û nimnimek ji bin lêvên wê dihat. Piştî ko ji her zalgehekê qurtal dibûn,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wê hêv dikire esmanan û digot:

— Hezar cara şukur bo te Xudêwo, vê carê jî çi nehate serê me.

Çavên herduwan, ji Xîzava ber bi Bêgova, man girêdayî Zinarê serbilind. Ew Zinarê bi hezareha çîrokên evîn û berxwedan û xweragirtinê di nav xwe de werpêçayîn. Dapîr, bi hizra xwe derbasî serê Zinarî bû. Havîn bû, lê hîn keviyên befrê xwe bar nekiribûn. Gundiyan gelek berif dakiribû kombefrê. Rêbasan bi terînî û mizetama xwe tama devê wê xweş dikir.

Kaniyeka ava tezî li wir bû, dapîrê jî wekî giş bêriyan, bi lepan, av jê vexwar. Av hinda sar bû, xiyar di tezîtiya wê de şeq şeq dibûn.

Berêveyî Zinarî, pez li ber bêrê bû û şivan jî li ser berekî di navbera herdu rêzên bêriyan, yên li hember hev de, mîna qiralekî rûniştibû. Bêriya rêya du seetan bi pêyan ji gundî bo cihê bêrê qetandibû. Ew li ber sîngê şivanî bûbûn du rêzên beramberî hev û pez di navbera wan herdu rêzan de ber bi şivanî diçû. Her bêrîvanekê peza xwe jê digirt û didot û paşî berdida. Ya peza wê ji destan vedirest, şivanî serê wê digirt û vedigerand bo ber destê xudana wê.

Her di wan gavan de dengê şivanî bilind dibe, qêr dike lavje û stiranan. Mil dihejin, xuryan berdibe pêyên wan, êdî bêrî hew xwe digirin û dibe sema û govend. Zuleyxa serçemkê dawetê digire û dişarîne. Kenî û tirane û henek û laqirdî bê dawî dimînin û wan çel û çiyayan bi can diêxin. Bêrî xwe ji bîr ve dikin û dereng vedigerin mal û li ber derazînkan pitpit li benda wan bûn ka çima ew dereng vegeriyane.

Dengê Besnayê ristika bîrhatinan li dapîrê piçand:

— Dapîr te ageh ji xwe hebe em gehiştine zalgeha Bêgova.

Li zalgehê û wekî hemû caran serbazan bi tivengên xwe yên lûliyên wan arasteyî hat û çûyiyan kirîn, rê li tirimbêlan girtibû. Tirimbêl bi xwe nikaribûn li nêzîkî zalgehê lezê bikin, ji ber ko li pêşiya her zalgehekê û ji herdu aliyan ve, bi dirêjahiya sê çiwar metran, astengên weha ji axê çêkirine ko çi otomobîl nikaribin bi lez li ser bajon û ji zalgehê û rawestandinê baz bidin. Xuya bû ko ew gelek ji xwe ditirsiyan, lewma wan astengine ji wî rengî li ber zalgehan durist kiribûn. Tirsa wan ew bû neku kurdek bi erebeya xwe, bi lez bihêt û narincokekê bavêje nava wan û biçe, yan jî erzaq û qûtekê mişe bi xwe re derbas bike. Ji xwe, mebesta wan ya rasteqîne ji deynana wan zalgehan bi wî awayî ew bû ko hebûna xwe ji xwecihên Kurdistanê re biselmînin û bibêjin:

— Ev em li her derekê hen e, hema hûn axiftinekê yan karekî li dijî me

bikin, hûn bi silametî ji destên me qurtal nabin.

Zalgeh bi xwe çeşnekê tirsandin û kontrolkirina xelkî ye, bo ko serê xwe ji bo yasa û rêdarên wan biçemînin, rejîmên welatên devera me weha fikir dikin, ev hizir di serê dapîrê re xulxulîn.

Serbazan dapîr û Besna ji paşiya pîkapê înane xwarê. Serbazekî pirsiyar ji şoferî kir ka ew herdu jinên bi wî re, li sîngê tirimbêlê rûniştî kî ne. Wî jî bersiva wan da û got:

— Eve jina min e û ya din keça min e, bi destê xwe nîşa serbazî dan.

— Dê kî ve çin? serbazî pirsyar jê kir piştî ko ew jî peyakirîn.

— Bazarê sêva ye, şoferî welam da. Qewl e ez sêva li Mayê yan Kanîmasê bikirim. Dê çim sehkimê ka dê bi dest min bikevin yan na.

— Çima jin û keç bi te re ne? bi torebûn serbazî got.

— Ji bo hedarî û bona ko arîkariya min di barkirinê de bikin, eger hat û min kirîn.

Serbazine din mijûlî erebeyê bûn. Dihilişkaft, ka çi tê de ye. Eger hat û wan tiştek dît û dilê wan çûyê, li cem wan çi ji wê hêsantir nebû ko ji xwe re hilbigrin. Ma zehmetiya wê çi bû; hema da bêjin ev tişte yê qedexe ye û na be tu bi xwe re bibî deverên li bin kontrola pêşmergeyan û bi wî rengî ew tişt dibû yê wan. Ma çi ji dest xudanî dihat, hema wî lêvên xwe ji serêk rabikirbûna û bigota na, ne weha ye, dê qontaxên tivengan daweşiyabanê û ew jî dê bi tiştan re biçûya. Li cem wan normal bû ko dereweke pêve binin û wî li atafekî bidin.

Serbazek bi koma pirsiyarên xwe yên tamsar li dapîrê û Besnayê zivirî û di ber re çavekê xwe li Besnayê diniqand. Besnaya bestezman jî serê xwe çemand û êdî ne rakir heta zalgehê rê daye şoferî ko neferên xwe bibe û biçe.

Piştî ko otomobîlê daye rê û ji zalgehê dûrketî, dapîrê bêhna xwe hilkêşa û destê xwe yê rastê bi ser dêmê xwe de anî xwarê û nimnimek jî kir.

— Me şofêr wesa têgihandiye ko em dê çine Kanîmasê, baş e tu dibêjî çi tirs tê de nebe em li van dera peyabibin û tu dibêjî ko şofêr çi şika ji me nebe? Besnayê ev pirsyare ji dapîrê kir.

Dapîrê jî xwest Besnayê tena bike, evca gotê:

— Besê! di xema hindê de nebe. şofêr jî dizane em naçin Kanîmasê. Ew jî xwelîpêwerekê wekî me ye û ma kî dibêje ew dê ji bo kirîna sêvan biçe Kanîmasê! Kî nabêje wî jî mîna me karekê din heye, lê ditirse rastiyê bibêje. Manê van dagîrker û çepelan em hînî derewan jî kirin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hê gundên rex û rûyên cehdeyê nehatibûn rakirin. Dapîrê baş mêze dikire rêyê ji bona ko wî cihê ko dê lê peyabin derbas nekin. Wê ew rê baş nas dikir, ew bi sedan caran tê re hatibû û çûbû û xelkê wan gundên ser rêyê jî, yên hevjiyê xwe nas dikirin.

Nêzîkî gundê Girka bûn. Dapîrê ji Besnayê xwest ko destê xwe li camê bi rex şofêrî ve bide bo ko otomobîlê rabiwestîne da ew jê peya bibin. Şofêrî jî pîkap da aliyekê rêyê û rawestand. Du serbazên Iraqî wêvetirî wana bûn, demê wana dît ko erebe rawestiya, ew ber bi wê ve hatin. Piştî ko dapîr peyabû,wê destê xwe bire berîka fistanê xwe û kefîkeka werpêçayî jê anî derê û gote şofêrî:

— Ezbenî kes û karên me li Girkan e û me li bere em biçin seredana wan. Digel axiftina xwe dapîrê kefîk vekir û pereyên qurmiçandîn xuyabûn. Çavên lêxurê pîkapê lê bûn, wî derfet neda wê ko qala pereyan bike û yekser gotê:

— Baş e dayê, pereyên xwe rake û hûn bi xêr biçin.

Lê dapîrê xwe gîro kir û xwest kiriya otomobîlê bide û şofêrî jî dixwest ew biçin hê serbaz vêra negehiştîn, lewma berê xwe da serbazan û got:

— Dayê! Pereyên xwe bike di berîka xwe de û pêyên xwe sivik bikin hêşta serbazên henê nêzîkî me nebûyîn.

Ji nû dapîra Zuleyxa berê xwe da wî aliyê şofêrî çavkiriyê û mebesta şofêrî fêm kir. Ji xwe, dîtina serbazan bes bû ko dapîr bitirse.

— Yê parastî bî kurê min. Mala te ava, axiftina xwe timam nekir. Destê Besnayê girt û sivik pêyên xwe dane rêyê.

Serbazan gazî kire wan, lê ew li pişt xwe ne zivirîn û xwe tê negihand û xwe bi ser ve hay neda. Ji bona ko bela serbazan ji wan vebike, şofêrî pîkapa xwe ajot û bi rex serbazan ve rawestand. Xwest wan mijûl bike heta ko dapîr û nevîka xwe berêveyî çiyakî dibin. Bi erebiya xwe ya şikestî silav kire wan, xurtî li xwe kir û keniyek li ser lêvên xwe perçivand û destê xwe yê rastê dirêjî çekmeçeyê rexê destê rastê kir, du pakîtên cigareyên Bexda jê derxistin û pêşkêşî serbazan kirin. Devên serbazan beşbûn, wan pakît jê setandin bê ko peyveka spasiyê jî ji devên wan derbikeve. Li ciyê spasiyê, wan demildest pirsyarên xwe yên hişk û tamsar arasteyî şofêrî kirin. Di ber re çavên wan weke gurgên birsî diçûn jin û kiça şofêrî.

— Hûn ji kûve tên?

— Ji Zaxoyê.

— Dê kî ve çin?

— Kanîmasê.

— Bo çi?

— Demê sêva kirînê ye û min sêv li wê derê bazar kirine û dê çim sehkimê. Heke em pêkhatin dê barkim û bibim Zaxoyê. Dibe evro êvarî yan subehî bêm ve. Çi pê nevêt, sêv digel min bin dê behra we jî tê de be.

— Baş e em dê subehî jî li vê derê bin, yek ji wan serbazan peyivî. Lê berî seet çarî êvarî were çunkî piştî hîngê rê tê girtin û her kesekê wî wextî hat û çûyê bike tê gullebaran kirin. Bo me sêvên baş bîne.

Destûr dan şofêrî bona ko biçe û çavên xwe berdan ve pey dapîrê û Besnayê. Şofêr ji cihê xwe ne livî, çunkî tirsiya ne ko serbaz bikevin dû pîrejinê û nevîka wê. Evca xwe hebeka din digel wan mijûl kir heta ko di qodîka milê rastê yê pîkapê de dîtî ko herdu jin berêve bûn û êdî nahêne dîtin.

Dil li şofêrî rehet bû, ji ber ko wî dizanî ko serbaz bi tenê bisteh nakin berêveyî wî girî bibin û newêrin biçin nava gundî. Wê çaxê şofêrî xatra xwe ji serbazan xwest û pêyê xwe yê rastê da ser benzînê û ji wan dûr ket. Jina şofêrî serê xwe hijand û got:

— Ho Xudêwo! dê kengî bela van serbazan ji me vebe?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 2 –

Kabaniya wê mala dapîr û Besna lêbûbûn mêhvan gote wan:

— Hema bextê we yê hosa ye, heke her roj vê demê gundiyên we diyar dibûn û qolên wan ber bi gundî diçûn. Eger tiştekê wan ji ber sotin û xerabkirinê yan fêqiyek mabe, wan di zivirînê de, ew digel xwe dianîn. Dê belkî îro êvareka dereng hindek peyda bibin.

— Tu bi Xudê kî, dapîrê bi mereq pirsyar ji kabaniya malê kir, ewan çi behsê gundî dikir? Tiştek jê maye ava yan jî hemî kavil û wêran bûye?

— Te ya rast bivêt, kabaniya malê weha dest bi bersivê kir û lêvên xwe miçandin û axînkeka kûr jî rahêla û dom da axiftina xwe. Dibêjin ber jî li ser berî nemaye, xanî kavil in, rez û dar û bar, gişt sotine û bûne xwelî. Dibêjin ji bilî çend dargûzeka ko hê li xwariya gundî şîn mane, weke din gund hemû wêran e. Ma xwîşkê çawa wesa lê nehêt, nê eve çar cara, ew da ber top û bombeyan û agir berdayê. Manê heke pîla jî be wekî xwe namîne û dê hête helandin. Bes pa gund gundê we ye û li ber dilê we pir şirîn e.

Bi van gotinên kabaniya malê navçavên dapîrê têk diçin û rengekê xemokî bi xwe ve digire. Lewma dema kabanî çûye derê bona ko çayê ji wan re bîne, dapîrê gote nevîka xwe:

— Besê! eger tu hez nekî bêye gundî, tu dişê li vê derê, li hêviya min bimînî heta ez vedigerim.

— Dapîr, eve çi ye tu dibêjî! Besnayê bi nerehetî gotê. Em pêkve hatine û dê pêkve çin û dê pêkve jî zivirin.

Roj ava bû û şevê xwe bi ser deverê de dahêlabû. Ji nû de gund bi jiyan ketibû. Bi şev karwançî, bazirgan û qeçaxçî ji bakûr, ji rexê dî yê tuxîban dihatin. Jajî û penîr, kelleyên şekirê, pez û gelek tiştên din diaîin, Wan ew li vî alî, bi çayê û pertal û dersok û tiştên din yên pêwîst diguhorîn.

Bazarê gilde bi gilde bû, her wekî gundiyan ew bi nav dikir, yan jî bazarê pêguhurkanê yan ser bi ser bû. Tiştê ko li ba te zêde bû, îhtiyaca te pê nebû, te diguhart bi wî tiştê ko pêwîstiya te pê hebû, digel kesekê ko pêwîstî bi metiryalê te, bi mitayê te hebû. Yan jî bo ko ew mita bête birin

bo devereka ko bazarê wî lê hebû. Wî cihî em vedigerandin ve bo serdemê jinûvejîna abûriya tişt û mitayan, abûriya guhartinê.

Hejarî bû û pere jî di dest hemû kesan de nebû. Jiyan jî, diviya birêve biçûya û karê gilde bi gildeyê ji hemû karan bi rahavêjtir bû. Herçend bû, kesine ko bazirganiyeka durust dikir, kirîn û firotina wan bi pereya bû, hebûn û weke her dereka din ya dinyayê destê wan baş û xweş diçûn.

Zilamê wê mala dapîr û Besna lê mêvan hat û gote dapîrê:

— Ez dibêjim heke hûn lêvenebûne û her yên çûnê ne, nuke xweş delîve hilkeftiye. Tava heyvê ye û sê xurt ji gundê we, ko we baş nas dikin, li ser rê ne. Min ew li binê gundî ragirtine û niha li benda we ne. Evca heke hûn hez dikin biçin, lezê bikin û vê re bigehin.

Weha bi şev û li ber tava heyvê, her pênc; sê xurt û dapîra Zuleyxa û Besna, ketine rê ta gihaştine bin cehdeya qîrî. Li wê derê, wan xwe vegirt, çunkî serbaz li hindav rê bûn û hema wan hest bi tiştekî bikira ko li ser cehdeyê yan li wan nêzîkan dilive, dê wan berê agirê çekên xwe bidayê. Xurtê ji hemûyan bi xwe ve tir û mezintir ko navê wî Şêro bû, gote wan:

— Sehkinê, ez dê nuke derbas bim, heke we dît çi ne qewimî, paşî hûn jî derbas bin. Li berahiyê xaleta Zuleyxa û yek ji we û paşî Besna û yê dî. Lê hişyar bin, hema hûn gehiştin ser cehdeyê, êdî ranewestin û li pişt xwe nezivirin û pêyên xwe sivik bikin.

Şêroyî xwe sivik havête ser cehdeyê û zû sê metrên şeqamê birîn û xwe xiste nav tariya dar û baran li aliyê jorî. Li pey wî dapîr û Şahîn derbas bûn.

Ji rexê jorî kuxkekê dijwar ji dapîrê hat. Digel hindê teqeyê jî dest pê kir, lê ber bi aliyê Girga ve, gundê ko jê hatibûn.

Besnayê bi dengekê bi tirsê werpêçayî gote Mîrzayî, xurtê ko pê re mayî:

— Heçku ew bi me hesiyan?

— Nexêr, Mîrzayî xwest wê hêmin bike da ko netirse. Gulle bi rexê gundî ve diçin. Serbaz bi şevê ditirsin, dar û bar li ber wan dibin reşe, evca teqeyê li dewr û berên xwe dikin. Nuke xweş derfet e bo derbasbûnê, ka destê xwe bide destê min û lezê bike.

Mirzayî destê Besnayê girt û wan jî zû xwe gihande rexê din cem hevalan. Li aliyê din û hîn li evrazî sernekeftibûn dema ko şêlikên gulleyan bi ser wî rexê cehdeyê de, yê ko lê derbasbûne, barîn.

— Baş bû me cehde li pişt xwe hêlayî, dapîra Zuleyxa xwest fêmkirina xwe bo rewşê bi vî awayî bîne ziman. Diyar e ji nû bi me hesiyan.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Nexêr, bawer nakim ewan bi me zanîbe, Şêroyî bi vî rengî jê re şirove kir. Lê ev karê wan e. Li demê ditirsin dest bi rex û rûyên çeperên xwe dikin. Paşî dormandorên gundî gullebaran dikin. Piştî hîngê cehdeyê û hemî rêyên nêzêkî xwe. Ji nîva şevê û wêvetir dibe gera topan, çel û çiyayan û gundên rakirî top baran dikin.

Şahînî jî xwe ji babetî bê behir nekir û got:

— Tirsa mirinê ye, heke ma kê ageh ji wan heye. Eger rojekê pêşmerge li van deran peyda bibin ve, hema du sê pêşmerge, bes in û têra wan dikin ko wan hemû serbazan, sax bi destan bigirin.

— Ez dibêjim, Şêroyî xwest heval xwe ji bîr nekin lewma ev axiftine kir, heke em bê deng biçin çêtir e, neku kesekî guh li dengê me bibe yan boseyek di rêya me de hebe. Divêt em hişyar bin û yekudu jî nehêlin.

Diviyabûya wan pêyên xwe sivik bikirana û zû biçûna, lê ji ber dapîrê û bona ko bi rê ve nemîne, wan jî çûna xwe girantir lê kir. Lê Mîrza, ko di nav xurtên gundî de bi rastgotina xwe naskirî bû, nikarî ya di dilê xwe de nebêje û ev axiftine arasteyî dapîrê kir:

— Xalet, nexeyide lê te rastî bivêt ne heq e yên li jiyê te bên rêyên hosa zehmet û bi tirs û digel xurtên wekî me, ma ne we ye?

— Eh...pa tu yê tamsarî, axiftina wî dapîr tingijand. Ma heqî li ko derê maye? Nê heqiyê li bin neheqiyê tir e tir e. Ma ji te ve heqê gundî bêtir li ser kê ji me ye? Û paşî ma çi heqê pîra li ser xurta nîne?

— Heqê gundî Li ser wan e yên xurtir û yên li serxwetir û bi hêz, weha bê hizirkirin Mîrzayî bersiva dapîrê da.

— Nexêr, vê carê dapîr torebû, qet we nîne. Heqê gundî li ser me hemûya ne, lê pêtir li ser wa ne, yên ko jiyana xwe bêtir di gundî de derbaskirine û bêtir ji xêr û bêrên wî xwarine.

Mîrza ma hêbetî, lê axiftina xwe jî ne vebirî û gêngaşeya xwe bi dapîrê re domand:

— Ma çi bêjim, nêşxwe, tu ji me pititr li gundî jiyayî. Bes manê tu bi jiyê xwe jî ji me mezintirî.

Li vir û bi dengekê ji yê berê nerimtir û pirî bawerî bi xwe dapîrê got:

— Ê...pa divêt min ji we bêtir dil bi gundî ve be û zûtir jê xerîb bibim.

Besnayê xwest dawiyê bi vê cirenîxê bîne, lew gote Mîrzayî:

— Kekê Mîrza! Ma xwe ne tu ji nû dapîra min dibînî? Kêşmekêş digel wê ji qesta ye. Kes neşêt wê lêvebike û her dê bi ya xwe bike. Evca ya çêtir ew e tu gelek li dû wê dirêj nekî û diyar e we ji bîr kir, ko Şêroyî ji me xwestîye em gelek dengî ji xwe neînin.

Xwe piştî wê gêngaşeyê dapîrê hebekê pêyên xwe siviktir lê kirin. Ew ji du seetan bêtir man bi rê ve heta ko nêzî gundê xwe Hirorê bûn. Ew gundê ko dikeve ser tuxîban bi Kurdistana Bakûr re. Rê wekî xwe neman bûn, dar û bar bi serêk de hatibûn xwarê û gund mîna dehlekê lêhatibû. Besnayê ji çavên xwe bawer nekir ko eve gundê wa ye, yê ko ew berî du heyvan bi xurtî û bi topizê zorê jê hatine derêxistin û rakirin û malên wan û xwecihên gundî hatine tera bera kirin. Hukumetê her çendek ji wan havêtine derekê, dûrî warê bab û bapîran. Ew û dapîr bi maline din re fire dane nêzîkî Sêmêlê. Bê xanî, li bin xîveteka kevin û dirhayî, ne av, ne dar û bar û li bin tehirka tava şaryayî. Her çend rojan, carekê tankerekê leşkerê Iraqê av ji wan re dianî. Li ber tankerî tenike dibûn rêz. Her jinek, ji tirsa neku av vê re negehe û bona ko xwe bighîjîne tankî, yên li pêşiya xwe radihavêtin û wisa dibû pevçûn û şer. Şer li ser avê li welatê avê. Serbazên ereb jî, yên ko bi tankî re, tamaşayî wê diramatê dikir û pê dikenîn. Çavên wan sîng û berên wan keç û jinan diçerandin û qet ne di xema bê avî û perîşaniya wan de bûn.

Şêroyî gote dapîrê û Besnayê:

— Ez dibêjim heke em bimînin pêkve çêtir e, lew heke hûn hez bikin werin da em pêkve biçin nav bîstanên me û paşî biçin bo nav bîstanên we yan berûvajî, ka hûn çawa hez dikin.

— Ne Şêroyê delal, dapîrê weha lê vegerand. Dê wesa li me hemûyan bibe dereng û kesek ji me vê re nagehe têr li nav war û rez û latên xwe bigerhe. Dê ez û Besê çin serekî li kavilê xanî û bîstanan bidin. Bes ka bêjin me, ka bo zivirînê em û hûn kengî û li kû derê bigehin yek.

— Baş e, weko hûn dixwazin, her çende bi dilê Şêroyî nebû û wî lêvên xwe miçandine serêk. Bes hêj zû û berî bibe spêde, divêt em li vê derê bigehin hev da ko berî dinya rohin bibe, em cehdeyê derbas bikin. Hişyarî xwe bin, neku topan li gundî bidin yan serbaz dakevin gundî. Û her gaveka we hest bi teqeleqekê kir yan we zanî ko biyanî di gundî de ne çiya û çiya werin bo hindav vê rêyê. Em jî dê weha bikin da em hevrûşî çi giriftaran nebin û bi silametî bizivirin.

— Gelek baş e, dapîrê jî ev pêşniyaza xwe avête ber wan, bes ez dibêjim heke em li ser kanîka henê, ya li pişta rêyê û nepenî bigehin yek çêtir e, çunkî cihekê li nik me naskirî ye û li cem biyaniyan nepenî û ne diyar e.

Ew li ser pêşniyara dapîrê pêkhatin. Xurt bo binê gundî, dapîr û Besna jî bo nav gundî çûn. Dapîrê û nevîka wê diviya seh bikin gundî bi xwe ka çi bi serî hatiye. Her çend bû şevê tariya xwe bi ser de dahêlabû, lê wan li


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ber ronahiya tava heyvê dît ko gund ne ew gundê cara bû, lê kavil û xerabe bû.

Bi wî dîmenê xemgîn yê gundî, cerg û hinav li wan kuzirîn. Neşiyan xwe li ber dîmenê gundê sotî û xaniyên herifandî û dar û barên şewitandî bigirin, kizgiryokê hefkên wan girtin û êdî rê li ber girî ne dihate girtin. Heta ew pira li nîva gundî jî nemabû. Lê xuya bû hinek camêran bi xêra xwe du darspîndarên mezin li ser rûbarî, li şûna pirê, bo derbasbûnê li berêk razandibûn.

— Ez dibêjim wexte em biçin bo nav latên xwe hêşta li me ne bûye dereng, Besnayê gote dapîra xwe.

Erdê wan pîçekê ji gundî veder bû. Bi 'tilê çiyayî ve, li hember Zinarê serkeş bû. Hindî diçûn û serdikeftin çi ji bilî kavil û xerabe û sotî û rejûyê ne dihate pêş çavên wan. Hindî xanî bû, ber jî li ser berî nema bû. Bîstan, ji ber ko av jê hatibû qut kirin, hişk bûbûn. Xwe kaniyên avê li gundî, ji bo ko êdî avên wan ne zên û bin erd bibin, ji aliyê leşkerê Iraqê ve, bi çîmentoyê hatibûn dagirtin. Ya ji dagîrkerî ve ew bi wî awayî dikare jiyanê li vî welatî bikuje û jinavbibe.

Ava avdanê ji aliyê din yê çiyayî dihat bo ser çem û latên wan. Ew ji bin gupîtka Zinarî dizêya û şordibbû xwarê û hêj ew negehiştî binê çiyayî, li cihekî bilindtir ji çem û latên wan, wan hinek ji avê bi botikan, ko ji tîvilên spîndaran hatibûn duristkirin, derbasî rexê xwe dikir. Wan stûnên ji darmaziyê ko serên wan mîna du guha bûn di gelî de radiwestandin û binên wan baş di axê de diçikilandin. Wan paşî botik, ko ji solînkan mezintir bûn, wekî cokê li ser komtên wan stûnan, di navbera du guhên wan de, dirazandin. Weha av di wan botikan de derbasî erdê wan dibû. Xwe kanîkên avê li ser erdê wan mişe bûn, lê ji ber ko ava wan kêm bû, ew bi kêrî avdanê nedihatin.

Xwe ew kultura gihandina avê ji cihekê avî bo cihekê bê av li wê deverê gelek kevn bû. Ji bo nimûne mirov dikare qala kela Hirorê bike, ko navê gundê Hirorê jê hatiye. Ew keleheka pir kevnar e û di gelek jêderên dîrokî de qala wê hatiye kirin. Ev kele bê av e û dikeve rojhilata gundê Hirorê, li serê kumtekî li ser wê rêza çiyayî. Li binê çiyayî doleka avî heye dibêjinê Tebala. Aveka boş û tezî ji çiyayê beramberî kelê, pîçek ji kelê bilindtir, dizêt û sernişîv dibe û Tebala pê avî dibe. Çaxê kel ava, mîrgeh û hukumranî tê de, av ji wê derê digehişte kelê. Li wê dera av lê boş û bi hêz jê dihate xwarê, kulozk weke boriyê dabûne berêk û av derbasî hundurê wan dibû. Li destpêkê û heta binê çiyayî kulozkên fereh bikaranîbûn, lê ji binê

çiyayî û ber bi kelê ve kulozk tengtir dibûn û wisa av bi hêz serdikefte silal û kelha Hirorê pê avî dibû.

Dapîr û Besna co û co çûn, bona ko bizanin ka ew çima av qutbûye û ber bi erdê wan ve nahêt.

— Xuya ye botîk, solînk xerab kirine lew av nahêt, dapîrê ev hizir kir.

— Neku li derekê cok wergerhabe yan jî berekê mezin vezelhabe nav û rêya avê guhartibe, bi vî awayî Besnayê gumanên xwe diyar kirin.

Dehil û durî jî ko li herdu rexên coyê bûn, şewitandî bûn. Ew nêzîkî solînkên av derbaskirinê bûn, seh dikinê, li aliyê wan, berî solînkan bi çend bihustekan, co xerabbûye. Xuya bû çend topek bi wê parçeya cokê û rex û rûyên wê ketibûn, weha cok kûr kiribû û biribû xwarê, rihandibû.

Dapîra Zuleyxa baş hizra xwe di coyê de kir, paşî axînkeka kûr rahêla û serê xwe hijand. Ji hindê bê hêvî bû ko ew û Besna bikaribin çareyekê lê bikin û berê avê careka din bidin ve bo ser erdê xwe. Ew solînk li ciyê xwe bûn û diyar bû ko hinek gundiyan ew solînkên nû danîbûn wê derê. Lê ma bo çi bû, av ji solînkan derbas dibû bona ko li aliyê din, careka din şor bibe ve xwarê bo nav rûbarê gundî. »Dibe ewên ev solînk deynayîn ne gehiştin cokê çêbikin û dibe paşî bêne ve û cokê çêbikin.« dapîr bi xwe re dipeyivî û ev bi dengekê nizim digote xwe. Lê Besnayê ageh ji dapîra xwe û wan gotinên wê hebû.

— Keça min Besê! dapîrê gote nevîkê, hema her weçku diviyabûya em jî weke giş gundiyan bihatana û me jî serek li gundê xwe bidaya. Eve me wekir û me gundê xwe yê wêrankirî bi çavên serên xwe dît. Xudê heqê me ji van bê bext û sitemkaran çê bike. Ya çêtir ew e em nuke biçin bo ser gorê Xudê jê razî bab û dayika te û paşî û hê nebûye dereng em xwe bigehînin cem xurtan.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 3 –

Berî sal û nîva babê Besnayê pêşmerge bû. Ew piştî adara 1974-ê li berokên şerî bû, wî li dijî êrişa leşkerê Iraqê bo ser Kurdistanê şer dikir. Wî weko her Kurdekê dilsoz û nîştîmanperwer berevanî ji axa welatê xwe, ji miletê xwe dikir.

Tê bîra Besnayê, çaxê babê wê xwestî biçe pêşmergetiyê, tivenga wî nebû. Evca rabû, taqe çêla heyî û hespê xwe û du pez firotin û ji xwe re bi pereyên wan tivengek kirî. Heta şemilka xwe ya nivêjan jî, ko gelek ciwan bû û yek bû ji berdilkên wî, da digel buhayê tivengê, çunkî dilê xudanê tivengê ketibûyê.

Dema wî tiveng bi milê xwe ve kirî û bû pêşmerge, ew wisa bi kêf û dilxweş bû, heçku diçû dîlanekê. Axiftinên wî yên berî çûna wî bo berokên şerî li bîra Besnayê bûn, dema gotiyê:

— Keça min! me Kurdan gelek rezaletî û bindestî dîtiye. Nuke jî hemû milet bi yek dil û yak can rabûye ser xwe. Gişan dest dane hev û sed der sed serkeftin ya miletî ye. Wextê hindê hatiye ko vêca em jî azad û serfiraz û di aştiyê de weke miletên din yên cîhanê li ser axa welatê xwe bijîn.

Baş li bîra Besnayê bû ka dayika wê çend pitpit û qerqeşe li sera çêlê bi serê wî de kir:

— Te çêl firot û te em bê şîr û mast hêlan. Ya karwanan jî, pa bê hesp û dewar nayên kirin. Hey mala te ava, pa dê em çi xwin? Tu dê bi çi û çawa biçî karwanan? Xwe bo me ji kulînê nahête xwarê!

Li dawiya dawiyê dayika wê ji rika xwe hate xwarê û gote babê wê:

— Bila çêl û hesp jî li ser hemûyan bin, hema bes vê carê ev şoreşe serbikeve û me ji vê tepeserî û perîşaniyê azad bike. ko vêca em jî bi rehetî serê xwe deynin ser balgihê xwe.

Pênc meh bi ser ve çûn û babê wê nehat ve mal. Saloxdan û deng û basên wî bi rêya rêbwar û rêving û pêşmergeyan digehiştine wan »Yê baş e. Mêrxasên wekî wî di şeran de kêm in. Her tim li sîngê şerî ye...ûhd.«

Di wan çaxan de nexweşiyeka dijwar bi ser dayika Besnayê de zal bû. Êşê ew lawaz kir û xiste nav nivînan. Gav bo gav êşa wê dijwartir dibû û

rewşa wê pê têk diçû. Duktorê şoreşê, ko yê wê deverê bû, hat seredana wê û derman kir. Lê got jî, ko ew nikare çi çareyan lê bike û ya çêtir ew e, ew wê bi zûtirîn kat bibin cem duktorekê şehreza ko êşa wê fêm bike û bikaribe wê êşê û dermanê wê destnîşan bike.

Besnayê çi bira nebûn. Babê wê hez dikir kurine wî hebin, lê piştî Besnayê, sê zarokên dayika wê çêbûn û her sê jî kiç bûn û ne diman, çend heyvekan û dimirin û paşî êdî dayika wê zarok nebûn. Dapîra wê digot »hêşta zarok ne kamil bûyî di zikî de dimirîn.« Ma çawa wesa nebe, nê ew karê dayika wê dikir hema bi kuttek mêran dikir.

Xalê Besnayê, her çende bi dilî jî nebû, lê neçarbû ko biçe şûna babê wê bona ko ew bikaribe li tewara jinê bihêt. Pê dayika wê ji pehniyê ve dirizî û bêhna wê jî kurt dibû û carna jî bi yekcarî çik dibû û dihate halê mirinê. Karê Besnayê jî sexbêrîjêkirina dayikê û malê bû. Lê dapîra wê jî, dayika babê wê, gelek arîkariya wê dikir. Xwe, bi hîç rengekî, nekamiya gundiyan nedihat kirin û bi her terzekî ji dest wan dihat, wan teqsîrî nedikir û destê arîkariyê dirêjî wan dikir. Xwe yarmetiya gundiyan piştî çûna babê wê bo pêşmergetiyê û eniya şerî bêtir lêhat. Lê dayika Besnayê di rewşeka pir xerab de bû û ji bilî duktorekê şehreza, kesekê dî nikaribû çareyekê jê re peyda bike.

Dema babê Besê jina xwe di wê pergala gelek nexweş de dîtî, wî yekser biryar stand ko wê bibe baregehê mezinê pêşmergeyan, çunkî nexweşxaneyeka mezin û duktorine baş li wir in. Heke hat û wan jî çi çare lê nekir dê hewil bide wê bibe ba duktoran li Îranê.

Wan, hekîm û mela nehêlan, ko ew nebiribe cem û ger gera duktora bû. Li bîra Besnayê bû carekê hekîmek anîn, hekîmî hinek giya zavak û giyayine din bi hev re kelandin û dane dayika wê. Paşî darê potî anî û agir berdayê û li çend cihekan li ser pêyên dayika wê deynan. Dayika wê her weko xwe û xerabtir jî lê hat û tiştê wî hekîmî lêzêdekirî şûnsotin bûn ko li ser pêyên wê weke nîşanan man.

Bi şev, babê wê çû gundî, mehînek ji nik niyasekî anî. Alîk danî ber bona ko têr bixwe. Babê wê berê spêdeyê zû ji xew rabû û mehîn bire ser avê û anî ve mal û alif dana ber. Wî kire inyet ko jina xwe bi mehînê heta pira Balindeyî bibe û wêvetir bi otomobîlê bigehîne cem duktoran. Wê şevê hemûyê xew bi çavên Besê neket. Ew jî siharê zû ji nav nivînan derkeft û rûnişte ber serê dayika xwe. Babê wê kurtan avête ser pişta mehînê û bi ser û ber kir. Di wan delîveyan de Seîdê Gulê jî bi hespê xwe yê karkirî ve hat. Biryar bû, ew jî bi bab û dayika wê re heta Balindeyî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

biçe. Seîdê Gulê dostê babê wê yê herî nêzîk bû û bi deste bira dihatine niyasîn. Piştî ko Seîdî hespê xwe bi dara li ber derê mala wan ve girêdayî, babê wê alif danî ber hespê wî jî û paşî li keça xwe Besnayê ya ko wê gavê di derê mezelkê de rawestayî zivirî û gotê:

— Besê! Eve em dê çin nivêja spêdeyê li mizgeftê bikin, tu jî arîkariya dapîrê bike û dayika xwe bi ser û ber bike. Çend nanekan jî digel hindek jajî û penîrî, ko têra me hersiyan bike, bêxe di nav serhevîrkekê de.

Rast e Besnayê gelek hez ji dayika xwe dikir, lê piştî dayik nexwş ketî, êdî wextê Besnayê nebû tê de çav bi Hogirî bikeve. Hogir salekê ji Besnayê mezintir bû. Xurtekê bejin dirêj, xudan dêmekê sor û sipî, yê ciwan û jêhatî û gelek xwîn şirîn bû.

Cara yekem ko wan tê de, ji nêzîk ve, baş yekudu naskirî û evîna wan pêpkekî bilindtir bûyî, di rojeka havînê de bû. Hîngê Besna pazde salî bû û ew wê rojê li ber bêrê bû. Hogir jî, li batî dayika xwe hatibû ber bêrê. Ew demekê dirêj bû herduwan çavên xwe birbûne hev û dildarî digel hevudu bi çavan dikir.

Wê rojê di rêya vegerê de bo gundî, wî û Besê yariya veşarkanê kir. Ewê, xwe li pişt kevirekê mezin veşart û Hogir li wê geriya. Demeka xweş pêve çû, ew li pişt kevirî û Hogir xuya nebû. Besnayê xwest bizanibe ka çi bi serê Hogirî hatiye û ka hê li pey wê digere yan ji peydakirina wê bêhêvî bûye, evca ji cihê ko xwe tê de veşartî rabû. Di wî çaxê ko ew tê de li pişt xwe zivirî bona ko tiştekî ji Hogirî bizanibe, hema hind dît navçavên wê û Hogirî pêrgî hevudu bûn. Hilma bêhna wî ya nêr ew ji binê pêya heta kulovanka serî rahejand. Hogirî xwe li benda wê û gotinan negirt û destên xwe dane milên wê. Dema laşê wî bi laşê wê ve nûsiya, wê hest bi xweşiyeka wisa kir, ko wê neya xwe di gewriya xwe de xendiqand û rê da maça wî ya nerm û xweş û hîn xwe berbide ser lêvên wê yên têhnî û dilê wê yê qeşavî. Tam bi dev û dil û can û laşê wan keft, lewma wan çi derfet ji dest xwe nedan.

Di her delîveyekê ko bi dest wan ketibûya, tê de digehiştin yekudu û wan li dereka nepenî, bi dizîkî ve digel hevudu evîndarî dikirin. Lê Hogirî çi cara kuttekî lê nedikir. Rast e bêcgeyî maç û ramûsanan dest dikirine hemû parçeyên laşên hevûdu, lê wan gupîtka xweşiya evîndariyê ji şeva zavatî û bûkaniyê re hişt. Herduyan jivan da hevudu ko ew di paşerojê de bibin jin û mêrên yekudu û bo heta hetayê bi hev re bin.

Ji ber wê çendê, ko wext bo xwe û Hogirê xwe hebe, wê gelek hez dikir dayika wê zû ji êşa xwe rizgar bibe yan babê wê bihêt û wê bibe cem duk-

torekî û çareyek yan dermanek ji êşa wê re bihête dîtin û Besna jî wekî caran bikeve nav himbêzên Hogirê xwe yê delal û xweştivî.

Lê êdî dereng bû bo wê daxwaza wê ko bête bicîanîn, çunkî berî vegera babê wê ji berokê şerî, bi nêzîkî bîst rojekan, Hogirî jî gund hişt û çû. Wî guh neda dayika xwe ya bîjin û bexte bexta wê û kela pêşmergetiyê lê da, evca gund û dayik û Besna hiştin û ew jî bû pêşmerge. Dema babê wê hatiye ve mal û wî ji gundiyan re qala şerî û mêrxasiya pêşmergeyan kir û her wesa jî çû ser behsê gundiyên xwe yên bi wî re li berokê şerî pêşmergetiyê dikin. Besnayê pir ji dil dixwest pirsiyara Hogirî jê bike lê bisteh nekir, baş bû dayika wî bi xwe hat û hêş ne rûniştî gote babê Besê:

— Tu bi Xudê kî ka bo min bêje ka Hogirê min çawa ye? Ka yê sax e yan Xudê nekit tiştek bi serî hatiye û kes nabêje min?

— Hogir yê sax e û xurtekê pir jêhatî ye, babê Besê bersiva wê da. Dema Hogir hatî, ew li ser daxwaza xwe yekser bû pêşmerge û hate eniya şerî, cem me. Lê keko, min û çend camêrekan ew neçar kir ko vebigere bo rêzên paşiyê û nuke beşdarî kursekê dermanpêçiyê dibe.

Besnayê karê dayika xwe kiribû û av li nanê tenik reşandibû. Di wê dema ko wê tê de dixwest nanî bi penîrî û jajî re bixe nav mêdekekê de, girrêna balefiran hat û bû gurme û gurm. Firokeyên mirinrêj kerb û kîna xwe ya faşîst di qumbeleyan de, bi ser gundî de barand. Wê carê mizgeft jî hingaft. Babê wê û melayê mizgeftê û Seîdê Gulê bi berkeftin. Hindî babê wê û mela bûn demildest hatin kuştin. Seîdê Gulê jî birîndar bû û pêyê wî yê rastê ji çokî ve hate firandin. Du jinên xwedî zarok û minalekê çwar salî jî di nîva gundî de hatin kuştin û çend kesek jî birîndarbûn.

Dayika wê neşiya xwe li ber wê hemû derdeserî û êş û fîxan û perîşaniyê bigire. şehîdbûna qurtalkerê wê, babê Besê, bi yekcarî deriyê hêviyan li ber wê girt. Girî û rondik û êşê bêhin lê maliq kir û di bin wî barê giran de dil girtî bû û her di wê rojê de ji jiyanê mişext bû û da dû mêrî. Besna ma bi tenê, bê bab û dayik û Hogir, di destên dapîra di navsalçûyî de.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 4 –

Xişxişek Hate guhên Besnayê. Seh kire rex û dorên xwe, lê çi nedît. Dengê dapîrê hatê digotê:

— Besê te xêr e tu hind li pişt xwe dizivirî?

— Ez dibêjim pêjnek hate guhên min, Besnayê weha dilnerehetiya xwe ji dapîrê re xuya kir.

— Keça min, çi nîne, xwe netirsîne, dapîra guhgiran ho gote Besnayê û destê wê girt û baş şidand û li dû xwe kişand. Dibe dehbeyek be yan jî gundî bin...

Hê dapîrê axiftina xwe timam nekirî, ji hemû rexên wan ve bû qêr qêr û gazî û lê heyitîn:

— Qîf..qîf,la teteherek. Bi erbiyeka hişk û pir dijwar »qîf la teteherek« -rawestin ji cih nelivin- weko agirî daweşyane ser wan. Herdu ji tirsan de, di cihê xwe de bê liv man. Tirsa wan bêtir lê hat dema xudanên dengan xuyabûn. Komandoyên leşkerê iraqî bûn, yên bi Quwat Xasse – Hêzên Taybetî – navkirî. Wan ew herdu dormandor kirin. Dapîrê Besnaka xwe hembêz kir û bi singê xwe ve şidand.

Ji aliyê wan yê destê rastê ve valahiyek ma bû serbaz lê ne bûn. Çavê Besnayê bi wê valahiyê ket, destê dapîrê baş girt û berê xwe da wê derê. Xwestin xwe ji bazinê serbazan qurtal bikin û birevin. Serbaz hebekê dûrî wan bûn, herdu bezîn, lê pêyê dapîrê li berekî hilingift. Dapîr keft û destê wê ji destê Besnayê verest. Besna jî li dapîra xwe zivirî bo ko wê rabike ve ser pêyan, lê êdî dereng bû. Destên gemar û genî gehiştine wan.

Serbaz li dor herduwan civiyan Dapîrê xwe bi Besnayê werkiribû, her weçku dixwest wê bi laşê xwe biparêze. Lê wan çavsor û hovan herdu ji hev dûr xistin. Sebazan gazî hevudu dikir: »ilzemû niswan el'usat, itmete'u bîhum, şewifû elkurdiyat mal el erebî« – jinên pêşmergeyan bigrin, dilê xwe pê hîn bikin, yê ereban nîşa wan jinên kurd bidin.

Wan cilên wan di ber de dirandin û bexte bext û hewar û gaziyên wan di nav tîqe tîq û çivêlî û hariya laşên serbazên iraqî de winda bûn.

Xurtan, li jêriya gundî, li ber rûbarî gwîz diweşandin. Lê wê qerebalixê

û qîjiya jinan weha li wan kir ko gwîza bihêlin û li dû dengan ber bi cihê qerebalixê biçin. Bêhnekê çûn û ji nişkan ve Mîrzayî destê xwe li herdu hevalên xwe xist û tibla xwe dirêjî gêleşokekê kir. Hersê bi xwevedizîn çûn hindav cihê rûdan û heşametê. Dibînin ji sed çekdarên leşkerê iraqî bêtir li wê derê ne û li tiştekî daçemyane û hin li ser in.

Hewar hewara Besnayê ya kiz pirs hemû ji xurtan re xuya kir. Ew mîna teyrên kelexan, bi harbûn, li ser kelexên Besnayê û dapîrê bûn.

— Wey babo! Eve çi dikin?! Eve çi durunde û hov in! xurtê ji hemûyan biçûktir Mîrzayî ev got û rast rabû ser xwe bo ko biçe telba wan. Lê Şêroyî ew zû girt û kêşa ve bo ser erdî û destê xwe deyna ser devê wî bona ko çi dengan ji xwe neîne û gotê:

— Ma tu dînbûyî, harbûyî. Ew ji sedan jî bêtir in û çek jî bi wan re ye û em sê ne û bê çek in.

Lê hemcara Mîrza nikaribû xwe li ber wî dîmenê kirêt û pirî xem bigire û çi neke. Têndayê, pîçek veder ji gêleşoka serbazan, yekî ji wan tivenga xwe paldabû darekê û piştî kemera şelwarê xwe vekirî, ew sebaz ber bi herdu komên serbazan ve çû bona ko ew jî dehbeyê xwe rehet bike. Mîrzayî çavên xwe deynan ser tivenga wî serbazî û bê agahdarkirina herdu hevalên xwe, wî xwe ji wan vedizî û ber bi wê tivengê çû. Heta Şêro û Şahîn lê zivirîn, hîngê Mîrzayî dest dabû kilaşînkofê û bi hemû dengê xwe yê pirî xeyidîn li serbazan kire qêrî:

— Hey bê şerefno! bê namusno.

Wî digel hindê tiveng bire ser şêlikan û berê agirê wê da wan. Wî ji dehan bêtir jê, kuştî û birîndar, xistine erdî. Serbaz gelek bûn, hejmara wan ji gulleyên tivenga wî bêtir bûn. Serbazên mayîn sax bi agirê tivengên xwe li wî zivirîn û wan laşê wî bi şêlikên xwe kire serad. Wan bi wê jî bes nekir, ew hatin û wan bi sîkaran li kelexê wî xist û kelex hincinand.

Şêroyî û Şahînî kerb û kîn û xeyidîn û girî di gewrî û hinavên xwe de bend kirin. Piştî kuştina Mîrzayî serbazan berê agirên tivengên xwe dan rex û dorên xwe û gulle bi ser her aliyekî ve çûn û barîn.

Ne di ciyê xwe de bû ew li cihê xwe bimînin û bersîngê serbazan bigirin, çunkî wan dizanî ko ew bi wî awayî xwe didin kuştin. Lewre herdu bêgav man û wan xwe bo paşde kişand û serkeftine çiyayî û wan xwe di nav kevir û kumtên asê de veşart. Wan kire inyet ko li wê derê bin ta ko serbaz gundî berdidin û paşî ew werin cihê bûyerê û bizanibin ka çi bi serê Besnayê û dapîra Zuleyxa hatiye û laşê Mîrzayî jî li ciyekî biveşêrin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 5 –

Piştî ko bû spêde û tav hinekê bilindbû, Şêro û Şahîn ber bi cihê rûdanê çûn. Çaxê ew nêzîk bûn, wan ji wê derê, dengine, ko bi kurdî dipeyivîn, bihîstin. Wan ji dûrve mêze kirî, dît ko gundiyên wan in. Ew ber bi wan ve çûn û wan bi serpilkî silav kire wan û xwe li bersiva silavê negirt û yekser çûn ser kelexan.

Hindî Mîrza bû hatibû pirt pirt kirin. Dapîr bê can û mirî bû û Besnaya cilik lê hatibûn çirçirandin. Wî xwe bi laşê xwe yê xwînelok û pirça xwe ya qijavij ve bi cendekê dapîrê werkiribû û li ser digiriya.

— Eve hûn bûn digel wan? yekî ji zilaman axiftina xwe arasteyî Şêroyî û Şahînî kir û destê xwe dirêjî Besnayê û kelexên dapîrê û Mîrzayî kir.

— Belê em bûn, Şêroyî ev bersiv digel axînkrahêlaneka kûr da.

— Ma hatina van dera seyran e! her wî zilamî ev gotine jî li navçavên Şêroyî û Şahînî da. Hey mala we ava, hûn çawa jina bi xwe re tînin cihên hosa!

— Pismam nuke ne çaxê gilî û gazinda ne, piyawekê din axiftin li wî zilamî birî. Werin em lezê bikin darbesta bo cendeka durust bikin, hêj hukumetê dest bi topbarankirina gundî nekirî.

Wan zû dar bi dasa birîn û du darbest çêkirin, wan kelexên dapîrê û Mîrzayî razandine ser darbesta û hilgirtin. Besnayê xwest bi pêyan biçe lê ne dikarî xwe baş li ser pêyan bigire. Ew ser evrazî çiyayî bûn û çi nemabû ew berêveyî gundî bibin û topbarankirinê dest pê kir.

Wan pêlezkî kir bo ko nebine armancên bertopan. Besna hew dikaribû birêve biçe, Şahîn lê zivirî û xwest ber bi wê biçe bona ko destê wê bigire û arîkariya wê bike bo ko wê ji agirê topan rizgar bike, lê berî ko bigehe cem wê berkekê topê hat û li ber pêyên wî keft. Pirçikên berkê topê di laşê wî de çûn û Şahîn di cih de keft erdî.

Şêro û zilamekê din lê zivirîn, hêşta can tê de bû, her yekî ji wan dest da milekê wî û wan ew bi bez bi xwe re bir. Besnayê jî hêz da xwe û bi dû wan keft. Ew berêveyî aliyê din yê çiyayî bûn û gehiştin cihekê ko çend dewarek lêbûn, ew bi daran ve girêdayîbûn û diçeriyan. Ew dewar yên wê

desteka zilaman bû, yên bi Şêroyî û Besnayê û Şahînî re.

Ew li wê derê ji topbarankirinê hêmin bûn, ew rawestiyan û wan kelexê Şahînî razand ser erdî û giş lê civiyan. Şêroyî hewil da pê re bipeyive lê xuya bû gelek xwîn ji ber birînên wî çûbû û seçman ji serê wî jî girtibû, ew ma bû laşekê bê can û ne liv.

— Evca em çi li van kelexan bikin? piyawekî ev pirs piştî çend deqîqeyekên bêdengiyê kir.

Gêngaşeya wan li ser kelexan û ka çi lê bikin dest pê kir:

— Heke hûn dê bi ya min kin hema em dê wan li vê derê veşêrin, Şêroyî berî hemûyan ev pêşniyara xwe avête ber wan. Ya giring ew e ko ew di axa welatê xwe de bihêne veşartin.

— Nexêr, birayê Şêro, wisa nîne, dengekî bi vî awayî nerazîbûna xwe li ser pêşniyara Şêroyî diyar kir. Pa belkî kes û kar û xizmên wan bixwazin kelexên wan li goristanekê biveşêrin.

— Em nikarin di van kawdanan de, xwe, du sê rojan li benda kes û karên wan bigirin, zilamekê rihispî bi dengekê biryarder axift. Ma kî dizane ka dê ew kengî pê bizanin û ka eger pê bizanin dê wêrin bihên yan na? Em baş dizanin ko gehiştina wan bo vê derê ne karekî weha hêsan e. Evca hema ev e em kes û karên wan û hilon rabin da em li cihekî li vê derê gora ji wan re çêbikin û wan tê de biveşêrin.

Baş bû ko wê revda zilaman tevir û mer jî pê re bûn. Ew ji karwanî vedigeryan û da çin bo nav Qeşûriyan. Piştî setimîna 1975-ê ew jî li wê derê êwirîbûn, li hêviya ko azadiyek û aştiyek bikeve nav welatê wan û ew jî wê çaxê bikaribin bi serfirazî vegerin Hirora xwe û welatê xwe.

Wê rojê, piştî ew ji karwanî vegeriyan û berî ko derbasî bakûrê Kurdistanê bibin, wan xwest serekî li kevnegundê xwe bidin û bizanibin ka di çi rewş û pergal de ye û ew bi ser wê karesatê hilbûn.

Wan di nav dar û baran de sê gor kolan û kelex weko şehîdan, bi cil û berg ve tê de veşartin. Bi gotina hemûyan hersê canemerg in. Yê biyanî hatiye ser axa wan û zordarî li wan kiriye û ew kuştine û weha ew dibin şehîd, lewma, bi dîtina wan hemûyan, wan pêwîstî bi şûştinê nebû û durust bû wan bi cilên wan ve veşêrin. Wan mîna kêlan, berek li ber pê û berek li ber serê her gorekî deynan bona ko li ber çav bin. Paşî Şêroyî Çeqoka xwe ya devxweş û sertûj anî derê û navên wan û roja şehîdbûna wan li ser kêliyên berserên goran hilkolandin.

Ew piştî hîngê rûniştin, bona ko hinekê bêhna xwe bidin. Besna jî, her ji destpêka gihaştina wan bo wê derê û heta wê gavê jî weko miroveke pir


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

sewdaser, bê hiş û bîr raketibû ser axê. Wî mîna kesekê gelek tirsiyayî destên xwe lêk şidandibûn û xwe mîna gulmiçkekê lê kiribû û wê carna bi dengekê nizim digot na..na. Dîmenê wê, reng û sîmayê wê, ew hemû jan û êşandina wê dîtî diêxist ber çavan. Şêroyî car bo car tamaşayî wê dikir û ew bêqam li ber xwe diket û wî hest bi hindê dikir ko ew ji wê buyerê berpirsiyar e. Yekî av û nan deynabûn ber Besnayê, lê wê devê xwe nekirê.

— Erê ma Zuleyxa û nevîka xwe li kî ve binecih bûbûn? zilamê rihispî pirsyar ji Şêroyî kir.

— Li devera Sêmêlê, Şêroyî got. Lê wan li ber bû vê dûmahiyê biçin Duhokê binecih bibin. Mala xalê Besnayê li wê derê ye û jiyan bo du jinên bê kes û bê xwedî û bê jêderekê jiyanê li wê deştê pir zehmet û dijwar e. Xalê wê jî, ji ber lomekirina xelkî, qayil bû ko wan bibe cem xwe.

— Ez dibêjim ya çêtir ew e her îşev hinek ji me wê derbasî aliyê dî yê cehdeyê bikin, rehispiyî pêşniyaz kir. Tu , gotina xwe arasteyî Şêroyî kir, ji ber ko her dê çiye ve, heskê bila kesekî din jî bi te re bêt û wê bibin gundê Girka û ji wê derê tu wê bibe Duhokê yan jî bêje xalê wê bona ko bête hewara wê.

— Erê xal, ma tu çi hizir dikî? Şêroyî bi hêbetbûn ev pirsyara xwe da pey pêşniyara pîrê rehdar, hema dê ho bi sanehî vegerim ve mal, bo nav Duhokê û hukûmet hevrûşî min nabe?

Şêro weko piraniya xelkê Kurdistanê û bi taybetî xurtan ji jiyana di deverên bin destên hukûmeta Iraqê de têrbûbû û her xweziya wî fireka bayê azadiyê bû. Ew sê caran, berî wê carê, hatibû gundî û vegeriyabû ve û hukumetê pê nizanîbû û weha, hîngê, ew bê problem li ser wî derbasbûbû. Lê wê karesatê, ew wê gavê danîbû ber biryardanê di pirseka pir giring de, ji ber ko bi dîtina wî sefera wê carê weke carên pêşîn bi bêdengî derbas nedibû û ew ya qewimî nedihat veşartin û kes neşêt devê xelkî hemûyê bigire.

Gelek caran, wextê Şêro pir tengav dibû, xweziya wî dibû ew ko li her derekê be bila bibe, bes ne li wî cihê be'isî û be'isîdost lê hebin. Wî di nav xwe de hest bi hindê dikir ko êdî ew hew dikare milkeçiyê bo be'isiyan bike û bi dîtina wî bê dengî û nexuyakirina nerazîbûnê li hember dagîrkerî û siyaseta wî ya tepeserkirina kurdan û bêhurmetkirina mafên mirovan, bi xwe rengekê milkeçiyê ye.

— Bê hêve û wê ve, hema ez gihaştime zalgeha Bêgova yan bo nav bajarê Duhokê, wê gavê ez yê girtîm e, heçku nedixwest bi xwe re û bi wan

re gêngaşeyê li ser wê pirsê bike û biryara xwe dabû lewma Şêroyî bi wî rengî bersiva pîremêrî da. Ma hûn dizanin piştî şikestina şoreşa Îlonê çi li xelkî hatiye? Çi ji tirsê û çi ji bo parastina berjewendiyên xwe yên taybetî û çi pêxemetî pereyî xelkek heye xwe ji hukumetê re dike erd. Ev tişte hemû ji bêhêvîbûnê û nedîtina çi paşerojeka xweş ya nêzîk peydabûne. Belê, kesine hene xwe difiroşin û di rêya wan de difnên hukumetê û dezgehên wê yên tepeserker li hemû deran belave ne. Evca, hema eve ez jî, yek im weko we, digel we.

— Jiyana te ye û tu biryarê li ser didî, kalê rehispî got. Nuke divêt du kes bi keçikê re biçin û wê bigehînin Girka. Wê bibin mala kesekî cihê baweriyê be, ko wê bibe Duhokê mala xalê wê û ez dibêjim hecî Îbûyê Mala Xidiran bi kêr hindê dihêt û dê xemê jê xwit.

Her ew kalê rehispî rabû û çû cem Besnayê û hêdî û bi zimanekê rehet û nerim gotê:

— Keça min hosa nabe. Hilo rabe ser xwe, ya qewimî qewimiye û Xudê heqê te û me hemûyan ji wan bê bexta çêbike. Hilo here, li bin dar biya henê kaniyeka avê heye, dest û çavên xwe bişû û xwe pîçekê bi ser û ber bike. Nabe tu bi vî ser û berî biçî nav xelkî. Dê hilo û li ser xatira pîratiya min tepeka avê li çavên xwe bike.

Bê hizirkirin û weko laşekê ji mirinê rabûyî, wê xwe ber bi kanîkê bir. Li wir axiftina zilaman dihate guhên wê:

— Baş e kî dikare û dixwaze bi keçikê re here Girka? pîremêrî ev pirsyar kir.

Berî ko Şêro xwe bo hindê destnîşan bike, du zilamên din xwe pêşkêş kir û yekî ji wan got:

— Hema eve ez û pismamê min Mehemed dê digel wê çin. Me pêwîstî bi kirîna hindek hûr û mûran jî heye, hema ev çûna Girka ji bo me xweşderfet e ko em li wê derê tiştan jî ji xwe re bikirin.

Şêroyî jî xwe anî pêş ko pê re biçe, lê pîremêrê rîşdar bi hindê re bû ko du kes bes in û weha bûne du kes, bê Şêroyî, ko pê re biçin.

— Gelek baş e, lê ya çêtir ew e gundî bi ya qewimî nezanin, pîrê rîşdar got. Çunkî, paşî dê hukumet jî pê bizane û dê ew, li ser vê hemûya bi serê wê hatî, wê bigirin û Xudê dizane dê çi bi serê wê înin. Evca, hûn ji kerema xwe, wê rast bibin mala Îbûyê mala Xidiran, ew mirovekê mêrxas û welatparêz e û devê wî jî bi sîvande ye, çi ji ber dernakeve. Bila ew li wê derê cilkên wê biguhorin û bê dengjêanîn wê bibin Duhokê.

— Ez nizanim ka nuke xalê Besnayê çawa ye, lê hindî li bîra min e, ew


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

miroveke pir serhişk û riko bûye, piştî çend deqîqeyên bêdengiyê her eynî pîremêrî perdeya bêdengiyê dirand û ev axiftina xwe pêşberî Şêroyî kir. Erê Şêro, ew hêşta wekî xwe ye, yan hatiye guhertin? Çunkî heke hîn bi wê serreqiya xwe ma be, bi zehmet ew qebûl bike Besê biçe nav mala wî û nemaze piştî evê, ya ko hatiye serê wê.

— Ma çi bibêjim, Şêroyî weha dest bi bersivdanê li ser pirsyara pîremêrî kir. Xalê wê, ka te çawa naskiriye, hêşta weko xwe ye û pîçekê xerabtir jî. Û ez bawer nakim ew di rewş û karesata wê bigehe. Lê hêvî di kurê wî yê mezin de ye ko ew bikaribe babê xwe qayil bike. Ew mamostayê xwendingehê ye û xurtekê baş e.

— De vêca were ji xema ne peqe, dijminê dagîrker destdirêjî û bêbextî li keçikê kiriye û xalê wê xwe li ser wê tirş û tal bike, yekî ji herdu zilamên ko dê bi Besnayê re biçin Girka ev got. Li şûna ko wê bihewîne û tola wê bistîne, dê xem û janan lê zêde bike.

— Mixabin, lê belê hêj em di wî kirasê qemixî û peritî de ne, Şêroyî jî dîtina xwe weha diyar kir. Çend miletê me yê tepeser û perîşan e, deh cara hindîtir û bêtir jî jin ya tepeser û perîşan e. Hê em gelek li paş in, dijminî em dagîr û bindest kirine û em jî azadiyê di nav xwe de, bi xwe, li hevudu qedexe dikin. Hinek zordariyê li me dikin û em jî zordariyê li xwe bi xwe dikin. Em mêranî û qehremaniya xwe bi serê yekudu bikartînin.

Besnayê ageh ji wê suhbeta wan hebû. Li rex kanîkê rûniştibû û destên xwe di avê de hiştibûn, xuya bû ji bîra wê çûbû ka bo çi destên wê di avê de ne. Ew ket deryaya hizr û malxulyanan û ew ji xwe re, di serê xwe de, li deriyekî hêviyê gerha. Lê giş rê li ber wê yaxîdibûn, dewr û ber li ber tarî dibû. Wê xwe didît bi tenê, pêxas û rûs, li biyabaneka mezin, ya bê dawî, ya pirî stirî û çîxin û dûpişk, li ber tehra havîneka pirî şewat.

Ne dikarî xwe bi hindê qayil bike ko bila ji wan hov û dehbeyan aviz bibe û zakê wan di zikê wê de be. Weha hest dikir ko eger zarok bibe, ew dê berhemê wê zordarî û destdirêjkariyê be û pirsa ko berhemekê wisa ji zikê wê derbikeve jiyanê ew pir têkda. Wê digote xwe:

»Nexêr..nexêr, naxwazim ew ji min bibe û bo heta hetayê nîşaneka sax li ser wê fihêtiyê, li ber çavên min û çavên xelkî be. Ew dê her gav û her roj wê tadariya li min hatiye kirin, li ber çavên min sax bike ve û dê bi wî rengî her di wê êş û janê û tirsê de jîm«.

Nexêr, ew nikarî wê bixe serê xwe û neşiya xwe bi hindê qayil bike. Cîhan li ber çavên wê şêlha û hindî wê bir û anî, wê çi rêk nebirinê û çi tîrêjkên omêdê bi dest wê nekeftin. Ew bi xwe re axift:

»Rast e dibe ko yekî baş û têgehiştî hebe, ko di min bigehe û ya hatiye serê min fêhim bike û bibêje ew ne guneha Besê ye û dibe bixwaze destê arîkariyê jî dirêjî min bike. Dibe piştevaniya min bike bona ko ez ji ketinê rabibim ve û xwe rabigirim û careka din bi jiyanê re birêvebiçim. Lê, kesên wisa dê çend bin? Bila yek û du û bila sê bin û yên mayîn, behra bêtir, dê ew bin yên ko dê tiblên xwe dirêj kine zikê min û paşî zarokê jê dibe. Dê dest bi pispis û got gotka kin û ya xerabtir û bi kovantir li pey wan pis pis û got gotkan dihêt. Eve, heke xalê min ez di cih de ne kuştim. Belê, manê hêj ew namûsşûştinê weke berê têdigehe. Kî dê wî têbigehîne ko kuştina min ne namûsşûştin e, ko namûs û şerefparastin ew e mirov beşdar bibe di ramaliştin û paqijkirina welatê xwe de ji çepelên destdirêjker û dagîrker.

Dê ji kî ve kurxal bikare wî belî bike û dîtina wî biguhore! Manê ez dizanim rastiya mala xalê min çawa ye; kurxalî çi desthilat li ser babê xwe nîne û berûvajî wê, ew çi bê babê xwe nake. Tiştekê ecêb û xerîb e, wextê tengaviyê xal ne xal bû û her bi ser me ve nehat û ne got pa keça xwîşka min bê kes û xwedî maye û hema ne hate seredana me jî piştî em li Sêmêlê binecih bûbûn. Niha jî dê ez bim namûsa malê û divêt namûsa xwe biparêze û her ji bo hindê divêt min ji rêya mala xwe rabimale da ko kes qala mala wî bi xerabî neke.

Rast e Kurxalê min li cem xuyanî û biyaniyan bi peyvên ciwan û pêşketî û teyisî dipeyive û bang dike. Behsê nûkirin û nûxwaziyê dike, lê li ber babê xwe her kurê »Weye bab, tu çawa dixawazî bab...ûhd«yê ye. Bawer nakim kesek bikaribe xalê min têbigehîne ko destê dijminî ez birîndar kirime û xistime û divêt ew min rabigire û biparêze.«

Dibe ko eger Hogir mabaya, dê wê xwe hinek bi wî û piştgiriya wî dilxweş bikiraya. Lê kê dizanî ka ew li kûderê ye. Besnayê hind dizanî ko ew demekî li Îranê bû û paşî çû Ewrupayê û hind. Soz li cem Hogirî jî nema, her çend e ew carna xwe bi hindê qayil dike ko dibe ew nizane ka ew li kûderê ye û nizane ka çawa danustandinê digel wê deyne û dibe jî Xudê neke tiştekê ne baş bi serê wî hatibe.

Malxulyanên bêzarker ew têkşilqand. Hindî wê hizra xwe di rewşa xwe de dikir, jiyan li ber çavên wê bêtir reş û tarî dibû û êdî tam û çêj bo jiyanê li nik wê nedima. Wê misteka avê li çavên xwe kir û vegerya ve bo cihê zilam lê rûniştî. Ew bê deng rûnişt û pala xwe da darekê.

Tav avabû û şevê perdeya xwe ya reş bi ser wan de dahêla. Zilaman dewarên xwe bar kirin. Nêzîkî Besnayê, zilamekî barê hespê xwe ji ser kur-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tanî rakir û deyna erdî û paşî kurtan bilind kir û avête ser pişta dewarê xwe. Di wan delîveyan de çavên Besnayê çûn çeqokekê, yek bihustî ji wê wêvetir, ji tiştên wî zilamî, kete xwarê ser axê. Wê, bê hizirkirin û bê ko bizanibe ka çima wedike, hêdî destê xwe dirêjî çeqokê kir û zû rakir û xiste di berîka fîstanê xwe de.

Piştî wan xwe lêkdayî, giş ketine rê, ji bilî yekî bi tenê li wê derê ma bû, dihat û diçû û temaşayî axê dikir. Hevalan gazî kirê bona ko lezê bike, wî jî weha lê vegerand:

— Çeqoka min berzebûye û nabînim.

— Hey mala te ava, ma nuke çaxê li çeqokgerhanê ye, yekî ji hevalên wî lê kire qêrî. Welatê me berze û winda dibe û hêj em pir ji dil û baş lê na gerhin. Hema hişyar be ritil û gun jî li te berzenebin, heke paşî êdî jin jî te naxwazin.

Bû tîq tîqa hineka û kenîn.

— De were mal tirnêsnek, ka çeqok çi ye, hema eve çeqoka min bo te, yekî weha bangî wî kir.

Bûn du qol, du zilam bi Besnayê re ber bi gundê Girka çûn û Şêro bi yên mayî re ber bi devera Qeşûriyan ketine rê. Yên ko çûn Girka du dewar pê re bûn. Besna û zilamek siwar û zilamê din bi pêyan li pêşiya wan diçû. Berî ko ew serbikevine evraziyê ko ew dibirine bo hindav cehdeyê, piyawê siyar gote pismamê xwe:

— Ez dibêjim heke em dewarên xwe li vê derê bihêlin û bi pêyan biçin Girka û her îşev bizivrin ve û biçin bo malên xwe çêtir e, an tu çi dibêjî?

— Hey mala te ava diyar e dilê te bi gurgan dişewite, pismamî lê vegêra. Nê me inyet e tiştan bikirin, nexêr em dê dewara bi xwe re bibin. Lê divêt em jê peyabibin û lixavên wan bigirin bo ko ne şehin û dengê wan neçe serbazan.

Hosa xudanê pêşniyara duwê û Besna ji dewaran peyabûn. Ew bi hespê xwe kete pêşiya Besnayê û yê din jî bi hespê xwe ve da dû wan.

— Hêdî hêdî werin, her yê li pêşiyê got, ez dê pîçek li pêştirî we bim, bo êmnahiyê.

Çil pêncih bihusteka çûn û dengê qêriyeka xendiqî ji Besnayê hat. Zilamê li berahîkê li pişt xwe zivirî, dît ko Besna sist û xav bû û ket ser axê. Li hevalê xwe kire gazî û her du bi bez çûnê.

Besnayê kefîkek raheşandibû di devê xwe de bo ko qêjiya wê dûr neçe û çeqok bi hemû hêza xwe xistibû nav zikê xwe. Rengê navçavên her du zilaman wergerha û zer û pêtî bû û devên wan ji sersûrmanê mane beş.

Yekî kefîk ji devê wê anî derê û destên wê bi xurtî ji çeqokê vekirin û gote pismamê xwe:

— Xwîn mişe ji ber diçe, lê hêj ya sax e. Lê em çi li vê birînê bikin?

Yê din li batî bersivê bide bi çavên xwe yên xemokî û dengekî şikestî gote Besnayê:

— Erê xwîşkê eve te çi anî serê xwe û serê me? Nê te em şehmizar kirin, em dê êdî bi çi rû biçin bo nav xelkî, bo nav kes û kar û niyasên xwe?

— Hosa çêtir e, hê Besna ji ezmanî neketibû û ev bi dengekê pir kovandar got. Min ev kir bo ko xelik hemû bizanibin ko zordarî û destdirêjkarî li min hatiye kirin. Bila giş bizanin kîn e tadarî li min kirî. Min nevêt yê wan ji min bibe û naxwazim heta mirinê serşûr û devgirtî bimînin.

Rondik ji çavên wê hatine xwarê bo ser rûçikên wê û xwîn jî her ji ber birîna wê ya kûr diçû. Herdu zilaman bizav kir ko çareyekê jê re bidozin. Yekî dest dayê çeqok ji zikê wê kêşa derê û şaşika xwe ji serê xwe kir û birîn pê werpêça. Lê her zû cemedanî bi xwîna wê ter û sor bû. Herduyan çi şehrezahiyek di warê birînpêçiyê de nebû, hema hind karîn şaşika yê din jî li birînê bipêçin.

Wan bi hêbetbûn hêv dikire Besnayê û di ber re bi çavên pirsyarkî tên dida hevûdu, her weçku her yekî ji yê din dipirsî ka çi bikin ko pê bikaribin xwîna wê rabiwestînin. Lê diyar bû çi ji dest wan ne dihat û her weko kurd dibêjin »xwê dixwar û av bi ser de dikir«. Çi demekê wisa bi ser ve ne çû, bêhinhilkêşana Besnayê çik bû, êdî nedihat û nediçû. Besna di destên wan herdu pismaman de ma bê can û ne liv. Bi wî awayî wê xatira xwe ji cîhana xwe ya berteng, ji zîndana mezin xwest.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 6 –

Çaxê Şêroyî zanî ko Besnayê xwe kuştiye, cîhan bi yekcarî li ber çavên wî tarî bû. Ew di nav xwe de ariya, şariya û tingijî. Pîç pîçe kerb û kînê xwe dahêla nav kûratiyên wî de. Kerb ji hukumeta Bexda û dam û dezgeh û leşkerê wê. Kerb ji desthilatdarên Iraqê û dûvelankên wan. Kerb ji dagîrkerên welatê wî, yên ko pêyan didin ser mafên mirovan û ser mirovî bi xwe, yên ko welatê wî ji xwecihên wî re kiriye zîndan. Kerb ji hemû sembolên tepeserkirin û daplosîn û zordariyê di nîştîmanê wî de û li her cihekî din li cîhanê. Di nav wî de diyalogeka navxweyî saz bû:

— Çima ew ho li me dikin, me tepeser dikin û zordariyê li me dikin? Di praktîkê de, ne me bi hevwelatiyên xwe dizanin û ne jî bi miletekê cuda. Û nahêlin em azad û bi serê xwe jî bijîn. Erê gelo wan çi ji me divêt? Erê ew di wê bawerê de ne ko topizê zordariyê dikare vên û îrade û hest û nest û hezlêkirin û lênerînên mirovî biguhore yan jinav bibe û bimirîne? Aya ew wê hizrê dikin ko bi agir û asinî miletê Kurd di nav xwe de bihelînin? Eger hizirkirin û reftar û livîna wan bi vî awayî be, ew gelek û gelek şaş û çewt in û dê encamên siyasetên weha berûvajî bin. Ne miletê wan rehet dibe û ne miletê me.

Rastî ew e; hindî mirov bêtir tê tengav kirin, bêtir diazire û pêla tingijîn û xeyidînê li ba wî bilindtir û bi hêztir dibe. Rast e, dibe ko li pêşiyê ew hemû şilqên û kelekel neyê pêş çavan û bes di hundurê kesan de peyda dibe, lê roj bi roj, digel zêdebûn û dijwarbûna zordariyê, ew jî gerimtir û bilindtir û bi hêztir dibin.

Di berdewambûna rewşa pir tengav û êşdar de, dê xeyidîn bigehe loka peqînê û bêguman eger neyên çareserkirin, roja peqînê jî li dû tê. Peqîn jî vulkan e, sotin û şaryan pê re ye, ne çi hêz û ne çi kes nikarin devî li vulkanê li ber peqînê bigirin, heta ko ew bi xwe ya di dil û hinavên xwe de nehavêje û xwe baş rehet neke. Piraniya caran jî peqîn çav kore ne; agirê wan ter û hişkan, baş û xeraban dide ber xwe.«

Li cem Şêroyî ev, ya ko li dijî miletê wî diqewimî tiştekê ne li ber aqil bû û nedizanî ka desthilatdarên Bexdayê yên ko ew biryar didan çawa

hizir dikin û çawa xwe û xelkê xwe yê ko şerên weha pê dikin, qayil dikin. Diyaloga di nava wî de berdewam bû:

— Hey pa xişîm in, eve çendîn sal in, ew kurdan, xelkê Kurdistanê bindest dikin, diêşînin, ditirsînin, digirin, azar didin, kit û mat û bi komelan dikujin, ji gundan derdixin û sergunî başûrê Iraqê dikin. Gundên wan, welatê wan kavil û wêran dikin û her rewş xerabtir e. Kurd her hene û axa xwe bernadin û li bin topizê zordariyê bêtir hevudu digirin û hişyariya neteweyî berfierhtir dibe û bêtir digehe û şerê man û nemanê û bergirîkirinê û berxwedan xwe didomîne û bi hêztir dibe.

Bi vî terzî, ew kerb û kînê dixin di navbera me û ereban de û birînan kûrtir lê dikin. Bi vî şêweyî nahêlin akincîbûn li nik ereban jî hebe.

Bi milyonên dolaran her salê di şerê xwe de li dijî miletê me pûç dikin, çekan pê dikirin, Kurdistanê pê dikin leşkergeh û qada şerî û paşî çi û dûmahîk çi ye û çawa ye? Hindî wêvetir e kurd şiyartir in û bêtir li xwe û doza xwe bi xwedî derdikevin.

Dagîrker û xudanên van siyasetên ne mirovane jî li ser pelên sor û dax, li ser tirs û teqeleqê, li ser mînan rûdinin û çi caran jî xweziya wan ya dij bi mirovî û mafê mirovî û mafên gelan bicînabe.

Vê şirovekirinê bawerî bi xwe li nik wî bi hêztir lê kir, lê xem jî ketibûne ser hev û ew ji kulovanka serî heta binê piya vegirtibû. Giriya wî hat, ne xwest rê li ber bigire, giriyeka bê deng, lê ya pirî firmêsk kir.

— Ma eva bi serê me hatî, bi serê kê ji bilî me hatiye? diyaloga wî ya navxweyî berdewambû. Bi serê cuhiyan li ser destê Hitlerî di şerê cîhanî yê duyem de? Ez di wê bawerê de me ko karesat û terajediyaya me ji ya hemûyan mezintir û bargirantir e. Ha nêzîk e temenê tepeserî û perîşanî û rezaletiya me ji sed salan derbas bibe û ev ji miletekî re pir e.

Dêmê wî xemokî bû. Serê xwe xiste nav her du lepên xwe û weko kesekê serêşaneka mezin heyî, serê xwe givaşte serêk û pê re kete malxulyan û dalxelêdanê.

Ew çend rojek bûn ew li wir bû, li zomeka Qeşûriyan. Kesine wek wî, bê gimlik, ji başûrê Kurdistanê, li wê derê hebûn. Rûniştivanên deverê, ew û yên weke wî, bi bertîlan, ji dest cendirmeyan qurtal dikirin û diparastin. Kurdên bakûr arîkariyeka mezin pêşkêşî wan dikir.

Şêro wê rojê hemûyê ji bin keprê ne derketibû derê, ew jî ji ber ko cendirme nêzîk bûn û digotin dûr nîne hêzeka leşkerê tirkan li nêzîkî zozanê xwecih bibe û hîngê rewş xerabtir dibe. Li cem wî ew jî zîndan bû, »ma heke mirov ji xwe û jiyana xwe êmin nebe û neşêt bi dilekê rehet


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

rûne, rabe û binive, hema ji zîndanê jî xerabtir e«, wî weha digot xwe .

Hatin û çûna wî ne li gor dilê wî bû û diviyabûya ji zomê derneketibûya û heke derketiba jî diviya bi qeçaxî û veşarkî ba û pêrgî cendirme û mît û nehezan neba.

— Dê were welatê mirovî ji mirovî re bibe zîndan! Ev hevoke du sê caran digel xwe got.

Gelek hizra xwe di hindê de kir ka çi bike û dawiya wî dê çawa be. Carna heza nivîsînê xwe li dilê wî dida û dixwest hewil bide xwe bi nivîsandinê ve mijûl bike, lê ji xwe dipirsî:

— »Çi binivîsim? Helbestan? Lê helbestvanên me ji mêşan jî bêtir in. Xwe tiştekê gelek baş e, lê dê çêtir be eger hindî wan çîroknivîs û romannivîs û şanonivîs û nivîskarên rengên din yên edebî û ne edebî jî hebin.

Ez dibînim ya çêtir ew e ez xwe mijûlî nivîsandina çîrok û romanan bikim. Mebesta min bi vê gotinê ne kêmbuhakirina helbestê ye, nexêr, çunkî dê her hezdarên nivîsandin û xwendina wê û her şêweyekê din yê edebî hebin. Lê ez xwe bisteh dikim û dibêjim gelek hene helbestan dinivîsin bê ko nivîsa wan rengê helbestan tê de hebe û jê xuyadibe ko mebesta wan bes ew e ko pirtûkeka wan hebe û weha û bi wan nivîsên xwe torê kurdî dewlemend nakin. Bi ya min heke mirov nikare tiştekê baş yan tiştekê nû binivîse bila xwe bi xwendina wî tiştî bêtir ji nivîsandina wî mijûl bike.

Ez bêtir hez dikim dest bi nivîsandina çîrok û romanan bikim, çunkî nivîskar tê de serbestir e û dikare tê de qala gelek babet û bûyer û serhatî û pirs û pirsgirêkan bike. Bi dîtina min çîrok û roman ji bilî ko ji gelek jiyan û ji babet zanistên cur bi cur û pêk tên, her wisa jî ji zimanî re û bo hînbûna wî xwendingeh in. Lê çi çîrok binivîsim û li ser çi?

Bêhneka xweş hizra xwe xiste ser hindê ka li ser çi babet û çi rûdanê binivîse, paşî dev ji wê hizirkirinê berda û gote xwe:

— »Ma çi ji babetên çîrok û romanan li Kurdistanê mişetir in? Hema li her bihustekî bi dehan tablo û wêneyên balkêş û serinckêş û sersormêner hene lê şehrazahî û zanîn ew e mirov bikaribe wan destnîşan bike û ruha wan nas bike.

Ma bo çi weke berahîk dest bi serhatiya jiyana xwe nekim? Belê, xweş hizr e, li destpêkê dê bîrhatinên xwe nivîsim. Belê, wê ya ko bi serê min hatî û min bi çavên xwe dîtî û nuke tê de dijîm binivîsim, dê tiştekî baş û bi sûd jê durust bibe. Bes pêwîst e ez endêşe û fantaziya xwe jî tê de bikarbînim û dê weha pirtûkeka rind û nirxdar û baş hête pêkanîn. Oh...bi-

borin, bila biryara başî û nebaşiya pirtûkê bo xwendevan û rexnegiran be.«

Hema hêşta kela hizra nivîsînê di ser û dil û mejiyê wî de, ew rabû ser pêyan û defterka xwe ya biçûk û qelem ji berîka kirasê xwe derxistin. Hinekê hat û çû û hewil da destpêkekê peyda bike. Paşî ji nişkan ve kete ser zikê xwe, her weçku awayê xwedirêjkirina li ser zikî bêtir arîkariya wî di nivîsandinê de dikir. Piştî kelevajî ser zikê xwe bûyî, afrandinê li nik wî dest pê kir û çend rêzik nivîsandin. Rabû ser pêyan û rêzên nivîsandîn xwendin, lê bi dilê wî nebûn. Torebû, ew per ji defterkê vekir û bi xeyidîn qirmiçand û dûr havêt.

Kete ve ser zikê xwe û bizaveka din kir û qelemê xwe bi lez li ser kaxezê xişand û ev çend rûpelên berahiyê ji romana xwe nivîsandin:

»Her gaveka ez hizra xwe di jiyana xwe de dikim yekser tişt û bûyer û bîrhatinên xembar û dilgir tên bîra min. Erê gelo binasê vê çendê ew e ko jiyana min di piraniya xwe de ji nexweşî û talî û serborên jandar pêkhatiye, yan jî hema ew parçeyên êşdar yên jiyana min di min de zaltir in û her tim ew bi tenê li ber hizr û çavên min in?

Çi cara ew rezaletî û perîşaniya ko em li bajarê Mûsilê tê de jiyayîn ji bîra min naçe. Her çend e ez li gundê Hirorê ji dayik bûme lê zaroktiya ko min li gundî borandî nahête bîra min, çimkî hê ez pênc salî bûm çaxê mala me ji Hirorê hatiye veguhastin. Hîngê, di sala 1961-ê de, babê min biryar da ko mala me ji gundî bibe wî bajêrî. Dixwest bi wî awayî xwe ji qerqeşe û şer û pevçûnên gundî û gundiyan li ser avê û axê û givandeyên milk û bîstanan dûr bixe. Wî ne dixwest dilê çi kesekî biêşîne.

Hêviya wî ew bû bikaribe ew û zarokên xwe li Mûsilê ko bajarekê mezin e, nanê paletî û rencberiya xwe bê qerqeşe û bê serêşan bixwin. Babê min mirovekê gelek li ber xwe rawestayî bû. Her çende ji gundî mişext bû, lê kulmal û xweziya wî ya herî mezin ew bû ko bikaribe li gundê xwe, li ser axa xwe bi ked û renca xwe, tena û dilxweş û serfiraz bijî. Lê, ba, ne li gor dilê gemîvanî bû û weko wî dixwest birêve neçû. Her roj, şerenîx û lêkdan û mehkemeyên cîranan û gundiyan li ser vê zeviyê û coka henê û bihustekî givandeyî bûn. Hema mamê min bi xwe jî li ser bihustekê axê bi destê mala Reşoyê Sêbizinan hate kuştin. Herdu cîranên hevudu bûn û ji kevin de şemate û kêşmekêşa wan li ser tuxîban bû. Bi gotina Reşoyê Sêbizinan, mamê min bihustekê axa wî bi ser ya xwe ve biribû.

Ne bes mamê min û babê min lê gizîrê gundî jî ko aqildar û rehispiyê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

gundî bû, digot ko hindî li bîra wa ye, ew bihustê axê yê mamê min bû û berî wî jî yê babê wî bû. Weha ye, ne çi tapo û ne çi mehkeme hene û her yek û pehinka devê xwe û ka kî û çend şahid hene.

Reşoyê Sêbizinan bi yazde kurên xwe ve dixinzirî û dixwest bihustê axê bike yê xwe û bo xudanê wê revda kuran bihustekê axê pir e. Mamê min jî digot hema ne xweş e mirov neheqiyê li ser xwe qebûl bike û ew jî ji ya xwe ne dihate xwarê. Li dawiya dawiyê Reşo bi kurên xwe ve çûn berahîka mamê min û rê li ber girt. Mamê min yê bi tenê bû û dema dîtî ko wan karê şerî kiriye xwest wan ji kerê belayê bîne xwarê, Lê bê hode bû. Ev, babê min, wisa ji min re vegêraye. Digot çi di destê mamê min de nema ji bilî ko berevaniyê ji xwe bike. Di şerî de, mamê min, wê rojê, Reşoyê Sêbizinan û sê kurên wî birîndar kirin. Lê her di wê rojê de û her di cihê şerî de mamê min hate kuştin. Reşo jî bi dijwarî, bi xencera mamê min hate birîndar kirin û bi wê birînê mir.

Hîngê gelek ji gundiyan ketin bin babê min û wan ew han dida bona ko tola birayê xwe bistîne. Her çend e babê min mirovekê ne xwendewar bû lê yê pir aqilmend û li ser xwe û li dijî bikarnîna hêzê, di çareserkirina pirsgirêkan de bû, lewma jî guh neda wan û zoxandina wan û digote wan:

— Ma tola çi û kê vekim? Nê Reşo jî hate kuştin û sê kurên wî jî birîndar bûne û birîna yekî ji wan pir dijwar e.

Babê min ew bira bi tenê hebû û hindî dinyayekê hez jê dikir û qet gotina wî li erdî ne dida, lê wî jî pir babê min diviya û jê re gelek guhdar bû. Nemana mamê min birîneka kûr di dilê babê min de çêkir. Çi roj ne derbas dibûn eger wî qala wî û mêrxasî û zîrekatiya wî ne kiriba.

Ne dihêla dayika min li malê girara danequtê çêbike, ji ber ko mamê min ew girar ne diviya û babê min jî ji ber wî, çêkirina wê girarê di malê de qedexe kiribû. Ew qedexekirin piştî mirina mamê min jî ma û dayika min ya ko pir hez ji wê girarê dikir, ne dikarî ji tirsa babê min wê çêbike, her çende babê min bi xwe jî hez ji wê girarê dikir.

Ji bilî vê karesata ko babê min dilteng û xemgîn kirî, ew bi xwe jî ji arêşe û problemên ava avdanê û cok û givande û sinûrên erdî bi cîranan re bê behir nebû. Wî ne diviya mîna mamê min, birayê xwe, bike. Xwe, wî bê qam hez ji gundê xwe û axa xwe dikir. Evîndarê jiyana gundî û rezvantî û cotkarî û şivantî û gavantiyê bû. Li cem wî ji jiyana bi azadî li ser erd û milk û axa xwe xweştir û serfiraztir nebû. Bes pa welê hat ko babê min, ji bêgaviyê biryara veguhastina mala me bo Mûsilê bide.

Wênekirina dayika min bo gavên xatirxwestina babê min ji gundê xwe,

bi xwe dramatek e, her roj li welatê me rû dide:

— Şev bû, tava heyvê geş dibû û diviyaba çi kesekî bi çûna me nezanîba, dayika min gelek caran ev ji min re salox kiriye. Me çi ligel xwe ji gundî ne bir. Hema em, bi can û laş û cilên xwe ve û nan û xwarineka têra me û rêya me, bi dizîkî ve ji gundî derkeftin. Hê em ji gundî dûrnekeftibûn, babê te em rawestandin, li piştxwe zivirî û berê xwe da gundê dar û bar û tariyê di nav xwe de werpêçayî. Kizgiryokê hefka wî girt û çav lê sor û pirî rondik bûn. Min qet bawer nedikir ko babê te dikare bigirî, çunkî min ew çi cara ne dîtibû bike girî, lê xuya bû cudabûn ji gundî li nik wî ji hemû tiştekê din dijwartir û sextir bû. Kete ser çoka û êdî pir ji dil kire girî. Giriya wî dil li min şewitand û ez jî berdame girî. Paşî û her weko gund Mekkeha wî, herdu lepên xwe û navçavên xwe xistine ser axê, te digot qey ew nivêjê ji gundî re dike. Paşî serê xwe bilind kir, tijî lepên xwe ax kir û rabû ser pêyan û ew axa di lepên xwe de nêzîkî dêmê xwe kir û devê xwe pêrana û maçîkire wê axa di lepan de. Ji nişkan ve ax ji destên xwe berda xwarê bo ser erdî û hat û ji ber barê kerê tu lê siyar tûrkek anî derê, her weçku bo hindê anîbû. Ew tûrikê biçûk tijî ax kir û xiste ve ber barê kerî. Aha eve ew ax, hêşta di vî guldanê henê de ye, û dayika min tila xwe dirêj dikire guldankekê gulroz tê de. Em kî ve biçin ew guldank bi me re ye. Her roj jî çend carekan bêhin dikeyê û her careka bêhin dikeyê pê re dipeyive û dibêjeyê: hey axa minê tu çenda buha giran û şirînî!

Dicle bajêrê Mûsilê dike du alî; hindî yê çepê bû xwecihên wî piranî kurd bûn û hindî yê rastê bû piranî ereb bûn. Mala me li aliyê rastê bû. Em bi xwe maleka boş bûn. Manê her salekê duwa dayika min minalek dibû û bi wî rengî barê berpirsiya babê min mezintir û girantir dibû. Ew di wê bawerê de bû ko heke zarok bû Xudê rizqê wî jî digel wî dide. Lê li vî welatî jiyan pir sext û dijwar e û eger mirov kar neke çi hukumet û dezgeh xema ji bêkaran û rewşa wan naxwin.

Bêkarî jî mişe bû; di maleka heft heşt kesî de, yekî yan duwan kar dikir û yên din dixwar û bi aneh û hêviya Xudê jiyan birêve diçû û bêkarî û bê pereyî jî zêdetir dibû. Karbidestxistin ji paleyekê mîna babê min re pir qurs bû. Her roj siharê diçû meydankekê ji meydankên bajêrî ko digotinê elsaet û li wê derê bi dehan kesên din jî yên weko wî diciviyan, li hêviya ko kesekê pêwîstî bi paleyekî hebe bêt û ji xwe re paleyan bi dilê xwe hilbijêre, evca her kes û şansa xwe. Weha ne hêsan bû ko hemû rojan kar bi dest wî bikeve û gelek caran bi dilekê şikestî dihate ve mal, ji ber


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ko kar bi dest nediket û bêkariyê jî problem zêde dikirin.

Kirêya xaniyan jî giran dibû û ya ji hemûyan jî nexweştir veguhastina malê bû. Hema, em da hind bînin rojekê ji rojan, ji nişkan ve û bê agehdarkirineka pêşwext, xwediyê xanî hat û ji me xwest serê mehê xaniyê wî vala bikin. Mesele çi ye çi nîne? Welle, çivêlê xudanê xanî bê şerim dibêje »xanî xaniyê min e û ez bi dilê xwe me« yan jî dibêje »kesek heye kirêyeka bêtir ji ya we dide, evca yan jê derbikevin yan jî dê kiriya we girantir lê bikim«.

Hosa, her du sê heyvan diviyabaya babê min li xaniyekê din bigerhabaya û mal veguhastibaya. Bi wî awayî kirêdarî û veguhastina malê û bêkariyê pişt li babê min xwîl kir û ew zû pîr kir û ji hêz xist. Diyar e ew di nav xwe de pir diêşiya, lê derê cîhana xwe ya di nav xwe de, li ber çi kesekî venedikir.

Di jiyê heft saliyê de, weke piraniya zarokên kurd, min jî dest bi karî kir; karekê pir erzan, di çayxaneyekê de. Zarokine ji hevjiyên min û du sê salekan ji min mezintir boyaxçiya pêlavan li ser cadeyan dikir. Yên mezintir jî, ji genc û zilamên kurdan, di loqente û paletiya serxaniyan û barhilgiriyê û di karên din yên zehmet de, li hember pereyekê kêm, wekî karkerên erzan, kar dikirin. Ji bona ko ez biçûbama xwendingehê diviyabaya min li her havînekê, li çaxê pişûdana havînê, karek ji xwe re bikiraya, ko min pê pere, têra cilên xwe û xwendingehê û pirtûkên wê vêkxistibana, eger na, hîngê ez û xwendingeh ji hevudu xelas. Binasê vê yekê jî mehaneya babê min ya kêm bû ko bi xurtî têra kirê û xwarinê dikir. Hema hindî li bîra min e dayika min her eynî cilka li ber bûn. Du dest bûn, destek dişûşt û destek li ber bû. Xwe rewşa her heft birayên min jî ne çêtir bû ji ya min.

Min her ji zaroktiya xwe pir hez ji xwendinê dikir û min mereq bû ez di paşerojê de bibim nivîskarekê bi nav û deng, ko pirtûkên wî mişe bêne xwendin. Min li havînan li çayxaneya mûsiliyekî kar dikir. Her ji berê spêdeyê heta êvareka dereng.

Ez gelek diwestiyam, lê min, li mal, xwe bi wê westiyanê ne dianî derê, ji ber ku, ya ji min ve, eger dayik û babê min pê bizanin ko karê min ji min re sext û dijwar e, ew wenakin êdî ez kar bikim.

Dema li dawiya karî, piştî seet nehî şevê, xwediyê karî rojaneya min dixiste di nav destên min de, şadiyeka bê qam ez digirtim û min wê gavê bêtir ji her gaveka dî, hest bi hebûna xwe dikir. Min ew rojane dixiste di berîkeka penteronê xwe de û destê min jî di berîkê de ew fils digirtin, ji

bo ko jê hêmin bim ko nakevin. Tiştekê pir balkêş û pîroz e ew hestpêkirin; ko mirovî buhayê ked û renca xwe wergirtiye û ew pere mafê mirovî ye. Ne pereyê bi minet û xazxazokî û hêve û wêve ye, lê mirovî tiştek ji xwe daye ko renc û ked e û tiştek din li hember wê standiye ko pere ye. Gava ko ez di rê de pêrgî keçekê dibûm, min zirzir ji berîka xwe dianî û min bi hindê dixwest bala keçikê bikşînim ser hindê ko min jî pere hene û ez jî xudan kar im, kurt kurmanc, hestên zilamtiyê li cem min dibişkiftin.

Dema diketime hundurê malê, yê serbilind û dilxweş bûm. Dayika min digot »wey ez gorî te bibim kurê min, karkerê malê«. Hîngê min hest bi hindê dikir ko ez jî tiştek im û min jî cihê xwe yê diyar di malê de heye.

Pere diçûn destê dayika min û wê ew dixistine di sindoqeka ji tenikeyî ya mezin de, ko cilkên me tê de dihatin hilgirtin. Sindoq jî her qifilkirî bû û kilîl li cem dayika min bû. Berî destpêka sala xwendinê hinek ji wan pereyan ji bo kirîna cilikan diçûn û yên mayîn jî ji bo qelem û defter û pirtûk û rojaneya me, di çaxê çûna xwendingehê de, diman.

Yek ji bîrhatinên êşdar ko her tim li ber çavên min e, ew bû ya bi serê me dihat, di riya çûna me de bo xwendingehê û vegera me ji wê.

Çaxê em zarokên kurdan derdikeftin derveyî malê û jê dûrdikeftin, coqeyên zarokên ereban bi keviran, û li havînê bi tîvilên şitiyan, radihêlan me û bera me didan û şer digel me dikirin. Hêj heta nuke jî lêheytînên wan di guhên min de deng vedidin. Rê li me digirtin û êrişî me dibûn û ev slogan çend bare dikir:

— Kixdî kixdî hemaqe
şalil kubbî û lezeqe
lezeqe bil bixniyî
til'it kubbî mehşîyî

Yan slogana:
— Kixdî exû cehşo.

Ev, ji bilî xeber û gotinên pir ne xweş û keşefir û kirêt. Rast e ko ew zarok bûn, lê em jî zarok bûn û me wilo, weko wan reftar nedikir. Erê gelo ma ew kerba wan ji kûve dihat? Xwe me weke zarok, çi tiştê xerab rû bi rûyê wan, li hember wan, li dijî wan ne kiribû. Me çi tiştekê weha nekiribû ko dilê wan pê biêşe û pê ji me bixeyidin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xuya bû wan ew çende ji yên ji xwe mezintir girtibû; ji bab û dayik û bira û xwîşk û kes û kar û niyasên xwe. Weha, rayeka giştî li cem ereban, li beramberî kurdan, bi destên hukumdar û siyasetmedarên Iraqê û dezgehên wê yên ragehandinê hatibû çêkirin. Hema her bi vî awayî bingehên tuximperistî û raşistî û faşistiyê tên deynan.

Hitler bi jînenîgara xwe ve wêneyekê herî li berçav e li ser vê rastiyê. Wî ji kerbvebûnê ji Cuhiyan dest pê kir û paşî bû kerbvebûn ji her nifşê ne arî heta ko gihaştiye kerbvebûnê ji her nifş û tiştê ne almanî û li dawiyê kerb û kîn ji her kes û tiştê ne nazîst û ne hitlerî. Wî di nav zarok û xurtan de dest bi wê idiolojiya xwe kir, ji ber ko bi dîtina wî, ew perekê sipîn e û xwîngerm in û ew dikare her tiştekî bêxe serê wan.

Ev pêla raşîstiyê di nav tirk û ereb û farisan jî de, li hember miletên biçûk, ko bi wan re dijîn heye. Bo nimûne, li Iraqê kerbvebûn ji cuhiyan û ji kurdan û paşî kerbvebûn ji her nifş û kes û tiştekê ne ereb weke rayeka giştî cih girt. Sedam hat û ew bêtir zoxand û bû idiolojiyek, ko ereb çêtir û paqijtir û pêşkeftîtirîn milet e û weha xwebizildîtin li cem wan peydabû. Di ser demê Seddamî de ew kerbvebûn gehişte loka kerbvebûnê ji her kes û tiştekê ne be'isî.

Biborin ko ez ji serhatiya xwe dûrketim, lê carna pir xweş e, eger mirov ya di dilê xwe de derbixe û bila bo ser kaxezekê jî be.

Dema ko zarokê kurd li derve bi tenê baya, yan du zero bana, hîngê, da qolên zarokên ereban bi ser wan de bin Enter ibin Şedad û da dilê xwe bi me hîn kin. Lê eger zarokên kurdan ji duwan bêtir bana, hîngê yên ereban dibûn tirsinok û xwe didan aliyekî û digotin hevûdu: manê eve kurên hirçan in û hirç mirovan dixwin.

Niha ez mezin im û ez baş dizanim ko ew zarok bûn û wan ne dizanî ka ew çi dikin û guneha wan çi nîne û mirov nikare wan gunehbar bike. Lê ya min pir diêşîne ew e ko bab û dayik û kes û karên wan zarokan ew didîtin dema êrişî me dibûn û tadarî li me dikir û ew ji cihên xwe ne dilivîn û em jêkvenedikirin. Wan xwe ji zarokên xwe tore nedikir, lê tamaşayî me dikir, her weçku dilên wan bi wan kiryarên zarokên wan hîn û xweş dibûn. Diyar bû ko wan şehnazî bi hindê dikir ko zarokên wan weha xwedî cerg in, »kurên ercinan« diqutin. Bêguman wan aferînek jî li ser wê kiryara xwe ji malbata xwe distand û wisa li ser kerb û kînê berebabek dihate perwerdekirin. Xwe ev, bi serê xwe, babetekê berfireh û mezin e û ez vê ji sosyologan re dihêlim bona ko ew bi tefşiyên xwe yên zanistî bikevine ser vê pirsê û şirove bikin û vekolînên xwe li ser bikin û

encaman jî bêxin ber çavên me bona ko em sûdê jê bibînin.

Bi dîtina min, her çend e di kulturên deverê de tiştine hevbeş hene, lê kultura me û ereban, di bineretê xwe de, ji hev cuda ne û kultura me taybetmendiyên xwe hene û weha kesayetiya mirovê kurd jî cuda ye. Hindî em zarokên kurdan bûn, em girêdayî sinc û torên bilind û baş yên navmalbatên xwe bûn. Ev, ne xwe bi zilzanîn e, lê rastiyek e, divêt bête gotin.

Di malabata kurd de reftar, rabûn, rûniştin û danûstandin, ne wekî wê bûne ya di nav malbata ereb de. Çi heddê me bû em şerê zarokekê ereban yan çi zarokekî din bikin. Ne dibû peyveka pîs û çepel ji devê me derbikeftaya. Eger tiştekê weha rûbidaya, da kî guhên me ji destên babên me derbixistana. Babê min ne dixwest em çi kesekî biêşînin û digot: Her kesek weko xwe, ew pîs û em baş, ew tadariyê dikin û em xwe diparêzin û destdirêjkariya nakin.

Xwe, bêguman ev reftareka baş e lê li cihekê ko yasa hemû tişt be û mafê çi kesekî di bin sîbera yasayê de winda nebe, qanûn û hukumet mafên mirovî bê cudahî biparêze. Lê çaxê qanûn nebe yan li astê hindê nebe ko mirovî û avru û mafê wî weke mirov biparêze, hîngê, divêt mirov serî li hember her rengekê zordarî û perçiqandinê be, çi be û çawa be bila bibe, ne çemîne, heke dê mirov bite axa bin piyên tadakaran.

Bi dîtina min eger qanûn nebe yan bes bi nivîskî hebe û weke din kesên desthilatdar li gor dilên xwe dikin, wê çaxê pêwîst e mirov li gor zanîn û şiyan û pêçêbûnên xwe û li gor kawdan û dewr û berê xwe, rê li ber wê zordariyê bigire û hewil bide wê nehêle. Evca ew bizav û hewildan dê çawa be, dê organîzekirî yan hema take kesî be, ev pirseka girêdayî wî rengê zordariyê û qada berfirehbûna wê ye.

Di salên şêstan de hukumeta Iraqê berdewam bû li ser şerê xwe li dijî kurdan û xwestina wan bo mafên xwe yên neteweyî li ser xaka xwe. Hewildana wê ya ji hemûyan mezintir ew bû ko kurd şerê kurdî bike; li gor siyaseta »ji hev veqetîne û xwe bi ser de zal bike«. Û wisa jî bû, hukumetê, ji bilî leşkerê xwe, eşîrine kurd, di şerê xwe de li dijî kurdan bikardianîn. Her digel hindê jî propagendeya xwe dikir û digot: Ha, mêzebikinê, kurd nikarin yek bigirin, kurd dijminê serê xwe ne, kurd nikarin çi dewleta birêvebibin, kurd dê her dijminê yek û du bin, em dikarin wan birêvebibin ûhd.

Hîngê hukumetê hêzên »firsan« çete yan, bi kurdiya durust caş, ji hindek eşîrên kurdan çêkirin. Hukumetê pere û mezinatî dida axa û serokeşîr û şêxan bona ko ew eşîrên xwe, kesên dewr û berên xwe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bixapînin û çekî bi milên wan vekin û bikin çete û bibin şerî lidijî pêşmergeyan. Rast e ew kulav çû serê piraniya axayan lê ne çû serê piraniya kurdan. Babê min jî yek bû ji wê piraniya ko xwe û zarokên xwe ji wê caşatiyê parastî.

Axayê devera me ko li taxa Zuhûrê li Mûsilê, di qesra xwe ya xweş û mezin de dijiya, gelek caran hinarte pey babê min û xwest wî, bi pereyan yan bi tirsandinê qayil bike ko ew yan kêmtişt kurekê wî bibe caş, lê babê min bi ya axayî nekir û her digot: »Eger ez ji birsa jî bimirim ez qebûl nakim kes ji mala min bibe caş. Bila kurên min bibin serbaz di leşkerê Iraqê de, sed hezar caran bi namûstir e ji hindê ko bibin çete û dûvelank«. Çetatî û şerê birayê xwe yê kurd li kin wî pîstirîn kar bû û xinizkariyeka ji hemûyan mezintir bû û her digot: ew kanîka te av jê vexwar bera ne avêjeyê.

Babê min her ji destpêka hatina xwe bo bajêrê Mûsilê û her ji wê gava gundê xwe hêlayî, umêda vegerê bo gundî û bo ser axa xwe pê re bû û digel dijiya. Wî baweriyeka mezin bi hindê hebû ko dê her rojek hêt ko ew û gundê xwe, tê de bigehin ve hevudu û ew roj hat.

Piştî ko partiya Be´is hatiye ser hukmî li Iraqê û nikarî bi hêza çekî serhildana başûrê Kurdistanê ji nav bibe, neçarbû di sala 1970-ê de gotinbêjiyan bi serokatiya kurdan re, li ser çareserkirina pirsgirêka kurd bike. Li dawiyê, li ser şêweyê otonimî ji kurdan re, li ser axa Kurdistana Iraqê pêkhatin û di adara her eynî salê de beyannameya lihevhatinê, ya naskirî bi beyannameya (Yazdeyî Adarê) ji hêla kurdan û hukumeta Iraqê ve hate ragehandin. Wilo şer rawestiya û aştiyeka berwext peydabû û rê li ber xelkî vebû ko vebigerin bo ser gund û milk û warên xwe.

Bi wî rengî delîve li ber bicîhatina niyaza babê min jî vebû. Wî, di hezîrana her wê salê de, mala me veguhazte Hirora xwe ya delal.

Lê mixabin ko jiyê aştiyê weko carên pêşîn kin bû. Piştî ko hukumeta be'isiyan cihê pêyên xwe xweşkirî û desthilata xwe di Iraqê de mukum kirî û bi hêzxistî û piştî bi hêzxistina peywendiyên xwe bi dewletên kenkene yên cîhana me re, wê yekser zimanê xwe digel kurdan guhart ve. Wê, bi yek alî otonomiyê xwe yê kartonî ragehand û xwefiroş û patexorine kurd û bê wergirtina raya kurdan bi xwe, kirine nûnerên kurdan û bê xiş, gunên wan di destên be'isiyan de bûn. Wê, her di eynî wextî de, êrişa xwe ya çekdar jî anî bo ser Kurdistanê.

Piştî nêzîkî saleka şerî û piştî ko ziyanên mezin li ser destê serhildana kurd ya çekdar bi leşkerê Iraqê ketîn û ew nikaribû wê rabûneserxweyê ji

nav bibe û seranserî Kurdistanê dagîr bike ve, hukumeta Be'is arîkarî ji şahî xwest. Hosa, herdu dijminên yekûdu û ji bo lêdana kurdan û parastina berjewendiyên xwe yên hevpişk, dest dane hevûdu. Weha, bi pîrozkirina dewletên mezin, wan di adara 1975-ê de gurzê xwe yê bê wujdan daweşande serhildana Kurdistanê û careka din başûrê welatî kete ve bin destê be'isiyên Iraqê.

Evca desthilatdarên Iraqê her tişetkê ji dest hatî li dijî gelê Kurdistanê kir û karesat li pey karesatê bi serê kurdan û kêmatiyên din yên neteweyî li Kurdistanê anîn. Xelik girtin, kuştin û berze kirin. Hinek jî derbiderî başûrê Iraqê kirin, bo nav deşt û leylanên şewitî û germixî û hin jî di ordîgehên zoremilî de, bi topizê zoriyê binecih kirin. Başûrê welatî bi dirêjahiya tuxîbên xwe li bakûr û rojava û rojhilat û bi kûratiya bîst kîlometran ji rûniştivanan hate valakirin. Gund, xanî, war û milk û dar û bar û rez û derametên wan hatin sotin û bi erdî ve rast kirin.

Li hinek deveran jî, li şûna kurdan ereb binecih kirin û ji wan re xanî ava kirin û ax li ser wan dabeş kir û pere û otomobîl danê.

Biborin, ko ez we jî bi xwe re dibim bo nav politîkê, lê çare tune ye, ez neçar im qala van pirsan bikim, ji ber ko ev girêdayî min û malbat û kes û kar û derdora min in, xwe ez jî yê çîroka xwe û ka çi hatiye serê min ji were dibêjim. Gundê me, Hirorê jî yek bû ji wan gundên li berahîkê hatine vala û wêran û kavil kirin.

Leşkerê Iraqê em û tişt û miştên me heyîn, bi zîlên xwe birin û havêtine ser cehdeyekê li bajarê Duhokê. Çi kes û nasên me di bajêrî de nebûn. Baş bû hîngê havîn bû û xwendingeh girtî bûn. Bajêr jî yê kurdan bû û xwecihên bajêrî pir dil bi me şewitî û xwestin arîkariya me bikin. Her çend malek dakirine di xwendingehekê de, bi mercekî, berî ko xwendingeh vebin û sala xwendinê dest pê bike em xaniyan ji xwe re kirê bikin û xwendingehan vala bikin.

Babê min derbiderbûna wê carê ne dît, ji ber ko wî pêş barkirina me ji gundî bi du mehan xatra xwe ji jiyanê xwest û mir. Em weha, di bajêrê Duhokê de binecih bûn.

Ez careka din vedigerim ve bo ser pirsa kerbê ya ko di nav min de serî hildide. Erê gelo ew ya nû ye, yan jî girêdayî wê hemûyê ye, ya ji zaroktiyê heta niha bi serê min hatî û min bi çavên xwe dîtî? Bêguman bi wê gişê ve girêdayî ye û niha dest bi xuyabûn û bizivînê dike. Lê, aya ev kerbe li dijî wan kes û sembolan e yên ko me tepeser û perîşan dikin? Yan jî kerb e ji destdirêjkariyên wan bo ser ax û gund û bajar û mirov û kultura me?

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Yan kerbe li hember reftar û kiryar û bîr û bawer û dîtinên wan yên regezperês, ko xwe bi nijadekê bilind û resen didin nasîn û me, bi pir nizim û çi ne li qelem didin?

Dibe ko kerb be li dijî wê çendê ko ew xwe bi tenê bi mirov dibînin û mafê her tiştekî didin xwe û yên derveyî nifşê wan, li gora wan ne mirov in û nabe daxwaza çi mafan bikin û eger bixwazin weko mirovan bijîn, divêt xwe ji nijadê xwe bişûn û xwe bi nifşê wan ve girê bidin. Dibe jî ko ev kerb li hember wan hemû tiştan e ko bi zordariyê aviz in û zordarî jê çêdibin.

Xwe rast e ko ev kerbe piştî kuştina herdu hevalên min û xaleta Zuleyxa û xwekuştina Besnayê peqiya. Lê weha ye, ko tişt kete serêk û bargiran û dijwar bû dê reaksiyon, rengdanewe, çêbibe. Dibe jî ko serekaniya vê kerbê ne bes ev bin, lê tiştine rojane jî bin.

Bila ez we bo paşde bizivirînim; demê hê ez dwazde sêzde salî û dildarê xwendinê. Hîngê, kes nebû nîşa me bide ka bo zarokekî, di jiyê me de çi baştir e bixwîne. Evca ez û hinêr û mereqa xwe. Wey gidiyo ezo, her çi pirtûka dikefte ber destên min, mîna kulafiyan dikeftime ber û min dixwend. Bigire ji pirtûk û çîrokên ayînî û hezar şev û şevek û dastan û efsaneyên millî û pirtûkên dîrokê û çîrokên zarokan heta digehişte çîrokên polîsî yên weko Ersîn Lobîn ûhd. Ne bes vaya, lê çîrok û romanên kenkeneyên edebê cîhanî, mîna Dostoyevskî, Tolstoyî, Viktor Hogoyî, Balzakî, Dîkenzî, Çîxofî, Sarterî, Kamoyî, Hemingwayî û hêş gelekên din jî.

Ez dibêjim ji ber wê xwendina min ya mişe kela nivîsînê li min da. Hîngê min xwe bêtir di nivîsandina helbest û kurte çîrokan de desthil didît, lê bo zanîna we min bi zimanê erebî dinivîsand.

Min car û baran hinek ji wan nivîsên xwe nîşa mamosteyê xwe yê ziman û edebê erebî didan. Li destpêkê bawer ji min nekir ko ez im nivîskarê wan berheman, lê di dawiyê de bawer ji wê rastiyê kir û ez han didam bo berdewambûnê li ser helbestraçandinê. Bes pîç pîçe dilê min ji nivîsandina bi erebî sar bû û jê dûrkeftim û gehişte hindê ko min bi yekcarî dev jê berda û min hevsarê xwe ji nû bi dest xwe girt. Belê, min berê xwe da zimanê xwe û nivîsandinê bi kurdî.

Dibe reftara ereban ya negatîv û gelek hezkirina min ji kurdiyê, bûn hoyên ko erebî li ber dilê min reş bibe. Û wisa mereqa min kete ser zimanê min yê kurdî û kultura me.

Tê bîra min ew cara dawiyê ya ko min tê de helbesteka xwe ji kovareka

erebî re şandî. Hertim heval û hogirên min ez pal didam bona ko ez berhemên xwe di rojname û kovarên erebî de belav bikim. Min li destpêkê guh nedida wan, ji ber ko helbesta min her çend e bi zimanê erebî bû lê wêneyên wê ji Kurdistanê û ji nav miletê min bûn û min dizanî ew tiştê weha naweşînin û eger ew biweşînin jî dê ji wê ruhê vala bikin. Lê wan dostan bawer nedikir û min jî ew çend carekan hinartin û ne hatine weşandin. Helbesta dawiyê, min ji kovareke erebî re birêkir. Mirov bo rastiyê bibêje wan helbest belav kir, lê peyva kurd jê anîne derê û li batî wê peyva ereb cih girtibû. Bi wî terzî şi'ir jî hate dagîr kirin.

Bêguman ez gelek têkçûm, ji berku peyva kurd ya di helbestê de pênasnameya wê helbesta min bû, çaxê wan kurd jê havêtî û ereb xistiye cihê wê, êdî ne ji dûr û ne ji nêzîk jan û ah û vîxanên xurtê kurd ji helbestê ne dihatin. Ya ji hemûyan jî êşdartir ew bû ko navê min bi wê helbestê re hatibû weşandin. Lê belê baş bû çi kesekî ji dost û hevalan qala wê nekir. Xuya bû wan ew nexwendibû. Min jî xwe bi ser hindê ve nebir ko ew helbest hatiye weşandin. Her çende min pir hez dikir ko qala wê tadariyê bikim û redaksyona kovarê rû reş bikim, lê ma kî dê ji min bawer bike, da weko tifa ser evraz be û her da bi nav çavên min bi xwe bikeve ve.

Min, piştî hîngê bi demekê kurt, dev ji nivêjan jî berda û ez ji dînî dûrketim. Lê bawerî bi Xwedê, bi hebûna hêza qenc û baş li hember zulmê û xerabkaran li vê cîhanê, di hundurê min de ma cihgirtî. Dibe jî ew dûrketina min ji misilmantiyê vedigere ser hindê ko bi dîtina min ya hîngê, misilmantî û erebtî dibûn du rûyên yek pereyî, du êdyemên bi hevudu ve girêdayî, ji asinekî û timamkerên hevudu ne. Û di encamê de, di xizmeta ereban û bi hêzxistina wan bi tenê de ne.

Her çende min ew jî baş dizanî ko misilmanên rastîn jî hene ko ji dil misilmantiya xwe ya girêdayî Xudê birêve dibin; mirovine temaşayî misilmantiyê dikin weko rê ji bona xwenêzîkkirinê ji Xudê û bi wî awayî Xwedê diperêsin. Ev tiştekê pir rewa ye û mirovên ji wî rengî di nav hemû ayînan de; mîna fele û cuhî ûhd..hene û ew cihê rêzdariyê ne. Ji berku armanca wan ne polotîke û tevlihevkirina dînî bi siyasetê ye, lê mebesta wan, li gor baweriya wan, xwe parastin e ji xerabî û çewtiyan bi rêya bêtir xwenêzîkkirinê ji Xwedê. Kesên weha ko hurmata ayînê xwe û xwe bi xwe digirin, divêt her mirovek jî, heta eger dûrî ayîntiyê jî be, hurmeta wan û bawerî û dîtinên wan yên ne fundamentalîst bigire.

Lê, li ciyê daxê ye, ko her ji kevin, grupine din jî hene ko ayînî ji rêya wî derdixin. Nemaze destekên siyasî yên nifişperês û xwedî berjewendiyên


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

politîk û desthilatdarên hukumdar ko hewil didin oldariya paqij, peywendiya ruhî ya di navbera mirovî û Xudê de biguhorin û bêxin di rûgeheka din de. Bi awayekê din û li berçavtir, ew dixwazin ayînî ji bo pirsên neteweyî û politîk bikarbînin. Yan aşkiratir, ew misilmantî û neteweya mezin di ramanên xwe de, bi hevcot û timamkerên yekudu dibînin. Mîna di Iraqê de îslam û ereb, di praktîka rojane de bûne yek û li gor vê û bi dîtina desthilardaran, ereb misilman e û misilman jî ereb e. Xwe, di rastiyê de, bi vî terzî ereb û faris û tirk bûn xwedî dewlet. Û neteweyine din jî mîna kurdan ko ji dil misilmantî dikir û bi rastî biratiya erebmisilman û farismisilman û tirkmisilmanan dikir û xwe bi hemû ve xistibû ber xizmeta misilmantiyê, man bê dewleta xwe ya neteweyî. Bi welatê xwe ve man li bin sitem û dagîrkirina tirk û faris û erebên misilman de.

Min, carna digote xwe »lo, hema eger Quran bikiraya kurdî, baştir dibû û mirovê kurdîziman ew fêhim dikir û dikarî bi zimanê xwe, ne ko bi zimanekê biyanî, Xwedê xwe biperêse«.

Hindî babê min bû, ew sofî bû, mirovekê pir bi misilmantiyê û Xudê ve girêdayî bû. Nexwendewar bû û ji erebiyê jî bêcgeyî çend wuşeyekan çi ne dizanî. Tiştê ji gişan jî balkêştir ew bû, ko wî xwendin û nivîsandin bi yekcarî ne dizanî, lê Quran dixwend û bê çewtî û heziqîn dixwend. Û piştî çendîn salên xwendina wî bo Quranê, wî ew ezber kiribû. Eger pirsyar jî jê bihataya kirin ka ew xwendin ji bo çi ye eger mirov tênegehe? Ka ew rist û dêr çi dibêjin? Ka Xudê di wan hevok û ayet û sûretan de çi şîretan li beniyê xwe dike? Li hember pirsyarên weha ew pir ne rehet dibû.

— Pêwîst nake mirov têbigehe, lê ya giring ew e mirov kitêba pîroz ya Xudê bixwîne, babê min dixwest weha hem bêgaviya xwe binixêve û hem jî me qayil bike.

Xwe pirsa wergerandina Quranê ji erebiyê bo ser kurdiyê yan her zimanekê din ne ya gotin û têkvedanê bû. Ne bes babê min lê piraniya misilmanan û bi taybetî yên ereb, wergerandina Quranê bo ser zimanekê din bi karekê ne rewa û bi derkeftin ji rêya Xudê dizanî. Bi gotina şêx û mela û zanayên ola misilmanan, Quran bi zimanê erebî ji ba Xwedê hatiye xwarê û diyar e Xudê ew ziman hejî hindê dîtiye lewma jî divêt ew bi wî zimanî be û her kes û her nifşemilet wê bi wî zimanî wê bixwînin.

Li gor dîtina wan, divêt peywendî, her bi zimanê Quranê bi xwe, ko erebiy e, bi Xudê re bêne kirin. Bêguman ev çêtirîn şêweyê xwezalkirinê ye bi ser yên din de.

Ez vî babetî bêtir têkve nadim, ew jî ji tirsa ne ko kesek bi çewtî min û van axiftinên min fêhim bike. Lê mixabin ko kesine weha ko xelet mirovî fêhim bikin yan hema ew bi xwe, xwe xelet têbigehînin, di hemû deman de û li hemû cihan hene. Serî li we gêj nakim û we ji kakila axiftina xwe dûr naxim û we vedigerînim ve bo ser pirsa kerba min û reh û rûşalên wê. Ew kerb û kîna niha girtina min jî aniye bîra min.

Ez, hîngê xwendinkarê sala duwemîn ya xwendingeha amadeyî li Mûsilê bûm. Ez, rojekê di kilasê de bûm, dema dergeh bê qutan hatiye vekirin. Rêveberê xwendingehê ko endamê rêberiya »hizba Be'is« bû li Mûsilê, hate jor. Çavên wî weko gurekê birsî di nav xwendinkarên kilasê de li pey yekî digeriyan.

Çaxê çavên wî gihane ser min, rawestiyan, her weko ew bi ser nêçîra xwe hilbû. Ez, bê derew, pir tirsiyam û hema min hind dît rêveberî û bê destûr xwestinê ji mamosteyê kilasê bangî min kir. Ez jî, hêbetî, tirs di lingan de pêçayî, ji cihê xwe rabûm û ber bi derî çûm. Çavên xwendinkaran û mamosteyî bi min ve bûn, her weçku wan bi çavên xwe digote min ''haya te ji te hebe!''

Katê ez gehiştime derve, dibînim ko li derve, ji rêveberî wêvetir çiwar zebelehên zilaman, mîna dergehvanên dozexê, li benda min in. Bê hîç axiftin û bi enî girêyî ber bi min ve hatin. Duwan ji wan rahişte herdu çingilên min û ez raheşandime di hundurê landkrozera xwe ya sipî de.

Di wan gavande, qute quta dilê min bêtir lê hat. Di nava min de hizrên cur bi cur vecemyane ser hev, pirsyar û bersiv hevrûşî hevudu bûn. Laşê min dilerizî û xuhekê ez berdidam bona yeka din min bigire.

Hindî hatime xwe ko bizanim ka çima wan ez girtime û ka ji ber çi ez wisa ditirsim, lê min nikarî bersivê bizanim. Xwe, hema ruxsar û navçavên wan yên ko agir jê diçû û reftar û kiryarên wan bes bûn bona ko mirovî bêxin di teqeleq û tirsê de.

Ez, di avahiyê polîsê asayişê »emnê« de li Mûsilê, xistime ber paşvebirin û qutan û şeq û zilleh û lêdaneka êşdar. Û wan pirsyarên bê hejmar, her weçku min gunehkariyeka mezin kiribe, havêtine ber min. Li bîra min e pirsyara wan ya yekem ko bi gef û gur ji min kirî:

— Tu dixwazî ko zimanê kurdî di xwendingehan de bibe zimanê xwendinê? Barzanî neşiya wê bike evca tu!? De ka bêje ka tu bi kîj rêxistina kurdî re kar dikî û ka serkêşê we kî ye û ew serên we bi çi pir dikin?

Min xwest wan têbigehînim ko zimanê kurdî weko zimanê xwendinê di pilana xwendingehê bi xwe de ye û ew ne tiştekê rast e tuhmeteka we-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ha bêxine ser min. Ew bi xwe di rastiyê de jî weha bû; waneya kurdî di pilana xwendinê ya xwendingehê de bû, lê ew di praktîkê de nebû.

Gelek ji xwendinkarên xwendingeha me kurd bûn û me mamosteyê zimanê kurdî jî hebû lê dersa kurdî nedihate dan. Xwendinkarên kurd hez ji dersa kurdî dikir lê wan bisteh ne dikir xwe bi hindê bînin derê û wê daxwaza xwe bînin ziman. Mamosteyê kurdiyê jî ko kurd bû, Xudê jê razî, tirsinokekê ji qam derketî bû.

Xwendinkarên kurd her digot ka da em tiştekî ji bo vê dersê bikin. Evca rojekê min û bi amadebûna giş xwendinkarên kurd di klasê de, ji wan xwest ko bi min re bihên cem rêveberî, bona ko em tev bi hev re wê daxwaza xwe sebaret bi zimanê kurdî bêxin ber wî. Lê mixabin, katê min navê rêveberî û çûnê bo nik wî anî, birader di cih de xav û sist bûn û ketin ber mihanegirtinê. Hin bê deng man û hinan jî got: ma qey çewtî di hindê de ye ka ew ders dibe yan nabe? Heke me gelek zimanê xwe bivêt em dikarin xwe li mal jî hîn bikin û pêwîstiya me bi vê serêşî û sergêjiyê nîne.

Min çend hewil da wan qayil bikim ko her çend e em kurdîziman in jî lê her kesek nikare xwe li malê hînî rênivîs û gramatîk û zimanê edebî yê kurdî bike. Ji bilî wê jî xwendinkar di dersa kurdî de kultur û edeb û dîroka xwe nas dike, lê têgihandina wan di rewşa wî wextî de pir dijwar bû.

Tirsê û bê hêvîbûnê ew dagîr kiribûn. Daxwaza min ew bû ko zimanê kurdî jî mîna zimanê erebî buha û rêzdariya xwe di xwendingehê de hebe. Lê, hemû ji qesta û bê hode bû û axiftinên min bi avê de çûn. Tiştê ko bi başî hatiye kirin; gotinên min peyv bi peyv gehiştin guhên sîxurên be'isiyan.

Bes, ma hema wan pê zanî! Ma qey gotineka berûvajî rastiyê û xerab ji devê min derkeftiye! Axiftina min ji çarçûveya pilana xwendingehê û yasaya dewletê dernekeftibû. Xwe, ne min dersa kurdî xistibû di pilana xwendingehê û klasa me de û ne jî min mamosteyek jê re destnîşan kiribû. Ez zêdetir serî li we gêj nakim, kurt û kurmanc, ez heft heyvan mam di navbera emna Mûsilê û emna Bexdayê de girtî.

Sal sala 1975-ê bû. Iraqê û Îranê li Cezayirê peymana 6ê adarê mor kiribû. Bi wê peymanê serhildana kurd ya çekdar li başûrê Kurdistanê hate hilweşandin.

Hoye, eger hevsarê me di destê me de nebe; Îrana ko em gerimkirîn, sinûrên xwe ji me re vekirîn, çekên giran xistine ber dest û xizmeta me, mebesta wê ji wê çendê bes bi me tirsandina Iraqê bû. Di rastiyê de em

leyistika wan bûn û îhtiyaca kenkeneyên cîhanê, dewletên mezin bi me, weko kiyan, tunebû.

Mîna ko Îranê xwestî, li dûmahiyê Iraqê hewara xwe bire cem wê û xwe muhtacî wê kir. Û weha çêbû; Iraqê ji Îranê xwest êdî arîkariya kurdan neke. Îranê jî gotê baş e lê mercên min jî hene. Bi wî awayî herdu dijminên sersextên hevûdu, ji bo berjewendiyên xwe û ji bo lêdana kurdan heta eger bo wextekê kurt be jî bûn dostên hev. Îran jî gehişte miraza xwe û hinek girav û ava kendawî kete destên wê.

Belê, serhildana kurdan setimî û desthilatdarên Iraqê ketin dest têwerdanê di Kurdistanê û di jiyana xwecihên wê de. Wê leşkerê xwe, cebilxaneya xwe ya sivik û giran tereberayî seranserî Kurdistanê kirin. Wê çi qulaç jî nehiştin xwe ne gihandinê.

Wan, bi hezaran kesên ko bi ektîvî kar di raperîn û têkoşînê de kirîn derbiderî başûrê Iraqê kirin, hin jî girtin û hin jî kuştin. Welatê me bi xwecihên wî ve xiste bin kontroleka rojane ya dijwar de.

Wan bi wê jî bes nekir û xuya bû ko karê wan pilanekirî û programkirî bû. Her ji destpêka hatina wan bo ser hukmê Iraqê pilaneka dirêjxayen ya wan bo jinavbirina miletê kurd hebû. Ew berahîk bû û li pey wê ax û oxên dijwar, wêrankirina Kurdistanê, valakirina wê ji kurdan û xwecihên din yên wê û erebkirina wê hatin.

Min qala girtina xwe ji were dikir; wan, piştî lêdan û êşandinê û piştî ko ez kirime nîvmirov û çi axiftin ji min çênekirîn, bera min da.

Xwe, we rastî bivêt, berî zîndankirinê, min ne ji dûr û ne ji nêzîk çi peywendî bi siyasetê ve nebû. Mebesta min, ez ne girêdayî çi rêxistineka siyasî yan karekê siyasî bûm. Her çend e di rastiyê de xebata mirovê kurd û miletê kurd ya rojane li dijî sitem û dagîrkirinê û bizav bo bi destveanîna azadiyên mirovî û neteweyî bi xwe dibe pirseka siyasî.

Xwe pêdiviye siyaset û siyasetmedarî berî her tiştekî, di xizmeta mirovî û miletî de be. Lê dibe jî ko ew, bes berjewendiyên grupekê yan texekê yan destekekê û çend kesekan bi tenê biparêzin.

Berî ko min berbidin, wan ez neçarkirim ko kaxezeka pirkirî mor bikim. Ev, di kaxezê de nivîsandibû: ”Ez Şêroyê kurê Bayezîdî biryara Encûmena Serkirdayetiya Şoreşê li ser xwe qebûl dikim û eger hat û xuyabû ko min peywendî bi partiyeka din ji bilî partiya Be’is heye, ez wê gavê bi wê sizayê qayilim«. Li gor wê yasayê, heke ez yê xelet nebim ez dibêjim hejmara wê 115 bû, kesê ko wê kaxezê mor bike û bête zanîn ko di partiyekê de ji bilî partiya Be’is de kar dike, dê sizayê wî bê mehke-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mekirin xendiqandin be.

Piştî ko ez hatime berdan, êdî xwendingehê ez wernegirtim. Mihaneya wan jî ew bû ko ez ji xwendinê veqetiyame û beşdarî taqîkirinên sala derbasbûyî ne bûme û di destpêka sala nû ya xwendinê de amade nebûm û dereng hatim. Ji bilî wan herdu bihaneyan, wan ez bi casûsê Îsraîlî û cuhiyan li qelem dam.

De were lo, wisa bi hêsanî, ez yê ko ne Îsraîl û ne jî cuhîyek bi tenê jî di hemû jiyê xwe de bi çavên xwe dîtî, kirim casûs û sîxurê wan. Belê, ew, weha bi hêsanî, dikarin navê her kesekî bilewitînin û bi kesekê nebaş û xwefiroş û paşvero bidin zanîn.

Di Rojhilata Navîn de û bi taybetî di welatên ereb û misilman de, sîstemên hilsengandina tiştan û bûyer û mirovan, ne weko sîstemên hilsengandinê ne li cem miletên din yên cîhanê. Sîstemê niha her yê berê ye; çawa hukumet û tevgerên siyasî û dînî yên ereb û welatên misilman û hukumetên wan û dezgehên ragehandinên wan berî çendîn salan ew hevîrkirine, her nuke jî weko xwe ye û çi ya wesa jê ne hatiye guhertin.

Weku mînak, çaxê desthilatdarên van welatan kesek yan grupek nevêt û bixwazin wan di civakên xwe de îzole û veder bikin û paşî wan jinav bibin, dê tuhmeta xwefiroşî û siyonizm û casûstiya Îsraîl û împeryalîzmê pêvenin. Bi wî awayî rêya jinavbirina kes û grupên weha li ber wan pir asan dibe, ji ber ko piştî propagendeyeka weha, dê piraniya civakên wan bêjin ko ew kes Xudênenas e, çimkî xizmeta cuhiyan û Îsraîlê û împeryalîzmê dike.

Di sîstemekê weha yê hilsengandinê de, ko di çendîn salan de hatiye durustkirin û ji ber dîwarên li dormandorî civakê çêkirîn, çav û mejiyê xelkî dûrtir naçe. Di egera sîstemekê weha yê hilsengandinê de rayeka giştî çêdibe, guhertina wê ne hêsan e û di piraniya caran de, mixabin, hêz berê wê, her çend e ber wext jî be, diguherîne.

Xwe dewlet ne dewleta yasa û dadgehan e ko mirov bikaribe bi rêya dadgeh û dezgehên ragehandinê berevaniyê ji xwe û mafên xwe yên mirovtiyê bike. Evca sed hezar rehmet li wî kesî bin yê ko dibe tîrarmanca wan û dilreşiya wan.

Di pîvana desthilatdarên Iraqê de, ew kes bi tenê pêşvero ye yê ko be'isî be yan bawerî bi ideolojî û bîr û bawerên wan hebe û bi çi rengekî li hember wan û gotin û kirinên wan raneweste. Li cem van azadiya bîr û bawеran jî heye, lê azadî di navbera du alternatîvan bi tenê de; yan be'isîtî û serçemandin bo wan yan jî jinavçûn û neman.

Ev jî azadiyeka taybetî ye ji devera me ya Rojhilata Navîn re. Ev modêla azadiyê, di welatên devera me û hemû cîhana paşkeftî de, pir caran û bi mişehî û berfirehî tê dîtin. Ev, li cem deshilatdaran û bi taybetî yên cem me, tiştekê pir normal û rewa û di ciyê xwe de ye. Manê gez û meqes di destên wan de nin û ew çilo dixwazin wilo dikin. Kurt û kurmanc ez ji xwendinê hatim bê par kirin.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 7 –

Xuya ye bes tiştine xembar û dilêş tên bîra min; li vir girtîgeha emna giştî ya Bexdayê tê bîra min. Roja min ya yekemîn bû di girtîgehê de, ko girtiyan zanî ez kurd im, ji nav wan, yekser, yek rabû û ber bi min ve hat. Zilamekê reşesmer, bejin dirêj û teşimkeka tarî li ber çavan. Wî bi xêrhatin li min kir û xwe weha da niyasîn:

— Ez Îbrahîm Ebdulxaliq im

Girtîgeh ji korîdoreka dirêj ya gelek teng pêk dihat. Çend odeyek tê de bûn, lê deriyên wan her tim daxistî bûn. Di wan mezelan de kesine ko ew naxwazin bi çi kesekî re bipeyivin û li cem wan mirovine xeter in bi tenhayî tên îzolekirin. Bi kutekî, di wî korîdorê firehiya wî nîv metir de, cihê girtiyan bi rûniştin û nîv razanê di herdu aliyan de dibû. Kes ji me ne diwêriya bi yê din re biaxive. Kit û mat jî hebûn ko ji derketina xwe bê hêvî bûbûn, evca wan guhdariya yasa û rêdarên girtîgehê ne dikir û danustandinên xwe bi hevudu re didomandin û qala her tiştekî bi girtiyên din re dikir.

Her roj piştî seet dehî şevê, girtî giş di cihên xwe de matmayî diman, guhên xwe vediçinîn; ka dê îşev navê kê bête vexwendin û dê gera kê û lêdan û îşkenceyê be. Ev jî, ji ber ko piraniya vekolîn û lêdanan pey seet neh û dehî şevê dest pê dikir û carna heta seet şeşî spêdeyê jî vedikêşa.

Seet nehî şevê bû, dema bo cara yekem ez ketime hundurê wê îşkencegehê.

Piştî derbasbûna çend deqîqeyekan û piştî ko wî nav li xwe nayî Îbrahîm Abdulxaliq, wî devê xwe anî ber guhê min û got:

— »Ez dizanim baweriya te bi min nayê û ew tiştekê normal e û belku jî baş e ko tu bawer ji min nakî, çunkî divêt mirov di girtîgehan de li ber devê xwe rabiweste û haya wî ji gotin û reftara xwe hebe. Lê , ez dixwazim şîretine li te bikim û pêwîst nake ko tu bersiva min yan komentarekê li ser bidî.

Dibe ko îşev yan şeveka din gera te û lêkolînê be. Dê te bi pirsyar û gotgotk û xweşxweşk û êşandinê pir mandî bikin. Mebesta wan ew e ko tu

zû hem bi laşê xwe ve û hem jî bi wûreyên xwe ve mandî bibî û ji hev bikevî. Ew jî, bona ko tu li gor dil û daxwaza wan bipeyivî û bikî. Ya giring ew e ko tu bawer ji wan nekî û rê nedî ko metodên wan te di serde bibin û wenekî ezmanê te bitehise wê çala ko ew te radikşîninê.

Weku nimûne; dê ji te re bêjin ”tu biaxivî yan neaxivî em rastiya te dizanin û eve daxuyanî û îtîrafên hevalên te li ser te, lê eger tu bi devê xwe daxuyaniyê li ser xwe û hevalên xwe bidî hîngê dê sizaya te kêmtir be û tu hew tê êşandin. Û eger tu amadebî ko bi me re kar bikî, hema em, her ji nuke çavên xwe li ser vê pirsê diniqînin û em bi başî, weko yekî ji xwe, çavê xwe didin te”. Dibe ko dengî ji kaxezan bînin û bibêjin te ”aha ev in daxuyaniyên hevalên te”. Tu bi xwe nikarî wan bibînî, ji ber ko çavên te dê bi pateyekî bêne girêdan û hema tu bibînî jî ma qey li cem wan pir zehmet e ko ew daxuyaniyan bi destên xwe û bi navên kesine din çêbikin!

Baş haydar be û guh nede derewên wan. Ez nizanim û naxwazim tu bibêjî jî ka te tiştek kiriye yan na, lê bi her hal, divêt tu bo tişt û daxwazên wan bibêjî na. Xwe li ber qutanê bigire, sist nebe û xwe di gotinên wan negehîne. Hema xwe bi rastî xişîm bike û xwe weko mirovekê gêl bîne pêş. Çi axiftinan li ser xwe nede û eger heta dawiyê, te xwe ragirt û tu li ber wan mukum û girtî mayî, bi aneha Xudê tu dê ji dest wan qurtal bî.«

Gotinên wî baş di guhên min de nediçûn xwarê, ji ber ko min bi çavê tirsê û gumantêbirinê li wî dinerî. Min gote xwe dibe ko ew yek be ji sîxurên ko bi wî awayî axiftinan ji girtiyan çêdikin, lewma min gotê:

— Xwe min çi nekirye ko bitirsim û ez fêm nakim ka çima tu şîreta li min dikî?

— Ji ber ko tu kurdî, wî got. Baweriya min jî gelek bi kurdan tê. Mêrxas in, çi cara serên xwe li ber zordaran ne çemandine. Ez, ji bilî vê, xwe li hember kurdan bi gunehkar dibînim. Min jî, di wextê xwe de, gelek tadarî li kurdan kiriye. Min ew di van girtîgeh û zîndanan de gelek azardane. Ez, niha, di rojên xwe yên dawiyê de, dixwazim bi her çi awayekî be barê gunehên xwe sivik bikim û wujdana xwe rehet bikim.

Ez ne peyivîm û ez di hindê jî ne digehiştim ka wî çawan di vê zîndana niha ew bi xwe tê de girtî, wextekî kesine wekî min êşandine. Ji min re bû mereq ko bizanim, lê wî pirsyara min ji devê min nebihîst, lê di hêbetbûna dêmê min de dît, lewra vêre çû û got:

— »Dibe ko tu niha ji xwe dipirsî ka ez van tiştan hemûyan ji kûderê dizainim û ka ez kî me yan durustir kî bûme. Te ya rast bivêt ez bi xwe jî yek bûm ji endazyarên vî sîstemê vekolîn û îşkencedanê.



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ez berî sala 1968-ê serokê şaneyeka serekî ya be'isiyan li Bexdayê bûm. Seddam Huseyn û Nazim Gizar du endam bûn di wê şaneya min de. Cirre û kêşmekêş û şeredevên min bi wan re bê dawî bûn.

Wan yek dîtin hebû û ne diguhert, dîtina wan jî ew bû ko pêngava yekemîn di siyaset û şoreşeka durust de, sexmeratî welatekê avatir û xweştir û komelekê bextiyar û pêşkeftîtir, ew e ko milet hemû bibe be'isî û yê be'isî nevên û bawerî bi be'isiyan nebe û be'isî nebe divêt ser lê bête pelixandin. Eve hizra wan bû, di wê demê de ko hê em nehatibûn ser hukmî. Û di wî çaxî de, ji bona ko em desthilatdariya Iraqê bêxin di destên xwe de, pêwîstiya me pir bi hevkariyê bi opozisyona li dijî hukumetê hebû.

Wan herduyan pir hez ji şera û lêdan û kuştinan dikir û bi dîtina wan hêz hemû probleman çareser dike. Tiştê ko hîngê bala min kişandî ser xwe, mijûlbûna Seddamî bû bi xwendina pirtûkên polîsî û yên şer û casûsiyê digel yên qanûnî. Wî, weha, hezkirina xwe bo bikaranîna hêzê û bo jinavbirina hevrikên xwe, bi wan pirtûkan têr dikir. Her wisa jî şehrezahiya xwe di wî warî de pêşde dibir.

Ez dibêjim yên qanûnê jî bi mebestekê dixwendin; ka ew çawan qanûnê, bi xwe, bixapîne û ka çawa çi şop û şûndestan li pey kiryarên xwe nehêle, bona ko qanûn nikaribe wî zebit bike.

Dirêj nakim, ez, her di destpêkê de, rêveberê komîteya yekemîn ya vekolînan ya ser bi partiya Beis bûm. Min jî, bi wî rengî, para xwe di avakirina vî dar û destê niha yê vî dezgehê êşnadin û terorkirinê de hebû.

Bêguman li ber te ne zelal e ka ez niha li vir çi dikim. Evê jî çîroka xwe heye û kurtiya wê ev e: »Piştî hatina me be'isiyan bo ser hukmî li Iraqê.«

Peyva be'isiyan bi rengekê weha got, jê xuyadibû ko ew hêşta şanaziyê bi hindê dike ko endamekê wê partiyê bû û min hest bi xwe kir ko min kerb ji wî hilgirt, çaxê wî ji min re diyar kirî ko ew jî yek bû ji zebaniyên îşkencedanê. Ew li ber dilê min pir giran bû û xwestika min ya wê gavê ew bû ko ew devê xwe bigire û xwe ji min bide paş. Lê wî qet xwe di hindê de nedigehand û dom da axiftina xwe:

"Her ji destpêkê, Seddamê çeqokêş xwe di partiyê de kire zepzepek û serkirdayetî hemû bi şexsiyeta xwe ya vala û ya req tirsand û dest pê kir partî ji rêya wê ya destnîşankirî derxist. Wî, ew li gor dilê xwe birêvebir.

Ez li dijî piraniya dîtin û lênerîn û kiryarên wî rawestiyam. Lê Seddam ne di xema hindê de bû û guhên wî li ber axiftin û dîtin û pêşniyarên me hemûyan girtî bûn. Zimanê wî hêz bû û qîmet nedida çi kesekî û xwe bi

xelaskerê ereban da niyasîn. Kesê ko rexneyek li wî girtiba û li dijî wî rawestaba, da hema hind hête zanîn ko ew kes hatiye kuştin. Me dizanî ko Seddam e yê ko wan dikuje, lê çi kesekî guh nedida me û ne dixwestin wê ji me bawer bikin. Piranî ditirsiya û xwe diparast.

Min û çend kesekan û bona ko rêyê li ber wî û wê siyaset û harbûn û serxweriya wî bigirin, grupek li dijî wî di hizbê de çêkir. Ez serokê wê grupê bûm û li dawiyê me xwe bi be'isiyên Suriyê ve girêda, bona ko arîkariya me bikin û her weha baweriya me ew bû ko divêt partî yek be; qiyadeya neteweyî yek be û qiyadeya dewletê cuda be. Seddamî bi me zanî û bi wî rengî dijminatiya di navbera me de dijwartir lê hat. Polîsên xwe yên taybetî xistibûn pey min û wan gav bi gav dizanî ka ez çi dikim û wî dixwest belgeyekê li dijî min bi dest xwe bixe bona ko pê bikaribe min li atafekî bide.

Ez spêdeyeka havîna 1974-ê li çayxaneya Elreşîd rûniştibûm û çayek li ber min bû, min ew vedixwar. Lîsteya navên endamên rêveberiya rêxistina me jî di dest min de bû, min lê dinerî û li benda hevalekî jî bûm ko bêt û wê lîsteyê bi xwe re bibe Sûriyê. Di wan navbeynan de, ji aliyê din yê cadeyê, du efserên ko min nas dikirin xuyabûn û çaxê çavên wan bi min keftîn, wan pêyên xwe siviktir lêkirin û ber bi min ve hatin.

Min yekser zanî ko Seddamî ew şandine û xuyabû ko wî bi lîsteyê zanîbû. Loma min, her zû û hê ew negehiştîn cem min, lîste kire balolkeka biçûk û havête di hundurê devê xwe de û min ça bi ser de kir û qurçek li gewriya xwe da û balolk palda xwarê. Herdu efser gehiştin ba min û bê silavkirin ji min pirsîn:

— Ka lîsteya rêxistina we ya ko tu dê îro hinêrî Sûriyê? û wan got min ko ew kesê da lîsteyê be, bi xwe agahdarî daye Seddamî.

Min jî gote wan:

— Fermûn eve ew di zikê min de ye û min weha baş vecûye heta eger ez niha birîm jî, çi ya weha jê namîne ko hûn wecekê jê bibînin.

Lê xuya bû biryar hatibû standin, lewma wan dest dan çingilên min û her di eynî gavê de yekî ji wan destê xwe li ototmobîlekê, ko li benda fermana wan bû hijand û ez kirime tê de û ez bi wî rengî hatime girtin.

Evca ez yê ko karê wî vekolîn û îşkencedana girtiyan bû, ketim ber vekolîn û bin lêdan û azardanê. Qet di hizra min de nebû ko ez rojekê bibim girtiyê vê girtîgehê.«

Teşimka xwe ya reş ji ber çavên xwe hilanî û destê xwe yê rastê danî ser çavê xwe yê rastê yê fetisî û got:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— »Ev çavê min, di çaxê îşkenceyê de, hate korekirin. Ez bi pankeka bersîvandeyan ve hilawîstibûm, dest û pêyên min bi pankeyê ve girêdayî û berê naccavên min û sînga min ber bi jêr. Panke hilkir û wê ez bi hêz dizivirandim û ji nişîv jî ve qamçiyên wan bi dijwarê bi laşê min yê tazî diketin. Gelek caran dirbên wan ev çavê min yê rastê hingaft û ew li min fetisand.

Eger bi gotina Seddamî bûya, diviyabûya wan, ez derhal kuştibama. Lê Ahmed Hesen el-Bekir li dijî kuştina min bû. Ew jî vedigere bo dapîra min ko dayîna zarokên el-Bekrî bû. Ew di mala el-Bekrî de bû û sexbêriya zarokên wî dikir. Evca maytêkirinên dapîra min û paşî yên el-Bekrî wenekir ko ez bême xendiqandin. Lê, di derheqa min de sizaya bîst salan zîndankirin hate dan.

Lê weko min gotî, Seddam ji ya xwe nayê xwarê û ji wî rikotir nebûne. Kela wî bi wê sizayê ne rişt û di zîndana Ebû Xerîb de li ber digeriya bo ko bihaneyan li min hilbêxe bona ko min pê bide kuştin. Wî digote Hesen el-Bekrî û hevalên din ko ez, şikra min, ji Ebu Xerîb bi xwe jî, peywendiyan bi Sûryê dikim û ji zîndanê name û lîsteyan ji wan re dişînim. Wan, elek caran di zîndanê de, bi rêya duktorê didanan, hewildan min jehrî bikin, lê ser negirt. Ez, her ji ber hindê jî niha li vir im û ez di wê bawerê de me ko ez êdî hew bi saxî ji vêderê derdikevim.«

Di çaxê ko ew dipeyivî, min çavên xwe li ser wan dêmên şikestin tê de xuya û li ser laşên azardayî û bê hêz û telaşbûyî wê korîdorê digerandin û hate bîra min gotineka pêşînanan ko dibêje: »Yê telhekê li ber birayê xwe vene dê her ew bi xwe kevitê«. Ev yek ji wan ejdeharên ko mirovên weko min, bê guneh, di girtîgehên xwe de dihincinîn, îro ew bi xwe girtî ye û ew bi serî tê ya ko wî bi serê hinekan dianî.

Her wê şevê, seet deh û bîst, navê min hate bang kirin. Celbiyan berî her tiştekî destên min ji pişt ve û çavên min girtin. Paşî min hind dît pehînek li pişta min keft û ez tîw tîw rahavêjtim. Min ne dizanî ka min ber bi kûderê dibin. Wan celbiyan, di rêya birinê de henekine çivêl bi min dikirin û ez kiribûme pêtrankê xwe.

Dirêj nakim, lê bi rastî vekolîn, her wekî wî Îbrahîmî gotî, bi min hate kirin. Min weha hest pê dikir ko ew bi xwe ye min diêşîne û bi pêyên xwe yên bi gemar diçe ser laşê min û min ji xwe re dike gok û pê dileyize. Wan geh bi zilleh û şeq û pehîn û pencere û pankê û geh jî bi xoşxoşk û awayê diserdabirinê, ez azardidam. Daxwaza wan ew bû ko peyva erê ji devê min derbikeve, yan jî ez ,bi hijandineka serê xwe, gotinên wan erê bikim.

Lê ruh şirîn e û hindî ji dest mirovî têt mirov li ber xwe dide ko ji mirinê qurtal bibe û xwe tûşî wê neke. Lewma, ewende wan bi min re hovetir û dirundetir reftar dikir ewende ez bi hêztir dibûm û kerba min li hember wan û wan reftarên wan mezintir dibû.

Belê, ez li ser dersa zimanê kurdî, heft heyvan di wê îşkencegehê de mam. Piştî ko wan hemû nifşên êşandinên xwe yên kevin û nûjen li ser min û laşê min bikaranîn û piştî ko wan ez baş li zirkê dayîm, wan ez berdam. Ez, ji wê hovexana wan, derkeftim mirovekê din; dizane ko kabûsekê kujek li ser sîngê xelkê welatê wî rûdine û xwîna wan dimêje.

Piştî ez derkeftim, min ji nû buhayê azadiyê û azadî bi xwe nas kir. Min zanî ka xebat ji bo azadiya her miroveki çend giring e. Belê, min ji nû baş fêhim kir ka ew çima mirov û miletên bindest û perîşan xebatê ji bo azadî û serxwebûna xwe dikin.

Di wê zîndanê de gelek kurd jî hebûn. Zimanê axiftina me jî bi hevudu re çav û dêmên me yên xemgîn û kesîre bûn. Ji nav wan kurdan yê ko bala min bêtir ber bi xwe ve kişandî kesanek bû bi navê Ezîzê Siloyî. Ew jî ji devera me bû.

Roja min ya sêyê bû di wê zîndanê de, dema spêdeya wê rojê piyawekê pir bi xwe ve, bejin dirêj, navçav sipî, çavşîn û xudan porekê reşêvebûyî bersinga min girtî û bi çavên xwe yên boq hêvkire min û got:

— Tu kurdî, mane? wekî kesekê bawernekirî, pirsyara xwe kir.

— Belê, we ye, min welama wî da.

Hêj wûşeya belê we ye bi timamî ji devê min dernekeftî, wî xwe bi şewqeka pir bi hêz di min werkir. Ez weko kesekê pir nas û nêzîkî xwe ko demeka dirêj e nedîtiye himbêz kirim. Wî, ez du sê carekan ji rûçikan ve maç kirim. Hema her ji wê gavê ew mirov kete dilê min û wan çend peyvên wî yên kurdî dilê min pir şa kir. Her weçku wê gavê hemû gelê Kurdistanê li hawara min hatî. Bê tirs diaxift û çavên wî bi rengekê namo ji min venedibûn, her weko ne dixwest min ji dest xwe bide.

— Hema mirovê kurd ji dûrve yê diyar e, wî got. Dêm û navçavên te yên kurda nin. Bêhna welatî ji te tê.

Paşî, min her ji wî Îbrahîmî zanî ko Ezîzê Siloyî çend heyvek in di zîndanê de ye. Îşkencevan, wî her çend şevekan carekê dibin vekolînê û têxin ber amîrgeha xwe ya êşandinê.

Wî heta niha xwe li ber girtiye û nikaribûne çi axiftinan jê çêbikin, lê hiş di serî de nemaye û mîna teledînan lêhatiye. Wî Îbrahîmî digot ko ew li ser kirîn û firotina çekî hatiye girtin. Digot ko wî pey karesata 1975-ê



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

gelek çek kirîbû û nabêje ka wî çi li wî çekî kiriye û ka li kîderê veşartiye.

Rojekê Ezîzê Siloyî xwe nêzîkî min kir. Ew gelek lawaz bûbû û bi kut-tekî xwe li ser pêyan digirt. Kincên wî di ber de, bêguman ji ber îşkencedanê, peritî bûn. Wî pirsyara navê min ji min kir û ka ez ji kîj gundî me û kurê kê me. Wextê min bersiva wî dayî, derkeft ko wî babê min nas dikir û got ko ew, şikra babê min, miroverkê mêrxas û pirbaş bû û got ko ew, şikra xwe, gelek caran li gundî û li Mûsilê jî li cem me bûye mêhvan.

Diyarbû ko wî dixwest tiştekî bibêje, yan hema ya di nava wî de ketiye serêk vala bike û ez bi dest wî ketibûm, lewma ji nişkan ve got:

— Min neçar dikin ez kaxezekê mor bikim.

Min xwe di wî de didît lewma bê hizirkirin û bê tirs ez pê re, bi dengekî pir nizim, di bin lêvan re peyivîm:

— Tu dê îmza bikî?

— Duhî, her weko dixwest bîne bîra xwe ka duhî çi kiribû, duhî min mor kir.

— Çima te mor kir? min jê pirsî.

— Çi nemaye ko bi min re nekirî, dengê wî pirî xem bû, wan zanî ger ew min bikujin jî ez çi nabêjim, lewra duhî ez dirêjî ser mêzekê kirim. Ronahiyeka geş xiste ser çavên min ko nikaribûm wana vebikim. weko her roj şirînqeyek li zendikeka min da. Xwe te ya rast bivêt, ez pir rehet dibim dema ew wan şirînqeyan li min didin. Nizanim çi piştî wê şirîn-qeyê qewimî. Ew bi xwe, ez, piştî wan şirînqeyan, pir kêfxweş dibim, şeper, çeng bi min ve çêdibin û ez di beheştekê de difirim. Nizanim ka ew ji wan şirînqeyan e yan jî xewn in. Lê min duhî dizanî tiştekê mîna qele-mekî di destê min yê rastê de raheşandiye û kesekî du sê caran ew destê min yê giran li ser tiştekî wekî kaxezê livand. Piştî hîngê min hind dît spêde ye û ez li vêderê, di nav girtiyan de me. Ez carna dibêjim xwe dibe ko ew hemû xewin bin û carna jî dikeve serê min ko rastî be.

We rast bivêt wê saloxdana mam Ezîzî ez di nav xwe de pir tirsandim. Min hêdî hiçkê wî yê destekê wî hilkişande silal, dibînim ko zendika wî pirî nîşanên weko kulan e û her weha zendika destê din jî. Diyarbû ko wan pir caran narkotîk xistine laşê wî û narkomanek jê çêkirine bona ko bi wî awayî axiftinan jê çêbikin.

Piştî ko min guhdariya serpêhatiya mam Ezîzî kir û laş û zendikên wî dîtin, bo min ronî bû ko desthilatdarên girtîgehê her tiştekê bixwazin, bi

serê girtiyan tînin û xwe ji çi nadine paş, ji ber ko destûr ji silal ji wan re hatiye dan.

Belê, ew cîhaneka taybetî ye û desthilatdarên girtîgehê û gotin û hezkirinên wan qanûn in û dînatî ye mirov li wir qala mafê mirovî û ji mirovî re hebûna advokatekî bike. Li wê derê yek kes hakim e; ew bi xwe dadgirê giştî ye, polîs e, îşkencevan e, advokat e û hemû ye, ew jî desthilatdarên girtîgehê ne. Ji min re xuya bû ko metodine din yên wan hene ko bikartînin; weko narkotîkê. Bi terzekê zêdeyî taqeta mirovî bi şirînqeyan didin girtiyan. Bi wî rengî girtiyan baş dişkênin û nizim dikin û bi narkotîkê ve girê didin. Piştî ko ew baş girtiyan ji axiftinan dadiqutin, wan ji nav dibin.

Ezîzê Siloyî li ser destên wan û bi wan metodên cur bi cur yên wan pir lawaz û bêserûber bûbû. Wî bê hezikirna xwe, bê viyan û îradeya xwe biryra nemana xwe mor kir.

— Ez bawer nakim êdî çavên min derveyî vê derê bibînin.

Piştî ko wî ev gotî heyamekê ma bê deng û li min nerî, weko kesekê berî ko tiştekê xeter bike û hizra xwe tê de dike ka bike yan na û ka çawan pêngavan pavêje, hêdî û li ser xwe got:

— »Guh bide min. Ez dê ya rast ji te re bêjim« devê xwe baş anî bin guhê min. »Ne min çek kiriye û ne jî firotiye. Lê li dema ko şoreş şikestî û pêşmerge neçarbûn xwe bidin dest Iraqê, hîngê min û hevaline pêşmerge, biryar da ko çekên xwe nexin destên hukumetê. Biryar ew bû ko em çekên xwe pêkve li devereka nepenî, nêzîkî sinûran biveşêrin. Ew jî ji bo hindê heke hat û em bêgav man û neçarbûn ko di rojekê ji rojan de berevaniyê ji xwe bikin, em wî çekî bi kar bînin.

Xwe tu dizanî hîngê wê heşameta pêşmergeyan ew çiyayên çekî danîn ber destên leşkerê Iraqê û me ne dixwest em jî weha bikin. Baweriya wan hevalan jî gelek bi min û birayê min dihat, lewma hemûyan çekên xwe danîn cem me, bona ko ez û birayê min wan li cihekê ne li ber çav biveşêrin. Û ew bi xwe çûn Duhokê bo ko xwe bidin dest hukumetê. Me jî ew çek di goristanekê de veşartin û paşî me jî weko piraniya pêşmergeyan berê xwe da ber bi jêr û hukumeta Iraqê, lê bê çek. Piştî çend rojekan, her hê em li Duhokê, ez û birayê min hatin girtin. Xuya bû yekî ji wan hevalan û bona ko xwe li ber hukumetê şirîn bike, îxbarî li ser me dabû. Hindî birayê min bû, ji min biçûktir bû û ya ji hemûyan jî xerabtir ew bû ko wî êşa dilî hebû. Dilê wî gelek diêşiya û carna bêhna wî pir teng dibû û pê dihate halê mirinê. Wî xwe pir li ber îşkenceya wan negirt


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û her di vê zîndanê de û dema em şevekê ji qutanê vegerandîn ve vê derê, êşa dilî li ser zalbû û bêhin lê maliq bû. Paşî bêhin bi yekcarî lê çik bû û êdî bêhna wî ne hat û ne çû û weha mir. Pergala min jî ev e ya ko tu min tê de dibînî.

Guh bidê! Min heta niha nihîniya xwe ji çi kesekî re aşkira ne kirye û min biryara xwe daye ko ez ji te re bêjim. Tu kesê yekemîn û paşînî ko dê guh li vê nihîniyê bibe û ji xwe re bo rojeka pêwîst bihêle. lê, şîreta min li te ew e ko ew çek bo çi xerabkarî û kuştinên navxwe neyên bikaranîn, ew çek bes bo berevanîkirinê ji xwe û welat û miletê me be li hember tadarî û destdirêjkariyên van mêtinkar û tuximperistan.«

Wî weha zû çîroka veşartina wan çekan ji min re vegêra, her weko ditirsiya di her navbeynekê de celbiyên wî bihên û wî bibin û paşî ew nihînî digel wî biçe û bin ax bibe. Wî qala goristanekê kir ko dikeve navbera gundên Bazê û Kanîmezinê û Çemseyda li devera Berwarî Bala. Got jî ko pênc gor li dormandorî mezintirîn darmaziyê hene û wan çek di wan pênc goran de şardiye.«

Li vê derê, Şêroyî nivîsandin qut kir û kete hizra wî çekî û aya ew çîroka mam Ezîzî jê re gotî rast e û eger rast be erê gelo hê ew dar maziya mezin ko nîşanek e bo biserhilbûnê bi ser wan goran de li cihê xwe ye û ne hatiye birîn.

Ya ko bala wî bêtir kişandî ser pirsa wî çekê veşartî saloxdanên şevê bûn yên ko wan karwançiyan yên ko ji nav Berwarî Bala dihatin, vegêrayîn. Wan axiftinan ew xiste di teq û leqê de. Wan digot ko leşker û emn û muxaberat û polîsên Iraqê bi dilê xwe ketine deverê û wan xelik pir perîşan kiriye. weko kurd dibêjin ”pişîk li mal nîne, navê mişkî şahîn e.”

Wan digot ko leşkerê hukumetê bi berdewamî gundan radike û şûnwarên wan jî nahêle, wan bi yekcarî û bi hemû ve jinav dibe. Digotin ko wan li ber e Kurdistanê ji kurdan û kêmneteweyên din vala bikin û ereban li şûna wan nîştecê bikin. Digotin li her gundekî hêj nerakirî, hukumetê li gor dilê xwe, kefxuyek ”muxtarek” xistiye ser difna gundiyan û divêt ew kwîxwe her roj spêdeyê zû biçe ”nahiyê” û hûr û girên li gundî qewimîne bigehîne guhên desthilatdarên hukumetê li wê derê.

Digotin xinizî li hemû cih û qujbin û qulaçên welatî, çi ji tirsê û ji bo parastina xwe û çi ji pêxemetî pere û mezintiyê pir mişe bûye. Ji aliyekî ve pêşmerge nemane û ji aliyê din ve xelik bê pişt û bê hêvî maye. Hukumetê jî ew nebûna pêşmergeyan bi delîveyekê pir baş, ji xwe re û ji

bo bicihanîna pilanên xwe dît û nexwest bi hêsanê ew derfet ji dest wê biçe. Bizava wê ya herî mezin ew bû cihê pêyên xwe di Kurdistanê de baş çê bike, xweş bike û bi hêz bixe.

Ji bilî Şêroyî, sê xurtên din jî, ji başûrê Kurdistanê li wê zomê bûn. Ew, pey şikestina şoreşa Eylûlê hatibûn wî aliyê welatî. Yek ji wan Segvan Mizûrî bû. Segvan, pêşmergeyekê mêrxas bû. Wî piştî setimîna serhildana çekdar xwe neda dest hukumeta Iraqê. Wî xwe di çiyayan de asê kir û wan dawiyan berêveyî wî aliyî bûbû û li wê zoma Şêro lê rûdinişt dima. Ew bi xwe miroveke pir livok û civok bû û hewyana wî bê xebat û lebat nedihat.

Gencê duwemîn, Bêwar Berwarî bû. Ew, di serkirdayetiya şoreşa Eylûlê de pêşmergeyekê ber bi çav bû. Ew jî, piştî nemana raperînê, ket pey serkêşiyê û berê pêyên xwe da Îranê. Lê, li wê derê, Savak û ordîgeh û perîşanbûneka din li benda wan bûn. Û ew, ji zordariya desthilatdarên Iraqê nereviya bû bona ko biçe bin barê zordariya Îranê, lewma jî nikaribû serî li ber daplosînerên nû biçemîne û hê du hefteyên wî li wir derbas nebûyîn, sinûr qetandin û vegeriya başûrê Kurdisatanê. Car bo car û ji bo bêhinvedanê diçû wan zozan û gundên bakûrê Kurdistanê.

Xurtê sêyem, Dildar Gulî bû. Babê Dildarî pêşmerge bû. Ew di şerê 1974-ê de, di eniya şerî de, di bersîngirtina êrişa hêzên çekdarên Îreaqê bo ser Kurdistanê de, hate kuştin. Bombeyeka balafirên Iraqê kete nêzîkî wî û ew jî kete ber teqîna wê. Dildarî pir hez ji babê xwe dikir û babê wî jî bes ew kurê xwe bi tenê hebû û wî hindî dinyayekê hez jê dikir. Dildarî li ser gorê babê xwe sûnd xwaribû ko çi cara xwe nede bin sîbera kujekên babê xwe û hindî jê bihêt, ji bo nehiştina rejîma Seddamê kurdkuj xebatê bike.

Her çend e kurdine din jî ji başûrê welatî li wir bûn, lê danûstandinên Şêroyî bêtir bi wan hersê kesan re hebûn. Lewma Şêroyî xwest wê dîtina ko li cem wî çêbûyî bi wan re munaqeşe bike. Dîtina wî jî ew bû; li dijî dijminekê sersext û dijwar û li dijî sitem û zordariya wî dijminî, pêwîstî bi berxwedanê heye. Berxwedan jî di rewşa îroyîn de bi awayekê xuya di bajaran de nayê kirin û ew jî ji ber dirundetiya hukumdarî ya bê qam û bê sinûr. Û ji ber wan sedeman, wî nûkirina berxwedana çekdar, ji bo rêgirtinê li ber zordarî û zordariya wî, bi tiştê herî giring, bi kêmanî di wê qonaxê de, didît.

Şêroyî ew lênerîn û baweriya xwe ji wan hevalan re diyar kir. Piştî bihîstina wan hevalan bo raya Şêroyî, Dildarî ev pirsyar jê kir:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Tu dibêjî em bikaribin tiştekî bikin? Ew Barzaniyê mezin, bi wê hemû kenkene û zîrekî û hêz û şiyan û şehrezahiya xwe neşiya vê hukumetê jinav bibe, evca tu bawer dikî ko em, ev çar kese bikaribin dest bi serhildaneka nû ya çekdar bikin?

— Xwe, dê her yek yan çend kes dest pê bikin, û çima em ew kes nebin? Şêroyî bi zimanê kesekê pir bawerî bi xwe heyî bersiv da. Mebesta min jî ne kêmkrine ji buhadariya Barzanî, nexêr, hindî ji dest wî hatî, wî li gor zanîn û pêçêbûnên xwe xizmeta miletê xwe û serxwebûna wî kiriye û ew di dîroka me de dê bi qomandarekê neteweyî û millî hête navlêkirin. Bes digel vê jî, divêt em jibîr nekin ko yê giring di pirsê de milet e û kesên weha weko Barzanî bê miletên xwe peyda nabin. Milet e, Barzanî û serok û rêberên mîna wî tîne pêş yan nizim dike. Milet jî namirin û hindî koletî û zordarî û dagîrkirin di welatê me de hebe dê berxwedan û raperîn û şoreş jî hebin.

— Şêro, birawo! Ez di zimanê fermesonan nagehim, evca ya di dilê xwe de bi zimanê me gundiyan bêje, Bawerî bi serxurandinê re ev got.

— Hûn, min çewt fêm nekin. Min ne li ber e, em çi partiyan çê bikin û daxwaza min ew nîne ko rojekê ji rojan bibime serkêş û mezinek, Şêroyî armanca xwe şirove kir. Mebesta min ew e em tiştekê weha bikin ko hukumet pê bitirse û bizanibe ko ev kiryarên wê dê bibin egera şoreşeka din û belkî bi wî awayî em bikaribin tuxîban ji zordariya wê re dabinin. Her wisa belkî xwefiroş û xinizkar bitirsin û dev ji wan karên xwe yên çepel berbidin. Û ji wan re xuya bibe ko kiryarên ji wî rengî bê sizaya miletî derbas nabin.

— Ew çi pêşmergetî ye em dê bê çek bikin? careka din Bêwarî gumana xwe bi ziman xist.

— Em, di dsetpêkê de, dê bi çeqokekê biçin telba serbazekî û dê tivenga wî ji xwe re hilgirin, Segvanî li batî Şêroyî bersiv da. Paşî em dê bi wê tivengê û çeqokine din serbazine din jî ji çek bikin û tivengên wan ji xwe re rabikin û weha leşkerê pêşmergeyan çê dibe û ew bi çek dikevin.

— Ya çekî, eger rast be û çi kesek berî me bi ser nehilbûye, ez dikarim bibêjim ko me têra xwe û bêtir jî heye, Şêroyî ev nihînî havêt ber guhên wan.

Wê nûçeya Şêroyî, ya ko ji nişkan ve bi ber guhên wan keftî, ew mendehoş kirin û dev li wan beş kirin û bi hêbetbûn wan ve li hevudu nihêrî. Şêroyî çîroka çekê di goristanê de vaşartî û Ezîzê Siloyî ji wan re vegêra. Ji wan re bû mereqeka mezin ko rastiya wî çekî bizanin. Wan her çwaran,

her wê rojê bi şev, du tevir û du mer bi dest xwe xistin û ber bi başûrê welatî, ber bi wê goristana çek tê de veşartî da rê.

## – 8 –

Katjimêr, dema gehiştîn bo nav goristanê, nêzîkî dwanzdeyî nîvro bûbû. Ew, di goristanê de, li wan pênc goran geriyan. Piştî bîstekê Dildar bi ser darekê hilbû ko di nîva goristanê de bû û bi pênc goran dormandor kirîbû. Ew rawestiya û piştî ko ji hejmartina gorên li rex û rûyên wê darê piştrastbûyî ko pênc in, wî bangî hevalên xwe kir û got:

— Heke ew çîrok rast be, ez dibêjim eve ew dar û ew gor, lê ya çekî qet nakeve serê min ko tê de be.

Her di wê gavê de, her sê biraderên din jî li cem wî amadebûn û Şêroyî tevrê di destê xwe de bilnd kir û got:

— Ma ev tevir û ev mer bo çi ne? Nê ew bo hindê ne ko em pê bizanin ka rast, di zikê van goran de çek heye yan na, û wî digel timamkirina axiftina xwe, tevrê xwe daweşande gorekî û dest bi kolanê kir.

— Ez bi xwe na kolim, Bêwarî biryara xwe xiste ber havalan. Pa heke derkeft direw û li şûna çekî û tivengan hestiyên miriyan ketin ber devên tevir û merên me?

— Hîngê, em dê axê radin ve ser qebran û ji bona ko em tivengan bi dest xwe bixin dê dest bi metoda min bikin, weha Segvanî rê li ber gumanên Bêwarî girt. Niha, werin da em dest bidin kolanê û bizanibin ka çend rastî di serpêhatiya Ezîzê Siloyî de ye.

— Lê divê haya me ji me hebe û kesek ji van gundan bi ser me hil nebe, heke dê fermana me rakin û dê pilana me jî ji bin biçe, Şêroyî xwest ko hevalan ageh ji xwe hebe. Lewma ez dibêjim ya çêtir ew e kesek ji me li hindav rêkê be û me li ser hatina her kesekî agadar bike û ez dibêjim bila Bêwar bi wî karî rabibe, xwe ew her gora na hilkole.

Hosa wan dest bi hilkolandina goran kir. Di destpêkê de axa req kete ber tevrên wan û paşî ya piloxe. Piştî çend deqîqeyekan Segvanî bi sersorman ve kir gazî:

— Kuro! her weçku tiştekê req di vî gorî de ye!

— Bêguman di her gorekî de tiştek heye, Dildarî got. Pa hestiyên miriyan li kîderê ne, eger ne di goran de bin?

Hersê keftin ber ji axê kişandina wî tiştê ko destpêkirî xuya dibe. Naylonekê stûr hate nav destên wan, lê neşiyan wî bi hemû ve û bi hêsanî ji gorî derbixin. Wan gor pîçeka din jî hilkoland û ax ji ser veda û wan hersiyan, bi hemû hêza xwe, ew naylon kişand û anî derê. Tiştine sengîn tê de bûn, vedikin, dibînin ko çek di hundurî de ne. Klaşînkof baş bi naylonî hatibûn werpêçan, bona ko ter û jengî nebin. Wan ji çavên xwe bawer nekir. Mereqa wan kete ser gorên din ka çi texlîta çekî tê de ye. Bi lez û bez û her wesa herçiwar gorên din jî hilkolan û çekên di wan de jî danîn ber xwe. Heft tivengên klaşînkof û tijî wê derê sacor û gulleyên wan û du arpîçî û çend gulleyên wan di wan pênc goran de bûn.

Şêroyî bangî Bêwarî kir û wan bi hev re biryara xwe da ko hemû çekî bi xwe re bibin û hêj nebûye spêde xwe bigehênin ser sinûran digel bakurê welatî. Û li wê derê û piştî ko baş bêhna xwe vedidin, li ser pilana kar û xebata xwe ya paşerojê rabiwestin.

Ew nêzîkî tuxîban bûbûn dema tîrêja tava berê spêdeyê taryatiya şevê dişikand û bera wê dida û germatiya xwe dida çiya û zozanan. Şêroyî çaydankê çayê tijî av kir, kuçkek çêkir û agir tê de hilkir û çaydankê xwe danî ser. Hersê hevalên din jî raketin û xwe berdan nav xewê. Şêroyî hinek ji tovê çayê berda nav wê ava di çaydankî de dikeliya û çaydank deyna rexekî, nêzêkî pelên sor bona ko ça bi dilê xwe dem bigire. Çendek pêve çû, ça çêbû, Şêroyî kopikê xwe ji çantikî anî derê û ji xwe re çayek têkir û dest pê kir bi germî vexwar, bi armanca belkî pê bikaribe xewê ji çavên xwe vebirevîne. Segvan, di wan gavan de hişyarbû. Wî serê xwe rakir û gote Şêroyî:

— Pismam, manê me li bere em pêşmergetiyê bikin û heke pêşmergetiya rast be niha nobeya te bi dawî hat û ger gera min e.

— Te ya rast bivêt, xew wenake mijulankên çavên min jêk vebibin, Şêroyî diyar kir ko dixwaze binive. Divêt em bi roj têr binivin bona ko em bikaribin bi şev têr bilivin û di bizavê de bin.

Şêro jî bi rex hevalên raketî raza û xwe da dest xewê û xweşî û hînkatiya wê zozanê. Wan ji xwe re cihekê veder ji rê û nepenî , cihekê bilind ko çi kesek zû û bi hêsanî bi ser wan hilnebe, hilbijartibû. Lê digel hindê jî, bi nobet, yek li pey yekî zêrevanî û çavdêrî li hevalên nivistî û dewr û berên xwe dikir. Bûbû piştî nîvro dema Bêwarî hemû ji xew rakirin û gazîkirin bo ser têştxwarinê. Şêroyî şekir xiste nav çaya xwe û di ber têkvedana çayê re got:

— Birano! Niha me çekê xwe heye û em dikarin pê bizavine wilo bikin,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

pê ji hukumetê re biselmînin ko eger şoreşê şikestin xwaribe, milet heye û namire û weha berxwedan berdewam e. Divêt em vê hukumetê têbigehînin ko hindî milet di bin bindestî û zordariyê de be dê pêşmerge û şoreş û serhildan jî her hebin. Divêt em tiştine weha bikin ko mirovê kurd pê bivecinîqe û êdî hizrê neke ko ev dawiya kurda ye û herweha bibe egera ko ew dev ji koşa dagîrker û cehişkatiyê berdin. Bes tiştê herî giring ew e em çi tiştê weha nekin, zerera xelkê me jê çê bibe û em tadariyê li çi kesekî jî nekin. Kurt û kurmanc em weha bikin ko ew zordarî û tadarî û destdirêjkariya li miletê me tê kirin nemîne û neyê kirin.

— Lê, ma dê em çiwar kes bi tenê çi bikin? Bêwarî axiftin lê birî û pirsyara xwe xiste ber hevalan. Dê baweriya kê bi çwar pêşmergeyan hêt? Dibêjin dê partî dest bi şoreşê bike ve, heke wesa be, hema da em xwe lê bigirin û bi wan re dest pê bikin.

— Bêwar, heke dê ji destpêkê ho yê sar û bê bawerî bi xwe û xelkê xwe bî ya çêtir ew e tu biçî rûnî ber tenişta hurmetekê û ji xwe re zarokan çê bikî, Segvanî bi dengekê dijwar bersiva wî da.

— Ma kî digel te axiftiye? Bêwar ji wî çeşnê bersivdanê torebû û çavên xwe li Segvanî girê kirin. Paşî ma tu axînkan bo himbêzên xweşên jinekê ranahêlî, yan tu ji esmanan hatiye xwarê? Belkî jî tu bê ew tişt bî!

— Hey mala we doşav tê bizêt, ma eve çaxê hevrikanê û cirenîxa ye! Şêroyî zû axiftina xwe avêt û rê li ber berdevdana Segvanî girt û xwest dawiyê bi wê cirreyê bîne. Hevalên hêja! Min nevêt xwe bi serê ti kesekî de bikim zana û şehreza, lê ez dixwazim tiştekî bêjim; eger em dê bi hevudu re kar bikin, divêt em dilên xwe ji yek û du re vebikin û rêzdariya me bo lênerîn û dîtinên me yên cuda cuda hebe, hemû ji bona ko em di karê xwe yê hevbeş de serkeftî bin. Birayê Bêwar, ya partiyê ko dê dest bi şoreşê bike heta niha haya min jê nîne û eger hat û bû rastî hîngê her kesek yê bi dilê xwe ye û her ji destpêkê min gotibû ko mebesta min ji vî karî ne ew e em partiyekê dabinin. Çunkî hindî ez im , ez di xwe de, wê şiyan û zanîna birêvebirina partiyekê û şoreşekê nabînim. Pismam! em qala nuke dikin û ka subehî kî tê qadê û ka kî ji me diçe digel û kî naçe, ew pirseka girêdayî her kesekî ji me bi serê xwe ye. Segvanî rast got, ko divêt berî her tiştî mirovî bawerî bi xwe û bi miletê xwe hebe. Her weha Bêwar, te jî rast got, ko çi leşker ji çiwar kesan bi tena serê xwe pêknayên. Lê rê heye ko kesine din jî bigehin me, her çend e nebaş e hejmara me boş bibe, ji ber ko şerê me dê yê partîzaniyê be, ne şerê berok û eniyan be. Armanca me ew e em dirbên xwe bi dizîkî ve li dagîrker û zordaran biweşînin û xwe

ji ber çavên wan wunda bikin û bi hîç rengekî -kêm tişt di qonaxa niha de- em nebin xwedî bingehên destnîşankirî û akincî. Bawer bikin gelî hevalan, ez, di nava xwe de, xwe bi sextirîn dijminê çek û cebilxane û şer û kuştinan dibînim û hêvîdar im ko pêwîstiya me bi çi kuştinkariyan nebe, lê ez hindî hizra xwe dikim ko çareyeka din ji rewşa me re peyda bikim, ez nikarim û ev çare bi tenê di ser û mejiyê min de heye. Ma da çi ji hindê çêtir be ko pirsa miletê me bê şer û xwîn hatiba çareserkirin, lê Xudê mala bêbext û dilpîsan bişewitîne ko em tûşî rêyeka weha kirine.

Şêroyî lê nihêrî ko Bêwar bê deng û mit bûye, mîna kesekê li gotina xwe peşîman, evca wî dest pê kir pilana bizavên xwe bo şeva dihêt berçavî hevalan kir û gêngaşe li ser çêbû.

Pêşniyar û dîtinên cuda yên her yekî ji wan hebûn û di dûmahiyê de biryar hate standin ko Şêro bibe rêberê wan. Şêroyî xwest xwe ji rêbertiyê bide paş û hevalekê din bi wî karî rabibe, lê hersêyên din ji gotina xwe nehatin xwarê û weha Şêro bû berpirsyarê grupê.

Weku şeva bihurî, lê wê carê çek bi milan ve, ew ketin nav devera Berwarî Bala û çûn gundê (B). Berî ko ew biçin bo nav gundî Şêroyî gote hevalan:

— Hûn çi neaxivin, dê ez bi tenê axivim. Dema hûn bangî hevudu dikin, peyva heval bikarbînin. Eger kesekî ji we rexneyek li ser hevalekê xwe hebe, di nav xelkî de wê rexneyê nekin û bihêlin bo piştî derketina me ji gundî. Eger hûn neçarbûn ko bi kesekî re biaxivin, bila zimanê we ji gundiyan re zimanê rêzdarî û hurmetgirtinê be.

Çaxê ew ketine nav gundî, gundî têkhatin û têkçûn û bû pis pisa wan û got gotik weko biruskê di nav gundî de geriyan:

— Kuro! eve pêşmerge ne, pêşmerge hatin ve.

— Diyar e şoreşê dest pê kir ve.

— Hema weko caran nebe û karesateka din li pey nebe, baş e.

— Her weçku ew ber bi mala kwîxweyî ve diçin.

— Erê gelo ma kî nabêje ew ne sîxurên hukumeta Iraqê ne û bi kinc û cilên pêşmergeyan hatine gundan.

— Ew jî dibe. Dibe ko ew bi vî rengî dixwazin xelkê ko li dijî wan be, nas bikin.

— Hey pa xişîm in, ma hukumet nizane ko em van çel û çiyayên xwe nadin bi Bexda û taca wan.

— Pêşmerge ji ko ve, ew roj çû nahête ve û Barzanî yek bû, çû û ranabite ve


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Babo ez bi Xwedê kim eve pêşmerge ne. Hema ji navçav û rêveçûn û karê wan xuya ye.

Deriyê mala kwîxweyî hate qutan. Kurê kwîxweyî dergeh vekir, dema çavên wî bi çavên pêşmergeyan keftin, ew di cih de ma neliv û çirrîseyê xwe li serê wî da û nezanî çi bike, lerizî û bê ko peyvek bi tenê jî ji devê wî derbikeve, ew bi bez vegeriya bo hundurê xanî. Dêm lê zerspîtale bûbû û bêhin lê kurt bûbû û bi ezmanekê tirtirî gote babê xwe:

— Bab....bab, pêş...pêşmerge li ber derê mala me ne.

— Çi ?! Eve tu çi dibêjî, babê bi sexerkbirin ve bersiva kurê xwe da û pit pitek bi dengekê bilind ji ber lêvên wî derdikeft. Diyar e ev kurê min dînbûye. Ma tovê pêşmergeyan jî ma ye? Ma kesek diwêre bibe pêşmerge û li van deran serê xwe diyar bike? Ma her kesekê kincên kurdî li ber bin pêşmerge ye? Ev kure dê...

Dema kwîxweyî der vekirî, gotin di gewriya wî de xendiqî û çav lê boq bûn. Şêro, ko li ber derî bû, haya wî ji wê axiftina kwîxweyî hebû, wî digel dervekirinê gote kwîxweyî:

— Belê kwîxwe, em pêşmerge nin û ha tu bi çavên serê xwe dibînî û em bisteh dikin bêne vê derê û em dê subehî xwe li Bexdayê jî bidin. Guhên xwe baş veke, em bi lez in, me hevalên xwe li danga gundî hiştine û me ji vî gundî xwarin têra şîv û têşta xwe divêt.

— Belê...belê ezbenî, bi dengekê tirs tê de xuya kwîxweyî got. De bila pêşmerge kerem bikin û bêne gundî, da ko ez wan li ser malan belav bikim.

— Yek em bi lez in, Şêroyî bi zimanekê pir xweş û bawerî bi xwe heyî welama wî da. Du, em 150 kes in û fermanên me ew in ko em bi hejmarên mezin nekevin nav gundan, evca lezê bike û xwarineka sivik, ya serpê ji me re ber dest bike.

Ji kwîxweyî re, dîtina pêşmergeyan û ho ji nişkan ve û bihîstina wê hejmara mezin ya wan, weko aveka pir sar bû ko di zivistaneka qerimî de bi ser serê wî de rijiya. Pêşmerge li ber derî hiştin û çû hundurê xanî û zû bi kurê xwe re zivirî û telêsekê sipî û mezin yê şûna şekirê di dest kurê wî de û herdu ketine nava gundî, ji malekê bo ya din, ji pêşmergeyan re nan û xwarin da hev. Kwîxweyî digel xwe digot:

— Ne herê, careka din pêşmerge peydabûn ve û ew dê nanê min qut bikin.Ya çêtir ew e û hê ez li çi belaya nedayîm, ez dev ji kwîxwetiyê berbidim. Bes hema vê carê çi li min nekin...

Kwîxwe û kurê xwe piştî nîv seetê hatine ve û telîsê wan bi lêvan re tijî

xwarinên cur bi cur yên hişk bû û wan ew telîs da dest Şêroyî. Segvanî û Dildarî dest dan telîsî, ji Şêroyî wergirt û bi hev re xatra xwe ji kwîxweyî û ji gundiyên li nêzîk xirvebûyîn xwest û da rê.

Çend pêngavekan çûn, Şêro li pişt xwe zivirî û berê xwe da kwîxweyê ko hêj li ber derê mala xwe rawestayî bû û gotê:

— Kwîxwe, çavê te li gundiyan be û xizmeta wan bi başî bike û pişta wan bigire. Em dê yekudu bibînin ve.

Piştî ko ew ji gundî derkeftin, Segvanî pirsyar ji Şêroyî kir:

— Ew çi sed û pêncih pêşmerge nin û ev hemû xwarine bo kê ye?

— Manê eve ye karê me yê îşev, Şêroyî bi bişkurîn li hersê hevalan nihêrî û bersiva xwe bi kurtî da.

— Ez tênagehim ka te bo çi em çiwar kirin 150 û te ev hemû xwarine ji gundiya stand? Bêwarî bi bêhin tengî pirsyar havête ber Şêroyî.

— Her roj spêdeyê kwîxweyên hemû gundan diçin nahiyê û ew her çi tiştê, çi hûr û çi gir be, ko di gundî de biqewime digehînin dam û dezgehên hukumetê. Çiwar pêşmerge bi tenê hukumetê natirsînin û nahejînin. Lê nûçeya hebûna 150 pêşmergeyan di deverê de, dê plan û nexşeyên hukumetê tevlihev bike û têk û pêk bide. Ya nanî jî, bona ko hemû gund pê bizanibe û kwîxwe û hukumet pê bawer bikin ko 150 pêşmerge hatine vî gundî. Niha rawestin da her yek ji me têra xwe nanî û xwarinê dake çantika xwe û ya dimîne jî dê em di rêya xwe de berdin nav rûbarî, bila masî jî bi xêra wê derewê têr bixwin. Divêt îşev şeper bi me ve bin û em vê bi serê çend kwîxweyekên dî jî bînin. Em dê niha xwe gehînin gundekî li devera Zaxo û paşî em dê hêneve gundekê vê deverê û em dê bi vî awayî serên rêya li ber hukumetê berze bikin û wesa nikare rastiyê ji derewê vavêr bike. Xwe, subehî ne dûr e û dê em zanin ka çawa me bi kiryareka weha hukumet anîye îşte îştê û dê em sube bi çavên xwe helîkopter û semtiyên wan bînin ka dê çawa heta êvareka dereng bi ser deverê de hên û çin.

— Ji gotina te diyar e ko em subehî dê li van deran bin! Segvanî bi vê gotina xwe axiftin li Şêroyî birî.

— Çima na, em dikarin xwe di kiloxekê çiyayekê asê de mit bikin û temaşayî rewşê bikin ka dê çibe û dê çawa be, Şêro ji van axiftinên xwe bi bawer bû, te digot qey wî deh pazde salan pêşmergetî kiriye. Lê ez dibêjim ya çêtir ew e em subehî li cihekî bin ko ji vê derê dûr be, bona ko em çend tevgerekan lê bikin.

— Baş e, hûn bo çiyayê Gareyî çi dibêjin bona ko em subehî digel


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

berbangê xwe bigehînînê û roja xwe ya sube tê de derbas bikin? Bêwarî ev pêşniyaz xiste ber hevalan.

— Gelek baş e û çi cih ji wê derê çêtir nînin û em dikarin duzbe ji wê derê biçin bo nav Nêrweyan, Şêroyî got.

Hosa û piştî ko her di eynî şevê de ew çûne du gundan, yekî li devera Zaxo û yê din li devera Berwarî Bala, wan digel elindê xwe gihande Gareyî. Wê spêdeya ew gehiştine Gareyî, kwîxweyên wan gundên ko ew bi şev lê bûbûn mêvan ber bi nahiyê çûn. Her kwîxweyekî bûyer bi awayekî berçavî berpirsyarên hukumetê kir:

— 150 pêşmerge bûn û çekekê baş di dest wan de bû.

— 210 pêşmerge bûn. Heta me xwarin jî da wan. Ez dibêjim ber bi devera Duhokê diçûn û wan digot ko pêşmergeyan dest pê kiriye ve.

— 45 pêşmerge bûn û wan digot li her deverekê çend sed pêşmerge hene.

— Ne bes klaşînkof pê re bûn, lê arpîçî û dûrbîn û tiştine din jî.

Wan deng û basên hungurê spêdeyê hukumet anî îşte îştê û şilqek pêxist. Danûstandin bi Bexdayê re hatine kirin û Bexda xeyidî û gef li berpirsyarên hukumetê li deverê kirin, eger ew bi zûtirîn wext wan pêşmergeyan jinav nebin û wê »pîlana împeryalîzma cîhanî û siyonîzmê bo ser elweten el'erebî têknedin".

Ji tirsa Bexdayê desthilatdarên lokal ferman dan û helîkopter û semtiyan ji nişkann ve esmanê devera Berwarî Bala û Zaxo dagîr kir û heta êvareka dereng ew li pey wan pêşmergeyan geriyan û çi pêşmerge bi dest wan nekeftin. Roja din gera Gareyî û ya paştir li devera Nêrweyan û di hemû rojan de, êvarê leşkerê hukumetê tirsiyayî, mandîbûyê û weko dibêjin dest ji pêyan dirêjtir vedigeriya ve bo bingehên xwe û serbazan digotine hevudu »lo ev pêşmerge mîna ercina nin, mirov nikare wana bi çavên xwe bibîne û ew li hemû cih û deran in«

Li gor gotinên kwîxweyan, Bexda ji karê efser û berpirsyarên deverê ne razî bû, lewma jî wê her zû gelek ji wana guhertin û ji yên nû xwest ko ew bi lez û bez pêşmergeyan û navê pêşmergetiyê bi yekcarî binbir bikin û heke weha nekin dê çarenivîsa wan jî weko ya yên berî wan be.

Karê her çwar hevalan di mehekê de bû ew û wê tevgera wan kartêkirina xwe hebû. Rûniştivanên deverê bawer kir ko pêşmerge hatine ve û yê xwe bi ser û ber dikin û dê di wan nêzîkan de dest bidin dirbweşandinê li bingehên hukumetê û leşkerê Iraqê li deverê, dê dersan bidin dûvelankên hukumetê û caş û xinizkaran. Hukumet jî weke kunemêşa zilkêtkên

azirî, di nav xwe de dihat û diçû, dixwest bizanibe ka ew pêşmerge kî ne, ser bi çi partî ne û xwe li kûderê vedişêrin, lê nikaribû rastiya wan bizanibe.

Di wan hatin û çûnên wan de gihaşte guhên wan ko çeperê serbazên Iraqê li Serê Hemê li devera Berwarî Bala, bûye astengek di rêka rêving û karwançî û xwecihên deverê de. Ta şivan jî ji gullebarankirin û tadakariyên wan rizgar nabin û xelkê sivîlê wê derê ji ber wan serbazan çi rehetiyek nîne. Evca her çwar hevalan biryar da çareyekê li wî çeperî bikin; kêm tişt weha bikin ko serbaz bitirsin û êdî bisteh nekin xwe taloqetî xelkê deverê û hatin û çûnên wan bikin.

Wan xwest zanyariyan li ser wî çeperî bistînin û xelkê gundên nêzîkî wî çeperî, di wî warî de, ji wan re pir arîkar bûn û hêviya wan ew bû ko ew pêşmerge çareyekê li wî çeperî bikin û bela wan serbazan jê vebikin. Li gor wan zanyariyan, goya 30 serbaz di çeperî de ne û bijlî tiveng û narincokan doşkeka wan jî heye.

Berî çend rojekan wan serbazan bêrî gullebaran kirin. Xecoka Ahmedê Qumrî û zarokê wê yê yeksalî ko di parzînê wê de, li pişta wê bû, bûn armanca wan gulleyan û derhal hatine kuştin. Ewê bûyerê xwecihên wan gundan û bi taybetî ew her çwar heval gelek bi xemxistin û ew handan ko biryara xwe zû bicîbînin.

— Berî em dest bi kiryareka weha bikin divêt em, berî her tiştî, mirina xwe deynin ber çavên xwe, Segvanî got. Bes pêwîst e jî, em li ser xwe bin û bi haybûn ji xwe vî karî bikin.

— Hey, paşî ma ya ji te ve qey ew her 30 serbaz bi şev û roj di çekên xwe de nin û di nobedariyeka berdewam de ne! Bêwarî bi zimanekê pêtrankî li ber devê Segvanî da. Bira, bawer bikin, bi şev, du yan sê nobedariyê dikin û yên din hemû dinivin. Evca hema em bes wan nobedara bêhiş bikin, dê çeper hemû di dest me de be.

— Birano çi dibe bila bibe, divêt em êrişekê bibin ser wan û dersekê bidin wan, Segvanî dixwest axiftinê li ser vî babetî kurt bike. Heta difin li wan neyê herişandin ew dev ji wan kiryarên xwe yên çivêl bernadin. Bes, berî ko em êrişê bikin divêt em çend rojekan ji dûr ve, çi bi berêxwedana senta çavan û çi bi dûrbînan, zêravaniyê li wî çeperî û hatin û çûna wan serbazan û rêyên çeperî bikin, bona ko em bi çavkorehî neçin ser wan.

Wan, piştî sê rojên kontrolkirina çeperî û serbazên tê de û rêyên hatin û çûnên wan, pilana xwe danî. Demjimêr dwanzdeyî şevê bû, dema her çwar gihaştin bin dîwarkê çeperî. Şêroyî serê xwe bilind kir û çerxek li dor

çeperî da, jê re xuya bû ko bes du serbaz bi tenê di nobedariyê de ne. Herdu serbaz nêzîkî hevudu rawestiyabûn û bi hev re dipeyivîn û çi kesekê din ji bilî wan xuya nebû. Şêroyî mêzekirê, her yek ji wan serbazan ber bi aliyekê çeperî kete piyaseyeka hêdî hêdî. Yekî, radyo pê re bû û ber bi rexê piştê çû û yê din ber bi deriyê çeperî hat. Şêroyî nîşanek da hevalan bona ko Segvan û Bêwar biçin telba yê piştê û Dildar digel wî êrişî yê nêzîkî derî bikin.

Şêroyî kevirek rakir û avêt û hêl li pêpikên ber derî da, dengê pêkeftina berî çû serbazî. Wî xwest bizanibe ka ew çi ye, serê xwe ji deriyê çeperî anî der û nişîv kire xwarê bo ser pêpikan, lê wî çi nedît, evca ew vegeriya bo ser piyaseya xwe ber bi serbazê din, xuya bû ko tirsiyabû, lewma qesta hevalê xwe kir. Lê dengê berê duyemîn yê Şêroyî, ew serbaz xiste gumanê. Wî klaşînkofa xwe ji milê xwe vekir û xiste di nav lepên xwe de û li dor xwe zivirî, çi nedît, evca pêyekê xwe bir bo ser pêpikan û hê pêyê duyê nehavêtî xwarê, Şêro ji wî siviktir bû û ew pêyê wî yê yekem girt û hêl ji ber wî rakêşa û serbaz dev û dev li binê derecikan da. Her zû Şêroyî tivenga xwe bilind kir û qontaxa wê li patika serbazî da, yê ko hewil dida serê xwe bilind bike û wî ew serbaz demildest bêhiş û teraşî wê derê kir. Zû Dildarî rahişte tivenga serbazî û da dû Şêroyî bo nav çeperî.

Hindî Segvan bû, serê xwe bi ser dîwarê çeperî re bilind kir bona ko xwe hilbide silal bo aliyê çeperî yê ji nav de. Serbazê radyo di dest de hest bi tiştekî kir. Yekser radyoya xwe vemirand, li rex û dorên xwe nihêrî, çi nedît, du sê carekan bi dengekê nizim gazî hevalê xwe kir ,,Hemze....lek Hemze....Hemze..'' Segvanî, ko guh li dengê gaziya wî bû, serê xwe nizim kir ve û xwe da ber dîwarkê çeperî, bi rex Bêwarî ve. Serbaz ber bi wî rexê dîwarkî yê ko Segvan û Bêwar li piş çû, lê hê negihaştiyê û ji pişt ve pêjneka pêyan hatê. Bê ko li pişt xwe bizivire, ya ji wî ve ew hevalê wî ye, li pey gaziya wî hatiye, lewma got »haze inte Hemze'', lê çi kesekî bersiva wî neda, evca xwest li pişt xwe bizivre û bizane ka ew çi pêjn e ho nêzîkî wî dibe, lê hê baş serê xwe ne zivirandî paş, qontaxa tivenga Şêroyî bi hemû hêza destên Şêroyî hat û bi zikê serbazî keft û ew xiste erdî û tiveng ji destan veresande dûrî wî. Ji çavzilkanekê zûtir Bêwarî xwe ji ser wî dêwarkî havête aliyê ji nav de û xwe zû havête ser serbazî û dev lê girt. Dildar û Segvan çûn û serbazê dî yê li ber derecikan keftî anîn û dev li herduyan girtin û ew herdu, bi şelîtekê, pêkve girêdan û şelît xiste kevirekê mezin ko di dîwarî de bû bona ko nikaribin xwe ji cih bilivînin.

Wan zû çavek di dewr û berên odeyê de gêrand, lê, wan ji bilî wan her-

duwan çi kesekê din nedît. Ew ji hindê pişt rast man ko yên mayî di odeyê de raketîn e. Dergehê jorê ji darî bû û pêvedayî bû , lê ne daxistî bû. Şêroyî wenekir ko heval biçin bo nav hundurê odeyê û wî hizreka din hebû û wî tiştek gote Segvanî.

Segvanî li gor gotina Şêroyî kir û xwe zû havête pişt doşkê û berê wê da mezelka serbaz tê de nivistî û seliyeka wê bi ser mezelkê ve berda. Şêroyî û hevalên din cihên xwe li ber herdu aliyên derî kirin û berê tivengên xwe dane derî. Bi erebî û bi dengekê xurt û bilind Şêroyî bangî wan serbazên di hundur de kir:

— Em pêşmerge nin û me rex û dorên we girtine. Evca heke we divêt hûn neyên kuştin, çekên xwe di hundurê odeyê de bihêlin û bê çek û dest bilindkirî, yek li pey yekî derbikevin.

Çi bersiv ji hêla serbazan ve, ji hundurê jorê nehatin, lê ji wê qerebalixa wan xuya bû ko ew li ber xwe keftine û nizanin ka çi bikin, çi nekin. Lewma Şêroyî careka din û bi dengekê bilindtir û tingijîtir gazîkire wan:

— Em bo cara dûmahiyê we haydar dikin. Divêt hûn zû ji odeyê derbikevin. Ez dê ji 1 heta 10 bijmêrim û eger hûn piştî hejmara dehê dernekevin, wê gavê guneha we di stuyê we de û xatra xwe ji jiyanê bixwazin. Çunkî heke hûn guh nedin me û piştî timam bûna hejmartinê zû dernekevin dê ev odeya hûn tê de bi we ve hête peqandin. Dema hûn derdikevin jî çi çivêliya nekin çunkî berê doşkê li derî ye û tivengên pêşmergeyan jî arasteyê der û dorên odeyê kirîne. Ez niha dest bi hejmartinê dikim.

Şêroyî dest bi hejmartinê kir û Segvanî xwe li pişt doşkê peyt kir û hevalên din jî di cihên xwe de peyt û amadebûn. Hêj Şêroyî negotî neh, deng ji derî hat, vebû û patekê sipî xuyabû, diyar bû fanêleyê serbazekî bû. Serbaz jî, weko Şêroyî jê xwestî, bi destên vala û bilindkirî û yek li pey yekî derkeftin. Dildarî, her di cih de û zû, sehûsiya her serbazekî dikir nekû çek pê re be û serbazê ko wî berdida Bêwarî digirt û neçar dikir ko rabikeve erdî ser zikê xwe, navçav li ser axê û herdu dest li pişt patikê.

Weha bûn 29 serbaz û digel herduyên pêşiyê hejmara wan bû 31 kes. Şêroyî ferman da Bêwarî û Dildarî bona ko biçin wan herdu serbazên din jî bînin cem wan. Dema ew gehiştine nik wan serbazan, hê ew li cihê xwe bûn û bê deng, lê li dema Dildarî xwestî şelîtê vebike bona ko bikaribe wan bi pêyan, ne bi raxişandinê bibe, ji nişkan ve yê milê çepê pehînek li navçavên Diladrî da û ew pişt û pişt rahavêt. Xuyabû ko şelît baş nehatibû girêdan û wan vekiribû û di wan gavên ko wan şelît tê de vekirî Dildar

û Bêwar gehiştin cem wan.

Hê yê milê rastê xwe ne livandî Bêwarî pehînek li devî da û zû lûliya tivenga xwe raheşande nav devê serbazê milê çepê yê ko pêhin li Dildarî dayî. Zû Dildar rabû ser xwe û hate hindav wî yê ew dirb daniyê û bi xeyidîn berêxwedayê; li ber tava heyvê dêmekî 19- 20 salî yê başûrê Iraqê, dibe ko ji Besrayê bû, hate ber çavên wî. Di wê gavê de dengê Şêroyî hate wan, ji wan dixwest ko lezê bikin. Bêwarî tiveng ji devê serbazî anî derê û lê heyitî û ew û serbazê din yê ko ji tirsan dilerizî dane pêş xwe û ew gihandine nik yên din.

Sê ristikên cil û kinchilawîstinê bi dîwarê mezelkê û dîwarê çeperî ve girêdayî bûn. Şêro giha ristika û çeqoka xwe ji berîka şelê xwe anî derê û ristik jê vekirin. Wî serbazên li ser erdî kirin du rêz û wî û Bêwarî pê û destên wan bi hevre girêdan û vê carê mukum ko nikaribin xwe bi hêsanî jê qurtal bikin. Segvan ma li ser doşkê û berê doşkê jî li serbazên dest û pê lê girêdayî û li ser zikî rakeftî û hersê hevalên wî yên din çûn bo nav hundurê odeyê. Tiveng û narincok û gulle û du dezgehên biçûk yên bêtel yên ber dest anîn derê.

Şêroyî ji Dildarî û Bêwarî xwest ko li dewr û berên çeperî li dewarên serbazan bigerhin û wan bînin bona ko ew çekî pê bar bikin û bibin. Çi pê neçû, herdu û serhefsarên du hêstiran di destên wan de vegeriyan. Wan, ew herdu hêstir ji çekan bar kirin û Şêroyî kincine nû yên serbazan ko di odeyê de bûn anîn derê û xistine ber barê hêstirekê.

Berî ko ew çeperî bihêlin û rêya vegerê bidin ber xwe, Şêroyî çavên xwe di nav serbazan de gêrandin û çû hindav efserekî û stêrikên ser milên wî jê vekirin û xistine di berîka xwe de û bi erebî gote serbazan:

— Hûn baş dizanin ko em dikarin we niha bikujin jî, lê ew ne ji kultura me kurda ne û pêşmerge ne kujek in. Serdarên we, desthilatdarên Bexdayê kujek in û kuştinê bi destên we dikin û weha we jî mîna xwe dikin kujek û weha kupiyên xwe li her derekê çê dikin û mişe dikin. Em li dijî şerî ne û em miletek in daxwaza mafên xwe yên mirovînî û neteweyî dike. Em dixwazin li ser axa welatê xwe bi azadî û bi cîrantiyeka xweş li gel we û cîranên din bijîn, lê serokên we yên diktator dibêjin na. Ma çi ji wan kêm e û bi van kiryarên wan çi ji wan kêm dibe? Wan hemû tiştek heye û ew di qesr û bîlayên xwe de, bi xweşî û êmnahî û dûrî şer û tirsê dijîn û yên weko we û miletê me di bive û şer û kuştinê de dijîn. Bi vî şêweyî, ne em û ne hûn rehetî û azadî û xweşiyê dibînin.

Divêt hûn bizanibin ko hedara miletên mîna me bindest sinûrên xwe

heye, li ber her tiştekî û bo heta hetayê bê deng namîne. Evca, ji evro pêde, destê çi kesekî ji we bi xerabî dirêjî kesekî ji xwecihên deverê bibe, hîngê, em dilovaniya îro me bi we re kirî, digel we nakin. Hîngê dê bersiva me bê agadarî hêt û dê gelek dijwar be. Van peyvên me bikine guhark û bikin guhên xwe.

Piştî ko Şêroyî axiftina xwe bi dawî anî û berî ko bibêje hevalên xwe bidin rê, Segvanî got:

— Rast e em nikarin vê doşkeyê bi xwe re bibin, lê em dikarin wê ji vê bilindahiyê girêlî xwarê bikin bona ko serbaz wecê jê nebînin.

Gotina Segvanî hate bicîanîn û doşke ji wê bilindahiya berz bo binê çiyayî hate vezelandin. Pey havêtina doşkeyê, her çwar hevalan rêya ber bi bakûr girt û wan, di rêyê de li nêzîkî sinûrên çêkirî, li cihekê nepenî çekê zêdeyî xwe veşart.

Roja dîtir, spêdeyê zû, xeberê dagîrkirina çeperê Serê Hemê ji aliyê pêşmergeyan ve, ne bes li devera Berwariyan, lê li Duhok û Zaxo jî belavbû. Çirîska hêviyê di nav xelkê de geşbû ve û tirs kete dilê xinizkar û xwefiroşan.

Çalakiyên wan çiwar hevalan pitir lêhatin û ya ji hemûyan bêtir deng vedayî û kêfa xwecihên deverê pêhatî, bûyera berî meh û nîvê bû. Belê, bi roj û li ser cadeya giştî wê bûyerê rûda û wê nûcaş û dûvelankên hukumetê xistine di hizirkirinê de li ser xwe û paşeroja xwe û tirsa ketinê bo nav destên pêşmergeyan.

Li ser rêya ji Bêgova tê û diçe Kanîmasê û bi durustî di navbera gundê Çeqela û Qumriyê de; efserekî û sê serbazên leşkerê iraqî landkrozerek rawestand û ji siwarên wê daxwaza pênasnameyan kir.

Siwarê ko li sîngê tirimbêlê, bi rex tenişta şofêrî ve rûniştî û cilên leşkerê iraqî li ber û pila »muqedem ruknî« li ser milan bû, bi zimanekê req û fermander got:

— Ma hûn kore ne?! Ma hûn cilên min û pila min nabînin?! Ez efserê »îstîxbaratên firqa« Zaxo me...

Şêroyî, ko pila efseran li ser milan bû, pêyê xwe yê rastê rakir û hêl li erdî xist û silaveka leşkerî ji wî muqedemî re kir. Û paşî destê xwe yê rastê anî ve xwarê û bi erebiyeka mûsiliyane got:

— Bibore ezbenî, me dixwest li pênasnameya siwarên din mêze bikin, eger ezbenî tu li dijî hindê nebî.

— Her çend e we mafê hindê nîne me rabiwestînin û pirsyara ji me bikin, lê xuya ye hûn di karê xwe de micid in û ev di rewşa van rojan de

û hebûna »usatan« yaxîbûyan pir baş e, lewma ez dê wan bi we re bidim nasîn, şofêrê simbêl reş û boş û badayî berî ko muqedem biaxive peyivî. We, efserê bi rex min ve niyasî û eve ez jî berpirsê partiya Be'is im li Zaxoyê û her wisa efserê emna Zaxoyê me û herdu kesên li piştê jî rûniştî ji îstîxbaratên leşkerî ne.

Her di wan gavan de Segvanî deriyê bi rex şofêrî ve vekir û luliya klaşînkofê xiste di guhê şofêrî de. Şofêrî zû tirimbêl vemirand û Segvanî siwîç jê kêşa derê û hilgirt. Di gel wê livîna Segvanî, Şêroyî jî ew bi serê muqedemî anî û zû her çwar ji otomobîlê peya kirin û birin bo derveyî cehdeyê, bo pişt kevirekê mezin ko li wê derê bû. Segvanî jî tirimbêl ji rêyê derxist û ajot bo pişt kevirî. Şêroyî ferman da wan, ko zû kinca ji ber xwe bikin. Wan nedizanî ew çi ye bi serê wan tê û ka çi diqewime, lê tirsê ew ji derve û ji hundur de dagîr kiribûn, lewma, wan bê yek peyv bi tenê jî fermana şêroyî zû bicîanî û man di derpêyan bi tenha de. Lê, Şêroyî li wan kire qêrî ko derpêyan jî ji pêyên xwe bikin. Yekî ji wan çwar dîlan ko siwarî paşiya tirimbêlê bû, xwe bisteh kir û bi erebiyeka şikestî û bi eksintekê kurdî gote wan:

— We xêr e, nê em jî serbaz in û iraqî ne û di ser hindê re emn û îstîxbarat in. Evca heke hûn jî serbaz bin pa ev çi ye hûn digel me dikin?!

— Hevalno! Şêroyî dev lê ma beş û gote hevalên xwe. Berêxwebidinê me kî girt, me dizê xwe girt. Kurd e û îstîxbarat e û Xudê dizane ka ew dê îro bi van re biçe kî ve û mala kê xerab bike, yan xuliyê bi serê kîj gundî de wer bike.

Şêroyî her digel axiftina xwe rahişte wî kurdê îstîxbarat, ew da aliyekî û Bêwar li ber rawestand û paşî wî û Segvanî û Dildarî ew hersê yên din ko ereb bûn, bi şelîtekê ko bi wan re bû girêdan. Çawa girêdan; hersê rûs, yek li pey yê din û mukum girêdan. Paşî, Şêro di berîkên cilên wan de xebitî, pênc dînareka sor bi dest keft. Ew pênc dînar bi lêvên wî kurdê xwefiroş ve durî û ew bi darekê ve li hindav cehdeyê ji mila û navtengan ve hilawîst. Ew cihê ew lê hilawîstî ji her hat û çûyekê peya û siwar re xuya û li ber çav bû. Hersê ereb jî anîn ser cehdeyê û bi darekê ve ko li ser lêva cehdeyê bû girêdan. Rûs û tazî, muqedem li pêşiyê û yên din li pişt wî; zikê her yekî ji wan bi pişta yê din ve. Wan li ser kaxezekê jî nivîsand »pêşmerge bi xêrhatina we dikin« û ew kaxez bi darê ve kir.

Wan ew sax di wê rewşê de hiştin û ew li landkrozera wan siwar bûn û çûn. Wan berê tirimbêla xwe da bo çiyayê Metînî. Rûniştivanên wan gundan hind dît tirimbêleka landkrozera sipî ko ji rengê yên hukumetê

ne, nêzîkî Metînî dibe, çwar serbaz jê peya dibin, cilên xwe ji ber xwe dikin û cilên pêşmergeyan dikin ber xwe û landkrozerê li wir dihêlin û ew di Metînî de wunda dibin.

Wê çelengiyê dengvedana xwe ya pir mezin li başûrê welatî hebû û nêzîkî mehekê suhbeta dîwanan ya herî gerim ew bû. Paşî, Şêroyî û hevalan zanî ko ew kurdê îstîxbarat yê ko wan, pênc dînar bi lêvên wî ve durî, yek ji pîstirîn îstîxbaratên deverê bû û her ew bûbû egera girtin û xendiqandina gelek kurdên welatparêz û xwegorîker.

## – 9 –

Carna ko wextê Şêroyî yê vala hebuya, wî hizirkirin û dîtinên xwe di defterka xwe de dinvîsandin. Wî di dema dawiyê deev çende jî nivîsî:

— »Çima ez weha yê dilnerm im? Ma dilnermî bi van dagîrkeran re dibe? Erê gelo ew dê me ber bi kûderê bibin? Nexêr, dilnermî bi van re, wan li ser me bêtir zal û dijwar dike û perîşanî û bindestiya me mezintir û domdirêjtir lêdike. Xwe, ya bi serê Besnayê û dapîra wê hatî ji bîra min naçe, Şahîn û Mîrza, ew gencên dilsax û mirovhez û xweşîmank, her tim di hizra min de û li ber çavên min in. Xwe bi hezaran, mîna wan ketine ber şaloka dagîrkeran.

Ma zordariya wan çawa tê jibîrkirin û em û ez her gavek û her rojekê tê de dijîn, bi çavên xwe dibînin, bêhna wê dikin, tama wê ya nexweş û gemar li ser lêvên me ye. Belê, kabûsekê bêhinçikker e û ji ser sînga me ranabe. Lê ez ya rast ji we re bêjim, hê ez dilnerm im; ez nikarim di nav xwe de biryareka weha bistînim ko armanca min ya serekî bibe bes kuştin û jinavbirina neyarî. Bi rastî wexta ez kûr di nav vê pirsgirêkê de diçim; em ji wan bikujin û ew ji me û ne em jinav diçin û ne em dikarin wan ji nav bibin û di herdu çeperan de kuştina mirovan e, çareserkirinek û dawiyeka dilveker û dilxwaz û nêzîk, bi vî tewrî, bi hêsanî nayê berçavên min.

Xwe eger ev berxwedana kurdan ya bi sedan salan nebûya niha em jî mîna gelek miletan ne li ser axa welatê xwe bûna û dibe ko navê me jî bi yekcarî li dinê ne bûya. Lê ez, carna wekî matmatîkê dihejmêrim, ka ji destpêkirina şerê çekdar, me çend serkeftin û destkeftin bi dest xwe ve anîne û çend ziyan bi me keftine. Ya rast encam ji min re ne dilşaker e.

Ma hema ew mirovkuj û dirunde, xwe em jî xwe weke wan lênakin. Em li dijî wan in çunkî em di rastiyê de li dijî reftar û kiryarên wan yên ne baş û ne mirovane nin. Evca heke me jî mîna wan kir, weko wan hizir kir û weko wan reftar û kiryar kirin, ev em jî bûn kupiyeka wan û kesîtiya wan.

Ev ez çi dibêjim, nê em li mala xwe rûniştine û me axa çi kesekî dagîr

nekiriye û me çi milet bindest nekirine, ew in; ji welatê xwe hatine û axa me dagîrkiriye û em jî bindest kirine û ji her mafekî mirovîtî û millî bêbehir kirine. Bi top û tank û hemû cure çekên xwe yên sivik û giran û jinavbir êrişî me dibin û dibêjin hûn tune ne. Ew ne me weko milet diniyasin û ne jî bi çavekê mirovîtiyê li me dinihêrin. Lê, mirov ya rast bibêje, ew tadariyê li miletê xwe bi xwe jî dikin, lê tadariya wan ya li ser me deh qatî wê ye.

Carna ez şerê pêşmergetiyê û bi xwe jî weha ye, weke qonaxeka berwext dibînin, weke fişarxistin bo ser dijminî, tengavkirina wî bona ko rastiyê qebul bike û bi pêşmergeyan re rûne û li ser daxwazên wan gift û goyan bike û mafên mirovî û miletê me bipejirîne, dibînim. Xwe, di piraniya wî prosesî de dijminê dagîrker dixeyide û dijwariya xwe zêdetir lêdike û bi wî awayî miletê me perîşantir dibe û ziyanên mezintir digehinê. Lê di eynî wextî de, digel zêdebûn û bilindbûna pêla zordarî û tadakariyên dagîrker û diktatorî, riq û kîn û berxwedana miletî û opozisyonê mezintir û berfirehtir lê dihêt.

Lê mixabin, digel hindê ko me ew hêza leşkerî û abûrî ya dijminî di dest xwe de nîne, em di nav xwe de jî ne yek in û muxtar û gizîrên me pir in û kes ji wan, xwe ji yê din kêmtir nabîne û her yek xwe ji hemûyan çêtir û zîrektir û zanatir û lêweşawetir dibîne û her kes xwe bi rêber û serok dibîne. Bi vê serreqiya wan, barê miletê me sedqatî girantir bûye û rê li ber dagîrker û siyaseta wan ya tepeserkrina me hêsantirbûye.

Wextê ez helbesta Xaniyê nemir ko berî ji 300 salan bêtir di Mem û Zîna xwe ya navdar de nivîsandiye bi bîra xwe tînim, ez pir li ber xwe dikevim, hingê Xanî nivîsandibû:

Ger hebûya me itifaqek
Vêk ra bikira me inqiyadek

Rom û ereb û ecem temamî
Hemiyan ji me re dikir xulamî

Tekmîl dikir me dîn û dewlet
Tehsîl dikir me ilm û hikmet.

Berî hinde sedsalan êşa me xuya ye, derdê me li ber çav e û ji me re hatiye destnîşankirin û em dibînin û encamên wî li ber çavên me nin; ji hev ve-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

qetyan û neyekgirtin û birakujî û xwegirêdan bi dagîrkeran û xizmeta wan û siyasetên wan û hê em dev jê bernadin. Ma gelo, heta eger rast be ko aqilê kurmancî dereng tê serê wî, ma ew derengî bû çi?! Ne herê, ez ji derheq babetekê weha dernakevim û tê de berzedibim. Ez nikarim, yan jî min ew şiyan û pêçêbûn nînin ko pê bikaribim ya çêtir û bi xêr û bêrtir ji vê rêya heta niha miletê me bi dest xwe ve girtî yan hinekan jê re hilbijartî û jê re kiriye rêbaz, ji xelkê xwe re peyda bikim.«

Salek tê hebû ko Şêro û hersê hevalên wî bi hev re di çalakî û xebatên xwe de berdewam bû. Gelek kiryar û tevgerên partîzanî li dijî çeper û senger û binikên leşker û dam û dezgehên dagîrkerî kirin. Xelkê deverê ew baş nas kirin û wan jî xelik baş nas kir û herdu alî ji hevudu û arîkariya yekudu dilrazîbûn.

Wan qet hest bi bêzarî û mandîbûnê nekir. Her gund û her malek, gund û mala wan bû û xwecihên deverê ew bi bira û kurên xwe dizanîn. Pêşmerge bi hêvî bû, ji ber ko miletekê weha xweragir û merd û xwegorîker li pişta wî bû, milet jî ji hêviya rizgarbûn û serkeftina heqiyê bi ser neheqiyê de çiknebûbû, ji ber ko pêşmergeyên weha nebez û xwegorîker û xwedan sinc û tor berevanî jê dikir. Weha pêşmergetî û milet, bi dîtina Şêroyî, timamkerên hev bûn û bê hevudu peyda nedibûn.

Demekê dirêj bi ser de derbas nebû û rêxistinên siyasî yên kurd, bi pêşmergeyên xwe ve, hatin qadê. Berî karesatê yek parta mezin hebû ko nûnertiya tevgera rizgarîxwaza kurd li başûrê welatî dikir, lê piştî şikestina mezin, weke mêşa hingivînî, kunmêşê şilxe ji xwe dan, lê ka dê kîjan bi hingiv be hê ew ne xuya bû.

Di gel hatina çekdarên partê bo deverê karê her çwar hevalan yê hevbeş nêzîkî dawiya xwe dibû. Ji ber ku, her ji destpêkê, mebesta wan ne avakirina çi part yan çi leşkeran bû û bi hatina hêzeka rêxistî bo deverê şêweyê xebata wan jî hate guhertin.

Hindî Segvan û Dildar bûn, wan xwe da bo nav rêzên pêşmergeyên parta, ko di devera wan de xebata wê ya siyasî û çekdarî hebû. Bêwarî weko Şêroyî xwe li gundên wan deveran vedihewand û di katê pêwîst de herdu arîkarên pêşmergeyan bûn û ew di bersînggirtina êrişên dijminî de bo ser deverê her tim beşdar dibûn.

Şêroyî dil pir li ser hebû ko bi awayekê rêxistî xebata xwe ya nîştîmanî bike û li gor dîtina wî eger milet û xebata wî ne ya rêxistî û bi serûber be encamên wê xebatê jî dilxwaz û baş nabin. Lê, wî ne dixwest di pirseka weha de lezê bike; ditirsiya ko ew hemû, ya ko ji partê, li ser partê tê gotin

û di belavokan de digihîje destên wî, ne weha be û her weko caran be û wan ders ji tecrube û bi serhatiyên xwe bi xwe jî ne wergirtibin. Lewma wî xwe girt heta ko ew çêtir û nêzîktir siyaset û kar û xebata wan partan nas bike û paşî biryara xwe bide.

Ya ko di navbera hêzên serekî û yên biçûk jî de diqewimî ew gelek ditirsand; tirsa wî ew bû neku ev hêze wê kerb û kîn û hevrikatiya xwe ya şexsî û siyasî di qada xebata îroyîn de sax bikin ve. Û welê hat û bi taybetî di navbera dû hêzên serekî de. Her aliyekî deverine xistine bin destên xwe û li aliyê din qedexe kirin û her terefekî xwe ji yê din bi şoreşgertir û çeptir danî. Çeptir; ji ber ko wan şoreşgerbûn û çepbûn yan welatparêzîbûn û çepbûn kirine dû peyvên pêkvegirêdayî, welê kirin ko nabe, di ferhenga siyasî ya kurdî de, ew herdu peyv, bê hevudu hebin.

Belê welê hat, yê ko di çaxê axiftinê de navên Lenîn û Marks û Encils û Fîdel Kastro û Gîvara û Mao û peyvên markisîzm û lenîninzm û madiya diyalektîk û madiya tarîxî û htd. ji devî dernekevin, ew ne mirovekî şoreşger e û çi ji welatparêziyê nizane. Hemû tişt têkelbûn; xebata neteweyî, xebata çînayetî, şerê çekdarî, şoreşgerî, xinizkarî, çeprewî, burjuwa û bê hejmar tiştine din ko diviyabûya ew tevlihev nebûna, têkeldibûn.

Şerê navxwe yê hêzên çekdar yên Kurdistanê bû rastiyek û berfirehtir bû û senga herî mezin kete ser hindê ka kîj hêz dê ya din bişkêne û dê wê li cem miletî rûreş bike. Miletê hejar û perîşan ko çavên wî li qurtalkerên wî bûn ko hev bigirin û bi hev re kar bikin û wî zû ji wê qurbeseriyê rizgar bikin, dît ko tişt berûvajî daxwaza wî çê dibin û serkêşên miletî, miletî dikin parçe parçe û kiş dikine hevûdu.

Ya ji hemûyan jî zehmettir, dîtin û lênerîna miletî jî di destên wan de bû; yek ji ber ko piraniya miletî nexwendewar bû û yê du rêzrizk jî dizanîn xwe li ser wan dikire paşa û zana û miletî jî jê bawer dikir û guhdariya wî bi dilê xwe yê sax dikir. Ya duwê, rojname û radyo, yan yên hêzeka siyasî ji wan hêzan bûn yan jî yên hukumetê bûn û weha çi tiştekê serbixwe nebû ko rastî jê bigehe miletî û weha bes fîkreya wan hêzan yan ya hukumetê digehişte miletî û weha dîtina miletî jî ji dîtina wan çêdibû û weha milet jî hevrûşî yekudu dibû.

Şêro ji metod û siyaseta navxwe ya hêzên siyasî yên di qada xebatê de bûn, bêzar bû, lê hêviya wî di hindê de bû ko rêçare heye eger serkêşên partan hez bikin problemên navxwe çareser bikin û senga xebata xwe ber bi armanca hevpişk ya nîştîmanî bajon.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Wî bi çi rengekî veger bo nav deverên li jêr kotrola hukumetê, bi wî destûdarê hukumetê pê desthilata xwe birêvedibir, nêzîkî hizra xwe nedikir û çi çare di wê de ne didît. Wî çi gêngaşe li ser wê manê di deverên rizgarkirî de nebû, lê ko bimîne û şerê birayê xwe yê kurd bike, bes ji ber hindê ko dîtin û hizir û baweriyên ji hev cuda hene, ew bi çi rengekî li gel nebû û bi dijwarî li dijî hindê bû.

Rewşa navxwe ya çirhayî û dirhayî ya heyî, ew tûşî şerenîxeka dijwar ya nevxweyî kir û dikir nedikir nikaribû bi xwe çareyekê ji pirsgirêkê re peyda bike. Alternatîv jî di serûberekê weha de, ko şer bû û çekdar û çek ziman bû, pir zehmet bû ko bêt û cihê xwe bi metodên baş bike. Diviyabûya ew alternatîv yan girêdayî hêzekê ji hêzên serekî bûya yan ew jî biketibûya şerî digel û eger wê şer jî nekirbûya, ew dê bi topizê hêzê bihtaya bêdeng kirin.

Tişt hemû di nav wî de ketine serêk û pêwîstiya wî bi kesekê nêzîk û hebekê zana hebû ko pê re wan probleman munaqeşe bike. Hate bîra wî hevalê wî yê biçûktiyê Zîrek. Zîrek di wî heyamê dawiyê de bûbû mamosteyê matmatîkê li xwendingeha navincî ya bajarkê Bamernê. Zîrek jî di zaroktiya xwe de li bajarê Mûsilê bû û wan li wê derê hevudu nas kiribû. Zîrek ji wan kêm kesan bû ko pir kurdistançî û têrrewşenbîr bûne. Şêroyî biryar stand ko biçe cem Zîrekî, hem bo seredan û hem jî bona ko digel wî, li ser rewşa welatî biaxive.

Hêzên hukumeta Iraqê bi roj dikeftin hundurê Bamernê û bi şev ji tirsa pêşmergeyan jê derdikeftin, lewma Şêro jî bi şev, weko her pêşmerge û fîlarbûyekî çû wê derê.

Dema Zîrekî dergeh vekirî, bawer ji çavên xwe nekir ko ew Şêro ye, hevalê wî yê biçûkîniyê, herdu çûn ser û stuwên yekudu. Zîrekî zanîbû ko Şêro li deverê pêşmerge ye û weko endamê parta »X« û pêşmergeyekê wê yê mêrxas, nav û dengê wî çûye. Zîrekî bawer dikir, ko çawa gotina mezinan dibêje »çiya bi çiya nakevin, lê çav bi çavan dikevin«, dê ew û Şêro jî hevudu bibînin, lê ne weha ji nişkan ve.

Zîrekê zegurd, birinc û avika mirîşkê ya nîvro ji xwe re durustkirî danî ber mêhvanê xwe û paşî ça jî çêkir û di ber çavexwarinê re axiftinê axiftin kêşa û ji bîrhatinên zaroktiyê û kûlanên Mekawî û Dekit Berge û Cemmase û Seriçxane li Mûsilê hatin bo ser perîşaniya milet tê de û pêşmergetiyê û şerê birakujiyê. Zîrekî dest bi pirsyarê kir û gote Şêroyî:

— Ma ev hûn çûne çiyayî û bûne pêşmerge da şerê hevudu bikin yan da me ji bin vî barê giran qurtal bikin? Baş e ma hûn di partên xwe de

rexneyê li serkirdayetiyên xwe nagirin û nabêjinê ko eve ne daxwaza we ye û divê ew dev ji van çewtiyan ber bidin û hêzên xwe ji pêxemetî miletî û parastina berjewendiyên wî yên berz û pîroz bidin yek?

— Berî her tiştekî birayê delal ez ne endam im di çi partekê de, Şêroyî dest bi şirovekirina rewşa xwe kir. Ez, her ji ber van egeran bi xwe jî ne bûme endamê çi partekê ji partên di qadê de. Ez, bo agadariya te, niha bes di bergiriya millî de me. Ya ji dest min, bo çakiya xelkê me û parastina deverên rizgarkirî têt, ez dikim. Ez, li dijî êrişên leşkerê Iraqê bo ser deverên azadkirî hemîşe bi pêşmergeyan re me.

Zîrekî bi guhên xwe yên guhişî û bi mereq guh dida axiftina Şêroyî û bi taybetî dema qala şerê navxwe dikir û ka çend pê diêşiya. Zîrekî, ji peyivîn û livîna navçavên wî û xema li ser dêmê wî xuya, dilsoziya wî ya rastîn bo miletî û doza wî dît.

Şêro nikaribû fêm bike ka ew çima hêzên kurd ko hê azad nebûne û hê dewleta wan çênebûye, şerê hevudu dikin û berî azadkirina Kurdistanê ji dest dagîrkeran, wê di navbera xwe de li ser xwe dabeş dikin.

Zîrekî dizanî kûdera Şêroyî diêşe, ji ber ko ew jî wekî wî û weko piraniya kurdan bi wan bûyeran diêşiya. Zîrekî dizanî ko pirs pir zehmet e , ji ber ko yên li serî guh nadine binî û eger guh bidinê jî, dê hîngê guhê xwe bidinê heke hat û ew dîtin di berjewendiya wan de be, yan heke hat û çi rêyên din di dest wan de neman û neçar bûn.

— Her kurdekê bêhna welatparêziyê jê bihêt dê li dijî vê rikeberiya malxerabker û birakujiyê be, Zîrekî raya xwe ji Şêroyî re anî ziman. Ez, her ji destpêkê li dijî van metod û kiryarên şaş û nebaş di tevgera azadîxwaza kurd de rawestiyame û min, bi awayekê vekirî, rexne li wan kêmasiyan girtiye. Ez, ji ber hindê jî gelek caran, bi awayekê ne ru bi ru, hatime agehdarkirin ko ji min re ne baş e ez bi wî şêweyî qala filane û bêhvane partê dikim. Lê belê, min heta niha guh nedaye wan û çi dikin bila bikin. Wextê ez dihêm ser altarnatîvê, ez pê re me, eger tiştekê nû û çêtir ji xelkê me re pê re be. Xwe, min di vî warî de pêngavine jî havêtine; piştî şikestina 1975-ê, min û hevaline xwendekar rêxistineka kurdî damezrand. Armanca me ya serekî û ya ji hemûyan giringtir belavkirina bîr û bawerên azadîxwaz bû di nav xelkê me de.

Piştî demekê xuya bû ko rêxistinine din jî, ji wî terzî hebûne û piştî danûstandinên me digel hevûdu, me û wan rêxistinan hevgirt û rêxistineka mezin jê peydabû. Hinekan xwestin wê bikin partek, lê em grupa birêveber ya wê li dijî wê hizrê rawestiyan û bi dîtina me, em ne di astê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hindê de bûne ko em bibin parta altarnatîv. Ji ber wê biryara me, gelek endaman dev ji wê rêxistinê berda.

Piştî şerê birakujiyê dest pê kirî, me dît ko gera rola me hat ko em tiştekî bikin. Evca, me di komîteya birêveber de pêşniyarek pêşkêşî hevalên di rêxistinê de kir û ew pêşniyaz bû biryar; ko her çend endam bikevin nav hundurê partekê û dest bi belavkirina van bîr û baweran di nav rêxistinên wan partan de bikin:

— Birakujî xinizkariyeka mezin e û ew çarenivîsa gelê Kurdistanê têxe nav xetereka mezin û di xizmeta siyaset û berjewendiyên dijminî de ye.

— ko divêt pêşmerge birayê xwe yê kurd nekuje û nerazibûna xwe bi devkî, bi nivîskî, bi çekdanînê diyar bike.

— Berevaniyê ji karê hevbeş yê kurdistanî û pirensîpên demokrasiyê û sîstema pirpartîniyê û hevgirtina wan ji bo bergirîkrinê ji berjewendiyên neteweyî û nîştîmanî yên bilind û ji bo bicîanîna armancên serekî yên bizava rizgarîxwaza Kurdistanê di azadî û aştî û parastina mafên mirovî û demokarasiyê de li Kurdistanê bikin.

— Çêkirina bereyan yan parlamentoyan di her parçeyeka welatî de û durustkirina eniyeka hevbeş ya hemû Kurdistanê ji bo hevkarîkirin û karê hevpişk yê kurdistanî di nav tevgera azadîxwaz de, li her çwar parçeyên welatî û kurdên sovyetistanê û welatên din.

Zîrek vê re çû û got:

— Ev ji erkên serekî yên me nin û hevalên endam bi giştî digel biryarê û bicîanîna wê bûn û biryar ketiye jiyanê jî. Mebesta me ne ew e ko rêxistinên van partan li dijî serkirdayetiyên partên xwe serî hil bidin, nexêr, lê em dixwazin ko ew, tiştê xelet û ne di xizmeta gelê Kurdistanê de be, qebûl nekin û hewil bidin serkêşiyên xwe qayîl bikin ko dev ji wan çewtiyan ber bidin û siyasetên xwe yên xar û vîç biguherînin. ko senga xebata xwe li cihê ko bi hemû ve bêxin ber xizmeta partên xwe, di piraniyê de bêxin ber xizmeta gel û welatê xwe, ko siyaseta kevin ya hemû ji bo partan biguhorin bi siyseta hemû partî, bi hemû şiyan û pêçêbûnên xwe ve, ji bo xizmeta gel û welatî.

Axiftina wan dirêj bû û dumahîk diyar ne dibû û diviyaba Şêro berî berbangê ji gundî derkeftiba û hê mala xaleta wî ma bû û diviyaba ew çûba seredana wan jî heke da dayika wî pir jê bixeyide eger pê bizanîba ko ew hatiye Bamernê û neçûye seredana wan.

Mala xaleta wî ji mêvanan pir bû, hin gundî û hin jî pêşmerge û rêving bûn. Piştî bi xêrhatin û pirsa kes û kar û rewşa wan, suhbeta dîwanê ger-

im bû ve, di wî wextê de ko keça xaleta wî jê pirsî:

— Erê Şêro! Dîtina te li ser vê birakujiyê çi ye?

— Ma ez çi bibêjim, Şêroyî bi vî awayî dest bi bersivdanê kir. Ya ez dizanim ev kare karekê bê aqilane ye û şerim û fihêtî ye bo van rêveberên me ko birakujiyê têxin nav me. Bêguman her kesekê nîştîmanperwer û dilsoz li dijî pevçûna navxwe ya çekdar e, lê ew bes nake, divê her kes ji me wî helwêstê xwe aşkira bike û rexneya xwe bigehîne wan aliyên ko birakujî li ser destên wan tête kirin. Neyar û dijminên miletê me bi milyonên dînaran li ser hindê dimezixînin bo ko kurd yek negirin û xelkê Kurdistanê bi hefka yekudu ve bin û şerê hevudu bikin. Evca bi awayekî îndîrekt terefên beşdar di şerê birakujiyê de xizmeta van nehezan dikin û roja serbestbûna gel û welatî gîro dikin û bi zehmettir lêdikin. Bêguman, her kurdek dizane ko em hindî nebin yek û hêz û zanîna miletê xwe nedin ser hev, em nikarin zora dijminên xwe bibin û neşên miletê xwe ji vê perîşaniya tê de azad bikin.

Şêroyî dixwest hema her li dijî şerî biaxive, lê çi peyv û hizrên nû nebûn û hema her dubarekirina eynî peyv û hevokan bû. Spêde nêzîk dibû û neçarbû ko xatra xwe bixwaze û berê pêyên xwe bide ve ber bi devera Berwarî Bala. Di rêya vegerê de Şêroyî hest bi hindê kir ko barê wî sist bûye û xwe di wî helwêstê xwe de, nedît yê bi tenê, lê berûvajî wê; wê dît ko piraniya xelkê welatê wî xwedî helwêstê wî ye. Lê problem di hindê de bû ko piraniyê helwêstê xwe bi ziman ne xistiye, lê bi lênerîna wî da xuyakirina helwêstî pêngava piştî wê be.

Ya keyfa wî pir pê hatî ew bû ko milet hişyar û çav zil bû. Bi dîtina wî di rewşeka weha de, diviyabûya wan partan dev ji wan çewtî û kêmaniyan bebidana, heke dê milet ji wan dûr bikefta û dê ew bimana bi tenha serê xwe weko rêxistinine biçûk û bê xelk. Û bi hizra wî, bê miletî jî çi rêxistinek nikare pêş bikeve û zû lawaz dibe û gelek xwe li ser pêyan ranagire.

Ew nêzîkî nîvro gihaşte gundê Çem Seyda û yekser çû mala Bêwarî, ko piştî jinanînê li wir binecihbûbû. Di mala Bêwarî de, ew ji westiyan û nenivistinê yekser raket û nivist. Êvarî, Nermînê, jina Bêwarî, Şêro ji xew rakir bona ko şîvê bixwe. Li ser sifrê û li ber xwarinê suhbet çû ser şûkirin û jinanînê. Ew ji mêje bû Nermînê kiribû dilê xwe ko ji Şêroyî bipirse ka ew dixwaze jinekê jê re bixwazin û eger wî pêwîstî bi arîkariya wê hebe, ew ya amade ye û di gundî de keçine hene ko hez dikin şû bi wî bikin û wan ji Nermînê re gotine ko li ser wî babetî tiştekî ji Şêroyî bizane û wisa Nermînê pirsyar jê kir.

— Ez jinê bînim? herê...herê, hema ew ya mayî ko min nekirî, Şêroyî bersiva Nermînê da. Bi Xwedê min taqeta çi jina nîne û hema hosa xweştir e.

— Hey malxerabnek, Bêwarî li ber devê wî da. Segvanî yê ko nefret ji jina dikir, jinek xwestiye û mehir jî kiriye û dê di van nêzîkan de vebiguhêze. Evca çima tu xwe yaxî dikî û hewil nadî xwe ji wan hizrên xwe yên kevin azad bikî. Nê jiyê me diçe û ya diçe navegere û kesek ji me heta hetayê xurt û genc û li ser xwe namîne. Divêt li bîra te be, heke mirov ji hêza xwe keft çi bi axînkrahêlan û peşîmaniyê nahête guhertin.

— Segvanî jinek xwestiye û ez nizanim? bi mendehoşî Şêroyî ev pirs kir.

— Aha niha hate bîra min ko diviyaba min gotiba te, çinkî wî xeber ji te re jî şandibû lê tu li vir nebûyî, Bêwarî anî bîra xwe. Û divê em herin daweta wî. Tê bîra te, wî çawa henekên xwe bi min dikirin û digote min here rûne ber tenişta hurmetekê û zaroka çê bike. Aha nuke wî Segvanê ko xwe ji jina dida paş, keçek ji Çelê xwestiye û wî jî xwe gihande karwanê me û tu di zegurdîtiyê de, bi tenê hêlayî.

Van gotin û xeberên Segvanî û jinanînê kartêkirina xwe li ser wî hebû, lê çi negot û bi xwe re di nav xwe de gote xwe:

— Yê dizane dizane û yê nizane baqê nîskan e. weko kurd dibêjin »sotim nayê gotin« bes ma bo kê bibêjim û dê bighîje kûderê.

— Keko Şêro bilind nefire heke dê ser û ser û bi erdî bikevî, Nermînê axiftin careka din arasteyî Şêroyî kir ve. Di gundî de gelek keçên ciwan û xweşîmank û bi kêrhatî hene û wan çavên xwe danîne ser te, lê tu çi pûte bi wan nakî. Evca lezê bike heke piştî çend salekên din ya mê be bi dest te nakeve.

Şêroyî bes guh dida wê û li ser xwarina xwe yê berdewam bû. Piştî xwarin bes kirî û xwe ji ber sifrê daye paş, perdaxa avê bi ser devê xwe de kir û pala xwe da balîfkekê. Berê xwe da Bêwarî û Nermînê, yên ko çaverêyî axiftinekê bûn ko ji devê wî derbikeve û paşî hêdî û li ser xwe got:

— »Eger we ya rast bivêt, ez heta niha di wê bawerê de bûm ko jinanîn bo kesên xwe bi şoreş û pêşmergetiyê ve girêdidin nebaş e. Çunkî, bi hizra min jinanînê pêwîstî bi akincîbûnê heye û şoreş û pêşmergetî neakincîbûn û paşerojeka ne xuya û ne di destê mirovî bi xwe de ye.

Jin û jiyana rojane ya navmalê û berpirsyariyên malê dibin asteng di rêya xebata rojane ya pêşmergeyî de. Canê pêşmergeyî li ser destên wî ye û nabe li direka destnîşankirî bimîne û divêt yê livok û civok be û her tim

di tahluke û xeterê de ye. Dema diçe operasyonekê nizane ka dê bi saxî vebigere yan jî dê hête kuştin. Divêt pêşmerge xwe bi hemû ve bide ber xebatê ji bo bi destveanîna mafên gelî yên mirovîtî û neteweyî û bi wê xebata xwe ew ji miletî re dibe sembol û hêvî û milet xwe dihêle bi hêviya xebat û xwefîdakariya wî ve. Lê çaxê pêşmerge jinê tîne û malbatekê dadimezrîne, wê gavê ew wext jê re namîne. Ji ber ko çaxa mirov jinê tîne divêt mirov bizanibe ko jinê û malê û paşî zarokan û bixwedîkirina wan pêwîstî bi wî û wextê wî û pêwîstî bi pereyan û xawrinê heye û çi tiştek jî ji kulînê nayê xwarê.

Bi destxistina pereyan jî, ji bo birêvebirina jiyana navmalê ya rojane pêdivî bi karkirinê heye.

Pêwîstiya malê bi xwarin û vexwarin û xizmet û sxbêrîjêkirina zarokan û tiştine din heye. Evca eger zilamî ew berpirsyariyên navmalê û berpirsyariyên xwe li hember jina xwe bicîneanîn dê problem hêne pêş. Ji hemuyan jî giringtir nêzîkahiya mêrî ji jinê ye, ko ew bi başî cih negire jin nerazîbûna xwe diyar dike û dibe pitpita wê. Pit pitê dike ji ber ko barê giran keftiye ser milên wê bi tenê û di civaka me de, ya ko mêr tê de serdar, hemû tişt bi dest jinê nayên bicîanîn û weha mal dibe dozex û jiyan li sinûrekê xerab radiweste.

Eger mirovî guhê xwe baş da malê û bi erk û berpirsyariyên xwe li hember wê rabû, wê gavê wext bo miletî û wê xebata rojane namîne û bi wî rengî jî pêşmergetî nayê kirin. Hema em niha li van deran bi çavên xwe dibînin ka çawa, ji bêgaviyê, gelek ji pêşmergeyan dev ji pêşmergetiyê ber didin û berê xwe didin bazirganî û qeçaxtiyê bona ko mala wan ji dest wan dernekeve û bikaribin wan ji birs û muhtacbûnê biparêzin. Xwe heke pêşmergeyî jêderekê mehane bo jiyanê, têra xwe û mlabata xwe hebûya, hîngê rewş bi vî terzî ne dibûya.

Ev, dîtin û awirên min bûn di warê jinanînê de, lê eve demek e, roj bi roj, dîtineka din li cem min cih digire.«

Bêwarê ko bi jina xwe re, weko her gav ko Şêro diaxift, bi mereq guhdariya wî dikir, peyivî û zû gotê:

— De, Xudê xêr bike, belkî dawiya vê dîtina te ya nû jinanîn be.

— »Ez gehiştim wê rastiyê ko weha nabe«, Şêro vêra çû û axiftina xwe domand. »Çunkî min gote xwe, pa eger hemû kurên Kurdistanê xwestin bibin pêşmerge û ji ber hindê jin neanîn, hema bi wî awayî eve me bi xwe bi destên xwe tovê xwe birand. Bêguman şaneya biçûk ya her komelekî mal e, bi damezrandina wê, rê li ber zarokbûnê û bixwedîkirin û mezinki-


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

rina zarokan vedibe û weha hebûna miletî tê parastin.

Û heta dawiyê jî weha nabe; çi zû û çi dereng dê serhildana gelê me rengekê din bi xwe ve bîne û dê, eger ne tevaya miletî, piraniya wî, bi awayekê dîrekt, beşdarî xebata xwe ya nîştîmanî bibe. Xwe xebat ji bo azadiya miletî ne bes erk û karê zilamî bi tenê ye lê ew bi heman şêweyî kar û erkê li ser milên jinê ye jî. Ez dirêj nakim û serê we bi vê felsefeyê gêj nakim. Kurt û kurmanc, gava mirovî hevaljîna xwe dît û dilê wan kefte hevudu û bikêr yekudu hatin, ya çêtir ew e, hindî zûtir e, ew şahî û govenda xwe bikin.«

— Ma tu vê ji kê re dibêjî, hema te ji her kesekî bêtir pêwîstî bi van şîretên xwe heye, Nermînê xwe negirt û ya di dilê xwe de danî ber wî. De tu jî hiçka hilbide û binkofkekê ji xwe re peyda bike.

Weke carên pêşîn, wê carê jî Şêroyî xwe ji gêngaşeyê bê biryar hilanî û perde ji ser dilê xwe ne hilanî. Di nav xwe de hest bi wê pêwîstiyê dikir û gehiştibû wê rastiyê ko jin ji wî re jî, mîna her zilamekî, giring û pêwîst e. Ma ew da heta kengî wî dehbeyê xwe bi destên xwe rehet bike û xwe li ber çavên xelkî bi sofî îne pêş? Wî wê gavê hizra hindê dikir û ji wê ditirsiya neku ew bi negatîvî kar bike ser psîkolojiya wî û di wan dawiyan de, gelek ji malxulyan û xewnên wî girêdayî jina û laşê wan bûn.

Belê, her çend e wî ji çi kesekî re qala hindê nekiribû, lê wî biryara xwe dabû ko ew li dawiya jiyê xwe nebe mirovekê girêlok û ji xelkî veder, lê ew jî jiyanê bi awayekê normal bajo û jinekê ji xwe re peyda bike. Xwe, wî, di wan heyaman de, ji her wextekê dîtir pitir, hest bi hindê dikir ko pêdiviya wî bi kesekî heye ko bikaribe ligel wî, bê şerim, bê çeplêdan û badan, danûstandinên xwe bike. Kesek hebe, gelek ji wî nêzîk be, hez ji wî bike, wî fêhim bike û ew jî hez jê bike. Kesek be, baweriya wan bi hevudu hebe, bikaribe dilê xwe jê re vebike û nihîniyên xwe bêxe ber, nava xwe li ber bikelêşe, û bi dîtina wî kesên weha jî da cotkên jin û mêran bin.

— Lê ew jin dê kî be? ev pirsyar ji xwe kir.

Digel pirsyarê yekser hizra wî çû ser Nazenînê. Berî çendekê, dema dayika wî hatibû seredana wî, gotê ko hê Nazenîn li benda te ye.

Mala Nazenînê li Mûsilê bû û ew taqaneya bab û dayika xwe bû. Babê wê paleyê avakirina xaniya bû. Nazenînê berî salekê xwendina xwe ya amadeyî bi dawî anîbû û li wê salê li Zankoya Mûsilê li fekulta fîzîkê dest bi xwendina xwe kiribû. Mala wan, bi rex mala Şêroyî wan ve bû û ew hevala wî ya zaroktiyê ya pir nêzîk bû.

Wî di tere genciya xwe de pir hez ji Nazenînê dikir, lê çi cara bisteh

nedikir destê xwe dirêjî wê bike, li cem wî, wî çaxî, karekê weha, berî şûkirinê, gunehkariyeka mezin bû. Dibe ew ji kartêkirina sexbêriya navmalê ya ayînî û konservatîv bû û dibe jî hem bi egera pirtûkên ko wî dixwendin û hem jî temaşekirina wî li filmên hindî, ko pir hez jê dikir, ew sofîtî di nav wî de hatibû çespandin.

Xwe hîngê, film û sînemaya hindî Iraq vegirtibû. Filmên wan di piraniya xwe de drama bûn û li ser viyana paqij bûn. Tê de keç û kuran maçî hevudu nedikir. Di wan filman de babetekê hevbeş hebû, ew jî şerê qenciyê bû li dijî zulm û xerabiyê. Dema mirovî temaşayî filmekê hindî dikir diviyaba sê çwar destmalên wî li ber destên wî ban bona ko wî pê rondikên xwe zuha kiriban.

Evîna Şêroyî jî bo Nazenînên ji wî rengî bû, wê dil û can û giyanê Şêroyî dagîr kiribû û Şêroyî helbest pê divehandin. Rast e hê wê evînê sinûrên dil û çavan derbas nekiribûn, lê çavan jî zimanê xwe heye û bi taybetî li cem evîndaran.

Di cara dawiyê de ko ew bi mêvanî li mala wan bû û bi amadebûna dayik û babê wê, wî ew helbesta ko wî bi wê raçandî ezber xwend. Belê, xwe bisteh kir û stirana dilê xwe bo wê li ber çav û guhên dayik û babê wê got, lê, di helbestê de navê Nazenînê kiribû Sînem. Helbest dixwend û di ber re awirên xwe berdidane ser Nazenînê û bi çavên xwe digotê »ev, viyana dilê min e, ez ji te re dikim diyarî«. Xwe ji awayê xwendina wî û livînên destên wî xuya bû ko ew qala Nazenînê dike û dayik û babê wê jî hest bi hindê dikir, lê wan hez ji Şêroyî dikir û dizanî ko ew kurekê baş û li ber xwe rawestiyayî û rehet e. Heta wê gavê jî, ji wan hemî helbestên wî nivîsandibûn, ew li bîra wî ma bû û car bo car bo xwe digot û weko stiranekê di bin lêvên xwe re dilorand. Helbesta wî jî eve bû:

Ma tu dzanî
Çend aşiq im ez hevalê
şîneçava ez dîn kirim
Li deryaya eşq û vînê niqo kirim
Bo warekê dûr ez birim
Çend hatin ko me jêkvekin
ko te bkirin
ko min bkirin
ko nehêlin evîna me
Bibe hêzek


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

ko hêlîna me dvêt ava
Lê bgirin hemî derava
Lê neşyan û neşên dostê
Ma tu dzanî
Qute quta evî dilî navê te ye
Çaktirîn ziman bo me yar
Axiftina çavên min û çavên te ye
Bawer neke ez te bhêlim ey Sînemê
Li hêvya te her dê mînim
Te çend bvêt û çawa bvêtin
Bawer neke evîna te kesek bişêt
J min bdizîtin
Ya min gotî lêvenabim
Bo vîna me dê her livim
L ber got gotka ez nanivim
Da bo çavên te Sînemê
Ava bikim warekê buhar lê b evîn
ko em pevre tê de bijîn
Bi dil xweşî
Bê kerb û kîn
ko bgirnijîn bo jiyanê
ko vîna xwe himbêz bikîn
J xelkê xwe re bkîn diyarî
Alayek nû bo vî warî
L ser binvêsîn:
B evînê nûdbîtin kavil
B evînê namînin çi kul
B evînê paqij dibin dil
B evînê aş dibin yên sil
Lê bizane ger gotin nebîte kirin
Ger kenya te nebîte zad bo eşqa min
Ger ez nebme berevanê evîna me
Ger çavên min û te yarê
Ger hizr û bîr nebine yek
Baş bizane ne evîn e û pê nabîn yek

Dema wî helbesta xwe dixwend, Nazenîn ji kêf û şerman de sor û sipî

dibû, çav û dêmê wê, bi îşaretine ko bes Şêroyî didîtin, digotine wî »ez jî, ji hemû dil û canê xwe hez ji te dikim û ji bilî te çi mêra nakim«. Şêroyî nedizanî dê ewa bi serî hatî rûbide û dê jiyana wî bi yekcarî hête guhertin. Wê rojê, dema Nazenîn ligel wî hat ber derî û wî xatra xwe jê xwestî, wê gotê:

— Şêro, hişyarî xwe be, tu kî ve biçî dilê min digel te ye. Şêro car û bar diyar bibe. Ew helbesta te pir bi dilê min bû û baş bizane ko ez jî gelek hez ji te dikim.

Wê ew peyvên xwe yên dawiyê zû gotin û ji şerim û kêfa hindê de, kû karî ya di dilê xwe de bibêje lawê dilê xwe, bezî bo nav xanî.

Ew yekemîn peyvên evîndariyê bûn ji devê keçekê bi ber guhên Şêroyî ketîn. Ew evîna wan ya çendîn salan, xwe ji zimanê çav û îşaretên laşî derbas kire qonaxeka nûtir, qonaxa derbirîna evîna xwe bi zimanî û rû bi rûyê yekudu .

Wî ji dayik û kes û karên xwe zanî ko gelek xazgîniyên wê hatibûn û wê bi aşkirahî evîna xwe anî bû ziman û gotibû xazgîniyan »ma ez dê şû bi çend kesan bikim?! Nê ez dezgirtiya Şêroyî me«

Lê, piştî ko Şêro ji zîndanê derkeftî, sîxurên Iraqê bela xwe jê venedikir û ew xistibû di bin zêrevaniyeka dijwar de. Wê reftara polîsên sivîl û rêxistinên be'isiyan ew bêtir pal dida bo nav çeperê berxwedanê li dijî hukumeta faşîst. Lewma, ew di pirsa jinanînê de kuh û sist bû. Digote xwe »pa heke tiştek bi serê min hat, heke ez hatime ve girtin yan hatime kuştin, paşî dê çarenivîsa Nazenînê çi be? Dê bi tenê bimîne«. Ne dikarî wê hizrê bêxe di serê xwe de, li ser xwe qebûl nedikir ko keça ew hez jê dike, tûşî derdeserî û probleman bike.

Ya bêtir jî ew xav kirî dayika wê bû; wê ne dixwest keça wê şû bike. Ew jineka tiral bû, hez ji karê navmalê ne dikir û hindî li bîra Şêro bû, wê her tim digot -serê min diêşe- û bo gerhan û derkeftin û xwarinên xweş jî kes ji wê zîrektir nebû. Wê xwe bi serêşiyê dianî pêş bona ko çi karê navmalê neke û ew hemû bi hêviya Nazenînê ve diman. Nazenînê, di ser xwendina xwe de karê navmalê jî dikir û bo dayikê xweş lê hatibû. Babê Nazenînê hez dikir ko Nazenîn şû bi Şêroyî bike, lê dayik bûbû asteng. Dema ko dayika şêroyî du sê cara ew babet digel dayika wê vekirî, wê digotê:

— Ma em dê kê ji Şêroyî çêtir ji keça xwe re bibînin, lê hêj keça min ya biçûk e û niha ne jina bermala ne û hêj wê xwendina xwe bi dawî ne aniye.

Şêroyî biryara xwe stand û kaxezek ji dayika xwe re şand û kaxezek bo Nazenînê jî pê re bû û di kaxeza xwe de bo dayika xwe, jê xwestibû ko ew, wê kaxezê bigehîne destê Nazenînê û bersiva wê bi destê xwe bo wî bîne. Di kaxeza xwe de bo Nazenînê ev çende jî nivîsî bû:

— »Nazenîn! Min her tu viyayî û her tu divêyî û ez pir ji dil hez ji te dikim, lê ez naxwazim serê te bi arêşe û gîr û girift û sergêjiyên xwe ve mandî bikim. Ez hez dikim, eger min jinek hebe, tu ew jin bî, lê ez te naxapînim û rastiyê ji te re dibêjim ko ez nikarim ji te re çi mala dabimezrînim. Min, niha, çi serekaniyek nîne ko pereyek jê bihête nav destên min û pê bikaribim malekê rabigirim. Ya pêşmergetiyê jî, min ev rêye ji xwe re hilbijartiye û hindî ez yê saxb im û hindî pêwîstiya gelê min bi pêşmergetiyê û her rengekê dî yê xebatê hebe, ez dê li ser berdewam bim. Ez dê li vir pir dilxweş bim eger tu wê hilbijêrî ya ko ji te re çêtir e û bawer bike tu çi hilbijêrî, ez dê pê kêfxweş û şad bim. Eger tu bi min û jiyana min û rewşa ez tê de razîbî û tu birayarê didî ko şû bi min bikî, divêt tu bizanî ko dê jiyana me pevre jiyaneka sext û dijwar be û xweşbûn û nexweşbûna wê girêdayî pirsgirêka gelê me ye û çawatiya paşeroja wê.«

Şêroyî, pir ji dil dixwest, careka din peywendiyên xwe bi Nazenînê re nû bike, lê bersiva kaxezka wî ne hat û bi dîtina Şêroyî nehatina bersivê û bê dengiya wê nîşan bû li ser guhertinekê di helwêstê Nazenînê de, nîşan bû li ser nerazîbûna wê li ser wê paşeroja ko şûkirineka weha wê pêrgî wê dike. Carna jî, Şêroyî digote xwe; dibe ko hê dayika min ne çûbe Mûsilê cem wan û lewma jî bersiv ji cem wê ne hatiye. Û digote xwe; eger hê wê axiftina xwe digel çi kesekî ne gotibe û bi min û vê jiyana min razî bibe, ez dê her di cih de xazgîniyan bişînim mala wê û dê zû daweta xwe bikim.

Şêroyî hizra hindê jî dikir ko dergehekê jiyanê biqute bona ko pê bikaribe wê nûmala xwe pê rabigre û kirîn û firotina pertal û kincan hate ber hizra wî. Wî di nav xwe de pilanek danî ko çend pereyî ji kesekê niyas û pêçêbûyî qer bike û pê dest bi wî karî bike û di ber re jî arîkariya pêşmergeyan di bersîngirtina êrişên dagîrkeran de bike.

Çend rojekên din bi ser ve çûn û dayika wî hate seredana wî. Dayik, wê carê ne weko carên din bi dîtina wî ya kêfxweş bû, Şêroyî weha fêm kir.

Li dema ko Şêroyî berê axiftinê pê re wergerandî bo ser pirsa xwe û Nazenînê, yekser û bi yekcarî xulkê dayika wî têkçû û çav lê sorbûn û kizgiryokê hefka wê girt û berda girî. Di wê gavê de dinya li ber çavên Şêroyî tarîbû û çirîseyê serê wî girt û bi dengekê lerizî ji dayika xwe pirsî:

— Te xêr e dayê!? Çima tu digirî ? ew çi xulî ye bi serê me werbûye, ka

ji min re bibêje?

— Kurê min, serbarê min, Nazenîn nemaye, Nazenîn miriye, ev xebera dayikê di girî û rondikên wê de têkel bûbû.

Wê gavê, te digot qey destekê hesinî dilê wî girt û givaşt û ji sîngê wî anî derê.

— Mir!? bi tingijîn ji dayika xwe pirsî. Kî mir? Nazenîn!? Eve tu çi dibêjî, ma tu dînbûyî? Nazenîn mir?! Çima? Çawa?

Di gel van peyvên xwe kete di nav xirîqêneka girî ya xendiqî de. Dayika wî ew bi girî û rondikên wî ve himbêz kir û di ber wê semfoniya xemgîn ya girî û hinavsotina xwe herduwan de, ew, ya ko qewimî ji kurê xwe re vegêra:

— Li kûlana pişt mala wan çend Misriyekan tenûrxaneyeka nanî vekiribû. Tenûrxane gelek nêzîkî mala wan bû, lewma Nazenîn, her roj spêdeyê zû, diçû wê tenûrxaneyê û nanê gerim ji wê derê dikirî. Spêdeyekê, ji her roj zûtir, Nazenîn çû nanî û nezivirî ve. Hindî dayik û bab û kes û kar lê geriyan lê bi ser hilnebûn û çi jê nezanî. Dûre, piştî çend rojekan, polîs bi ser rastiyê hilbû. Dema wê spêdeyê Nazenîn çûye nanî hê zû bû, ji bilî wê çi kesekê dîtir li wir nebû, bes du nanevanên Misrî li wê derê bûn. Wan agirê tenûrê xweş dikir û hevîr dikire girik.

Zivistan bû û li derveyî tenûrxaneyê baran dibarî û sar bû. Wan herdu Misriyan ew bangî hundurê tenûrxaneyê kir bona ko xwe gerim bike heta nanî li tenûrê didin. Nazenîn jî li ber baranê terbûbû û ji dilekê sax guhdariya wan kir û kete hundurê tenûrxaneyê. ko pêyên wê ketine nav tenûrxaneyê de, her derhal, yek ji wan nanevanan destên wê digire û yê din bi pateyekî devî lê digire bona ko deng ji ber dernekeve. Zû û hê kes li wê derê xuyanebûyî, yekî ji wan dergehên firnê, xepengên wê , anîn xwarê û ji nav de girtin. Herdu tadariyê li Nazenînê dikin û piştî wan xwe pê rehet kirî, wan nizanibû çi lê bikin û wan ne dixwest wê berela bikin jî, ji tirsa neku ya wan kirî ji devê wê derbikeve. Evca, bona ko ew xwe ji wê xelas bikin, radibin wê dikujin û bona ko ew xwe ji kelexê wê xelas bikin, wê dihavêjin di tenûreka agirê wê baş şaryayî de.

Piştî gelek vekolîn û peyçûnan, gumana polîsî kete ser tenûrxaneyê û Misriyan. Ji gotinên cîranan xuyabû ko tenûrxane ji hemû rojan derengtir hatibû vekirin. Diyarbû ko ew mijûlî kelexê wê yê sotandî bûn û ji tenûrê derxist û xiste di nav gînîkekî de û bir û li çolê hişt. Polîsî qedeka pateyî ji fîstanê wê û çend qupçikek ko ji fîstanê wê ketibûn di tenûrxaneyê de dîtin. Dayika Nazenînê ew qeda pateyî û qupçikên polîsî nîşa


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wê dayîn yekser nas kirin û weha polîs piştrast bû ko wan Misriyan ew kar kiriye û ew girtin û paşî kelexê wê yê li çolê avêtî di gînîkî de jî dît.

Eva Şêroyî guh lê bûyî, cîhan li ber çavên wî serêk û binêk kir. Wê rojê ji biçûkan xerabtir berda girî û rondikên xwe bi merdî rijandin. Xeyidîn û tingijîna wî ya bê sinûr bû, her tiştekê ko dihate ber devî digot »de were tadariya be'isiyan bi xwe ji mer re bes ne bû, rabûn Misrî anîn û berdane can û giyanê me, ma ew hatine vir ji bona pariyekê nanî û pereyî yan ji bona ko destdirêjkarî û tadariyan bikin.!?« Şêroyî soz da xwe ko piştî Nazenînê jin lê heram bin. Êdî Bêwarî û Nermînê jî qala jinanînê li cem wî nekir bona ko birîna wî kûrtir lê nebe.

Piştî çend rojekan û ji bona ko xwe ji bîr vebike, Şêro ji gundê Kanîmezinê diçe Kanîbelavê ji bo seredana hevalên xwe Newzad û Rêberî. Herdu ji Bamernê bûn û xizmên dayika wî bûn û hevaltiya wî bi wan re qayim û xweş bû. Newzad û Rêber ji leşkerê Iraqê reviyabûn û li Kanîbelavê akincîbûbûn û wan di bergiriya millî de kar dikir. Herdu hevalan, Şêro di nava gundî de û li dewr û berên gundî gêrand û çûn cem hevaline din jî. Êvarê dereng Newzadî û Rêberî odeya xwe ji wî re hişt û ew bi xwe çûn mizgeftê, ji ber ko wê şevê nobeya wan bû di bergiriya millî de û bingehê vecemyan û raketina nobedaran mizgeft bû.

Şêro jî kete ber kapkê radyoyê û guhdariya nûçe û deng û basan û programên cur bi cur yên çend êzgeyan kir. Bûbû dereng û xewê xwe di çavên wî de wer dikir dema ko dergeh vebûyî û Rêber bi elemtirîka xwe ve xuyabûyî û piştî bi jorkeftî kesekê din jî piştî wî hate jor.

— Eve Mehemed e, îşev mêvanê me ye, Rêberî mêvan bi Şêroyê ko digel dengê dergehvebûnê rûniştî ser cihê xwe, da nasandin. Îro ji Duhokê hatiye, ji serbaziyê fîlarbûye û dixwaze bibe pêşmerge. Mizgeft ya tijî ye û cih tê de tuneye. Bila ev şeve mêvanê me be û em wî subehî bi rê dikin komîteya deverê.

Piştî Rêber çû, Şêro çendekê bi mêvanî re peyivî û paşî herdu raketin ser cihên xwe û nivistin. Di wextekî de Şêroyî ageh ji xwe hebû, her weçku dengek hatê. Serê xwe bilind kir û guhên xwe baş veçinîn, dibîne ko deng ji mêvanî tê. Xuya bû ko kabra ji ber xew diaxift. Lê tiştê Şêro mendehoşkirî ew axiftina mêvanî bi xwe û dubarekirina wî bo eynî axiftinê bû. Axiftina wî gelek bi hevre girêdayî bû. Wî di axiftina xwe de qala tiştekê pir nihînî dikir; wî digot:

— Belê, divêt ez subehî biçim komîteya deverê. Roja pêncşembî biçim bo bin cadeyê, wî çekî û lasilkiya di bin axê de veşartî bînim derê. Ez, di-

vêt vê pilanê, her weko hatiye danan, bi cî bînim. Hêriş jî wisa bête kirin ko kes pê nizanibe ko ez pê re me. Belê, karê min ew e ez şerî di nav pêşmergeyan bi xwe de, di deverên bin kontrola wan de, peyda bikim. Karê min ew e baweriya xelkê bi pêşmergeyan sist bikim û wan li ber yekudu bikim dijmin û neyar. Divêt, ew kes bi cilên pêşmergeyan biçin telba wan kesan bona ko guneha kuştina wan bikeve di stuyê pêşmergeyan de û dê bes bi wî rengî pilana ji min re hatiye çêkirin hête bicîanîn.

Heta berê spêdeyê xew bi çavên Şêroyî nekeft. Hêşta dinya baş zelal nebûyî Şêro ji nav ciha rabû û karê xwe kir û agir, di kuçkê li ber derî de xweş kir û paşî çaydankê avê deyna ser. Guhdariya radyoyê kir û tovê çayê xiste di nav ava kelyayî de, çaydank ji ser agirî rakir û danî nêzîkî pelan bona ko hêdî hêdî, li ser xwe, bimixmixe û demê xwe bigire. Di wan delîveyan de Newzad û Rêber jî vegeriyan mal. Berî ko ew mêvanî ji xew rabikin bona ko pevre sertêştê bixwin, Şêroyî ew herdu birin bo piştmalê ko dengê wan neçe mêvanî eger ne yê nivistî be û ya wî bi şev ji devê mêvanê nivistî bihîstî ji wan re got. Lê herduyan got Şêroyî ko ev ne tiştekê li ber aqil e ko rast be û wan gotê ko mirovine wilo hene ko ji ber xew diaxivin û ew nayê wê maneyê ko ew axiftin û gotinên wan rast in û nabe mirov pê bawer bike. Şêroyî ev şirovekirina wan ne pejirand û gote wan ko ew bawer nake ko ev kese yê vala û paqij be û her serek di bin vî kumî de ye. Lê ji ber dakokîliserkirina Şêroyî, hersê li ser hindê pêkhatin ko ji mêvanî re qala axiftina wî ya ji berxewê nekin û piştî ko Şêro çayê û têştê bixwe û berî ko mêvan bi rê bikeve, Şêro yekser biçe komîteya deverê û digel birêveberên komîteyê li ser vê pirsê biaxive.

Yên li komîteyê jî bawer jê nekir û gotinên wî bi tiştekê ji çêkirina endêşeyî zanîn. Xwe, piştî ko wan navê wî kesî û ka şiklê wî yê çawa ye ji Şêroyî bihîstê, yekî ji endamên komîteya birêveber got:

— Ez bawer dikim dê ew Mehemed be; endamê rêxistineka me ya nihînî li bajarê Mûsilê.

Şêro bi wê gotinê yekcar tore bû û bi komîteyê re bi cirre çû. Serokê komîteyê gote Şêroyî:

— Tu, hindî pirtûk û çîrokan dixwînî, evca li cem te, jiyana rastîn digel xewn û fantasiya di wan pirtûkan de tevlihevbûye.

Şêroyî xatra xwe ji wan xwest û ji odeya komîteya kargêr derkeft, lê ne çû, xwe ligel pêşmergeyên komîteyê mijul kir, li benda ko ew kabra bihêt û bizanibe ka dê reftara komîteyê digel wî çi be.

Piştî çendekê Mehemed hat û digel pêşmergeyekî axift, pêşmerge kete hundurê odeya komîteya kargêr û piştî ew derkeftî, wî tiştek gote Mehemedî û Mehemed çû bo nav odeya komîteya kargêr. Ew demeka xweş ma di wê odeyê de, paşî ew û berpirsyarê beşê rêxistinê derkeftin û wan pevre piyase kir.

Piyaseya wan gelek ne vekêşa, ji ber ko balafirên iraqî hatin hindav baregehê komîteyê û bombeyên xwe bi ser wan de berdan. Cihê komîteyê pir asê bû, geliyekê kûr û dewr û berên wî çiyayên bilind bûn, ji ber hindê jî çi ziyan negehiştin çi kesekî di hundurê baregayî de. Piştî balafir çûn, pêşmerge xuyabûn ve û ew topbarankirin li cem wan tiştekê normal bû. Serê Mehemedî jî diyarbû ve, ji veşargehê derkeft.

Veşargeh hatibûn çêkrin lê çi pêşmergeyan xwe tê de nediveşart, hinekan ji mêrxasiya xwe, xwe ndiveşart û hinekan jî ji şerma hevûdu. Şêroyî viya xwe nêzîkî wî bike bona ko jê bizanibe ka wî çi li ber e bike û dê li kûderê şeva xwe derbas bike, Lê, Şêro yê pişt rast bû ko komîteyê jê re qala ji berxew axiftina wî kiriye û bê guman heke wan ew jê re kiribe, ew dizane ko Şêroyî ew xeber gihandiye guhên komîteyê. Lewma Şêroyî xwe nêzîkî wî nekir, lê xwe li ber wî û livînên wî vena. Piştî bîstekê pêşmergeyekî ew kabra da digel xwe û çûn bo nav gundê »S« û qesta mala xaleta Miryem kir.

Şêro li pey wan bû û ew weha li pişt wan diçû ko ew wî nebînin. Şêroyî dostîniyeka pir qayim digel xaleta Miryem û mêrê wê hebû û wan gelek hez ji Şêroyî dikir. Xaleta Miryem ne bes di gundê xwe de, lê di nav hemû pêşmergeyên deverê û di deverê de naskirî bû û malbat ne bi navê mêrê wê, lê bi navê wê dihat nasîn. Heta kurê wê jî; bi kurê Miryema Îboyî dihat naskirin. Dibe ew jî ji hindê hatibû ko xaleta Miryem jineka bi cerg û zîrek û dilovan bû û di mala xwe de û di mêvandariyê de pir merd bû û jineka têgehiştî û xwedî gotina xwe bû û sedema ji hemûyan jî meztir ew bû ko wê, xwe ji zilaman kêmtir nedidît û di welatparêziya xwe de bi qasî deh zilaman xizmet dikir.

Demekê dirêj pêve ne çû û xaleta Miryem hate derê, bona ko çaydankê avê dabine ser agirê di kuçkî de û çayê ji mêvanan re çê bike. Şêroyî xwe zû vê re gihand û piştî silav û pirsyara saxî û silametiya hevudu Şêroyî gotê:

— Xalet, evro karekê min bi te heye lê nizanim ka tu dê çawa arîkariya min bikî.

— De ka kurê xaletê bibêje ka ew çi xilmet e, heke ji dest min bêt wey

li ser kulovanka serê xaletê.

Şêroyî jî mesele ji serî heta binî ji xaletê re got. Xalet bêhnekê ma bê deng, qey hizra xwe di wê çîroka Şêroyî de dikir û paşî ji nişkan ve got:

— Şêroyê delal, te ya rast bivêt, divêt mirov zû baweriya xwe nede mirovekê weha, heta mirov bi ser rastiya wî hilnebe. Tu xemê jê nexwe, hindî ew li gundê me be, dê bi rêya jin û zarokên gundî, hemû livîn û hatin û çûn û axiftinên wî bigehin min, ko tiştekê bi guman tê de be, ez dê zû nûçeyekê bigehînim te, lê tu van rojan li Kanîmezinê be, bona ko ez bikaribim, di wextê pêwîst de, peywendiyê bi te re dabinim. Di baregehê pêşmergeyan jî de, dê neviyê min Semed, zêrevaniyê lê bike û dê nûçeyan li ser wî, ji wê derê jî bigehîne min. Weha baş e, bi dilê te ye?

— Her ji me re sax û jîdirêj bî, Şêroyî weha spasiya wê kir.

Ew roj duşembî bû ko kabra hatibû komîteyê û heta roja pêncşembî çi tiştekê weha ne kir ko bibe cihê gumanê. Roja pêncşembî û ji ber ko Şêro, hew dikarî xwe bigire, ew bi xwe hate baregehê komîteyê, bona ko ji nêzîk ve zîrevaniyê li wî Mehemedî bike. Wî Mehemedî, di wê şevê de, ko li cem Şêroyî jiberxew axiftibû, gotibû ko dê di roja pêncşembî de tiştekî bike û ew li bîra Şêroyî bû û lewma jî, ew wê rojê, bi xwe hat wê derê û xwest bi xwe kontrola wî bike.

Bû nîvro û Mehemed ji baregehî ne derkeft, Şêroyî gote xwe »dibe ko êvareka dereng ji baregehî der bikeve, bona ko çaxê ko diçe bo bin cehdeyê, kes wî nebîne ». Lê êvara derng hat û şeva tarî jî xwe da dû û kabra ji wî baregehî ne derkeft û bi çi rexan ve ne çû. Hemca, Şêroyî xwe bi hindê qayil kir ko dibe bi şev dereng xwe ji baregehî vebidize, yan jî wî pilaneka din hebe, yan plana wî hatibe guhertin, lewma ew nenivist û hemû şevê ma hişyar û çavên wî li wê odeyê bûn ya ko ew Mehemed tê de bû. Lê Mehemed nederket û têr nivist. Ew li dûrî pêşmergeyan, li cihekê, hebekê veder nivist, bona ko eger jiberxew axift çi kesekî guh li axiftina wî nebe. Çunkî wî pirsa Şêroyî û bihîhstina wî bo jiberxew axiftina wî zanîbû û ew ji hingê were li xwe agadar bû û bi taybetî di çax û cihê nivistinê de ko bi çi kesekî re, di yek odeyê de nenive.

Dema Şêroyî dîtî ko kabrayî. li gor wê axiftina xwe ya jiberxewê kirî nekir, ew sist û xav bû û gote xwe »dibe ko ew axiftina wî, hema bi rastî, jiberxewaxiftin be û bes û çi ser dibin wî kumî de nebin«. Evca, wî biryar da ko dev ji zêrevanîkirina wî kesî ber bide û bizivire ve Kanîmezinê.

Ew di rêya vegerê de, berî ko ji gundî derbikeve, hevrûşî xaleta Miryem bû û piştî ko wê dîtî ko ew naxwaze zêdetir li pey wî kesî biçe, wê ew


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

lêvekir û gotê:

— Dibe ko wî zanîbe yan gumana wî çûye ser hindê ko tu li dûf wî yî û dixwazî rastiya wê jiberxewaxiftina wî bizanî û ji ber hindê biryara xwe daye ko rojê biguhere û li şûna pênçşembî bike eynî. Evca te xwe heta niha girtiye, xwe evro jî li ber vene, ka dê çi jê derbikeve.

Gotina xaletê bi mejiyê wî ve nûsiya, evca wî xwe da rexekî, li hindav rêyê, li benda kabrayî, ka dê kengî der bikeve, da ew bikeve pey û bizanibe ka dê çi bike. Xaleta Miryem çû mal, nanek û hinek penîr di nav de, jê re anî û ew li wê derê bi tenê hişt.

Bû êvar û Şêro pir bêzar bû û ji bê hêvîbûnê rabû ser pêyan û xwest biçe mala xaleta Miryem bona ko tiştekî bixwe, lê careka din xwe nizim kir û xwe da pişt darekê, dema çavên wî ji nişkan ve bi wî Mehemedî ketîn ko ji bareghî der dikeve. Ew ji geliyî, ber bi xwarê dihat û yê bi lez bû. Şêroyî da dû wî, lê ne rê û rê, ji bona ko Mehemed pê nizanibe ko Şêro li pey wî ye. Heta ew gehiştine gundê Çimbilkê û di gundî de kabra li ber çavên Şêroyî berzebû. Şêroyî jî ne dixwest ew bi xwe lê bigere bona ko Mehemed wî nebîne. Lewma çû mala hevalekê xwe û ew heval hinarte nav gundî bona ko bizanibe ka ew kes di gundî de ye yan na û eger li gundî be ka li kîj malê ye û gote hevalê xwe ka ew kes yê çawa ye û çi kinc li ber in. Piştî nêzîkî nîv seetekê hevalê wî hat û gotê:

— Kesek bi wî navî û wan navçav û bejin û cilkên ko te ji min re qalkirîn mêvanê Ahmoyê Keçel e.

Bi wê nûçeya hevalî Şêro ji hindê pişt rast bû ko kabrayî li ber e tiştekê xerab bike. Heke ma dê boçî ji hemûyan bibe mêvanê Ahmoyê Keçel, yê ko bi xwe cihê gumanê bû. Ew Ahmoyê Keçel yê ko hetanî berî salekê jî rênîşanderê leşkerê Iraqê li deverê bû. Ew weko şehrezayekî, ko deverê, bi rê û gund û kunkunîşkên wê ve baş dinase, dikefte pêşiya hêzên dagîrker û ew di rêyên hêsan û veşartî de digehandin her ciyekê wan dixwest bigehinê. Ew berî salekê hat deverê û xwe da dest pêşmergeyan û daxwaza lêborînê kir û wî xwe weko peşîmanekî anî pêş.

Xwe, dibe kesekê xinizkar yan kesekê çewtî kirîn pûşman bibe û li xwe vebigere û çeperê dagîrkerî û dijminê miletî bihêle û xwe bide aliyê miletî û dev ji kar û kiryarên xwe yên xerab berbide, Şêroyî weha hizir kir. Lê bi ya şêroyî, ew kes jî, ji qesta ne hatiye deverê û her tiştek di bin wî de ye. Her ji destpêka hatina wî Ahmoyî bo deverê, Şêroyî ew têbîniyên xwe gihandibûn berpirsên pêşmergeyan li deverê. Li ser wî babetî û vekolîn û peyçûnên Şêroyî yên prîvat, di navbera Şêroyî û wî

hevalê wî de bû gêngaşe:

— Bes heval şêro, ez dibêjim ev ne karê te ye, lê karê van hêz û parta ne, ko dever di destên wan de ye, wî hevalî ev têbîniya xwe xiste berdemê Şêroyî.

— Pismam, ez di vî warî de bi te re me. Ew hêz û part berpirsyarên yekemîn in li hember her pirsekê li deverê, çi negativ û çi pozetîv be, Şêroyî dîtina xwe diyar kir. Lê ev nabe egera hindê ko em bi hindê bes bikin û çavên xwe li ser ya diqewime biniqînin. Bi dîtina min, berûvajî wê, divêt her hevwelatiyek ji me, xwe bi berpirs bibîne û bi taybetî di rewşa me ya evro de. Ev tiştekê giştî ye, ez ji hestpêkirina xwe bi berpirsyariya xwe ya nîştîmanî pê radibim. Ji ber ko xerabkarî di deverê de ne bes part û hêzên wan yê çekdar pêrgî xeteran dike, lê me hemû rûniştivanên deverê tûşî wan xeteran dike. Lewma ez nabînim ko ez tiştekê xerab dikim. Vajî wê, eger her kesek li cihê xwe, xwe bi berpirs bibîne û xemê ji wê berpirsyariya xwe ya nîştîmanî û millî û komelayetî bixwe dê rewşa me sedcarkî çêtir bibe.

— De şêro, manê tu dê her xwe bi yê heqdar derxînî, bila bi ya te be. Lê ez dibînim pêwîst e ko komîteya deverê pê bizanibe, çêtir e.

— Tu rast dibêjî, lê problem di hindê de ye, heke ew pê bizanin, ne dihêlin ez pê rabim û ne jî ew tiştekî dikin, Şêroyê weha bersiv da. Wî xwest wî hevalî qayil bike ko tiştê ew dike ne karekê çewt e û eger başî tê de nebe, her xerabî tê de nîne, lê ya bi zehmet bû. Ew hevalekê wî yê nêzîk bû û guhdariya Şêroyî dikir û mirovekê dilsax bû, lê pir sade bû jî. Şêroyî baş dizanî ew heval dê raportekê li ser wê livîna wî bide komîteya deverê ya parta xwe, lê hêviya Şêroyî ew bû ko ew karê xwe biqetîne hê wî ew nûçe negihandî komîteyê. Xaniyê Ahmoyê Keçel hinekê ji gundî veder bû, li hemberî derê wî xanî darmazî pir bûn. Şêroyî xwe di nav wan daran de, li hember derî mit kir, li benda wî Mehemedî, ka dê kengî der bikeve.

şevê perdeya xwe bi ser gundî de dahêla û filfil kete qona diz û hîzan. Di gel taryatiyê deriyê xanî vebû, ronahiya elemtirîkekê di destekî de hate derê, Şêro ne yê dûr bû û zanî ko yê ronahî di destî de Mehemed bû û kesekê din jî derkeft, lê şêroyî nas nekir û paşî Ahmoyê Keçel jî hate derê. Wan hersêyan da rê û ber bi cehdeyê çûn û Şêro kete pey wan. Pireka biçûk, qesîseyek, di cehdeyê de hatibû çêkirin bona ko ew ava ji aliyê din tê derbasî vî aliyî bibe. Hersê li ber wê pirê rawestiyan.

Şêroyî ew dîtin, daçemyan û livlivîn û di tiştekî de xebitîn. Li cem Şêroyî bû mereq bizanibe ka ew çi dikin, lewma xwe bi hêwaşî û bi dizîkî

ve nêzîkî wan kir. Hewil da ji pişt wan darên ko wî xwe li pişt veşartî berê xwe bide wan, lê hemca nikarî di wê taryatiyê de wan baş bibîne û bizane ka ew çi dikin. Lê dengê wan baş hate guhên wî, ev suhbete dihate kirin:

— Ma min negot we, her weko wan gotiye min, eve ew hemû tişt, di vê çalê de. Eve deh klaşînkof, bîst narincok, du arpîçî, yek dezgehê bêtel, çwar debance û gulleyên wan.

— Panê divêt pilan jî pê re be!

— Rawestin da em baş lêbigerhin, ha eve kaxezek.... hema ew bi xwe ye... eve pilan jî.

— Vêca em dê çi kin?

— Hêşta heşt kesên din jî mane, ew jî dê bihên û bigehin me. Subehî dê bigehin gundê Dehê û divêt ew duzba li vê derê bin.

— Bes hosa bi aşkirahî, heşt kes li gel yek bêne gundî dê me aşkira bikin.

— Yek, ew pevre nahên, lê dê kit kit yan cot cot bihên. Ya duwê jî, ew kes dê weko bazirganan bihên û dewar û tiştên firotinê jî bi wan re hene. Em, her duzba ko ew gehiştin, dê bi kiryara xwe rabin. Ew, roja dîtirê bi roj, dê mijûlî kirîn û firotinê bibin û weha gumana çi keskî nakeve ser wan.

— Baş e, te pere ji bo me bi xwe re anî ne?

— Bêguman û çek jî, we çend bivêt dê bigehe dest we û hema di navbera me de bimîne, hûn dişên hinekê ji çekî jî ji xwe re bifiroşin û hindî em ji hukumetê bixwazin ew dê ji me re bişînin, lê eger hûn çekî bifiroşin, divêt hûn bifiroşin wan kes û terefên ko li dijî van hêzên mezin in.

— Baş e, em nuke çi li vî çekî bikin û em kengî ji vê derê derxînin?

— Em dê subehî hên û çekî bibin gova dewarên min.

Ahmoyê Keçel axiftina dûmahiyê kir û çavên Şêroyî vêketin ko ew ji cihê xwe livîn û ber bi wî hatin. Wî xwe da aliyekî û xwe veşart. Berê wan kete gundî. Şêroyî xwe hinekê girt heta dîtî ko ew ji wî cihî dûr ketin, ji nû, ew ji cihê xwe livî û ber bi wî cihî çû, yê ko ew lê rawestiyabûn û suhbeta xwe lê dikir. Şêroyî di wê tariyê de çavên xwe li wê derê gerandin, berê xwe dideyê, berekê mezin li ser axekê ye, ko nû hatiye radan. Ber da rexekî û ax hilkola, darekê pehin hate ber, wî ew dar rakir, ji bin darî ve ew heşameta çekî kete ber çavên wî. Şêroyî ji çavên xwe bawer nekir. Yekser hizrek kete serê wî. Careka din dar xiste ve ser çekî û bi axê nixafte ve û ber wergerande ve ser wê axê û berê pêyên xwe da gundê Çem Seyda.

Her zû Bêwar ji malê anî derê û bi ya dîtî û guhlêbûyî agadar kir. Her di eynî gavê de, herduwan, du dewar bi xwe re anîn û hatin wî cihê çek lê veşartî. Çek ji wê çalê anîn derê û xistine di nav cihalan de û hildane ser pişta wan dewaran. Çal jî weko berê nixafte ve, lê berî ko axê rabidineve ser, Şêroyî berekê mezin xiste di çalê de û sê narincok bi wî berî ve girêdan û xelekên wan wesa bi darê ji ser ve girêdan ko hema dar ji ser bête kişandin, ew xelekên narincokan biveresin û her sê narincok biteqin. Wan ax rada ve ser wî darî û ew ber danî ve ser û çekê xwe di wê şevê de anî Çemseyda. Çek di odeya qûtî, di xaniyê Bêwarî de veşart.

Roja din, êvarî, herdu ji mal derkeftin û wan berê xwe da wî cihê ko çek jê anîbû bona ko bizanibin ka ew xwediyên çekî dê çi bikin. Berî ko ew ji gundî der bikevin, hevalê wan yê caran, Segvan xuyabû. Piştî ko çûne ser û stuyê hevudu û piştî silav û pirs û pirsyaran, diyarbû ko Segvan hatibû bona ko wan bi xwe re bibe daweta xwe. Piştî çend deqîqeyekan Şêroyî gote Segvanî:

— Erê Segvan tu mandî yan te pêwîstî bi bêhinvedanê nîne?

— Ez û mandîbûn, Segvanî got. Bes ji bo çi tu vê pirsyarê dikî?

— Eger tu xîret bikî tu jî digel me were heta bin cehdeyê, Şêroyê pêşniyar kir.

— Xêr e çi heye?! Segvanî bi mendehoşî pirsyar kir.

— Ez dê bi rê ve ji te re bibêjim, Şêroyî got. Pêwîstiya me bi te heye, bona ko tu jî bibî bîner li ser rastiyekê

Wî bi rêve hemû mesele ji serî heta binî ji Segvanî re got. Hersê çûn û xwe li cihekê nepenî, li ser rêyê, li ber wê destekê vena. Êvarî dereng du kes xuyabûn, hatin û di ber cihê wan yê nepenî re derbasbûn. Şêroyî niyasîn; Mehemed û ew kesê din yê ko şeva berê pê re bû, lê Ahmoyê Keçel ne bi wan re bû.

— De rabin, wext e em biçin û dizên xwe li ser devê çalê bigirin, Segvanî bi xwîngermî got, dema wî dîtî ew kes nêzêkî wî erdî bûn, yê ko Şêroyî destê xwe dirêjkiriyê.

— Nexêr, bila ew û şansa xwe bin ka dê çi ji çalê înin derê, Şêroyî weha got û mêzekire Bêwarî.

Hê Şêroyî axiftina xwe bi dawî neanî û di wê gavê de ko herdu kesan; Mehemedî û yê pê re dixwest depê li ser devê çalê rabikin, dengê peqînekê hat, ji tirsa, hêstirên herduyan teqiyan û paşî dengê nalenalekê ji hêla wê çalê ve hat û dûre mitî û bê dengî.

Segvanî ev hemû fêhim nekir ji ber ko wî nizanibû ka Şêroyî çi kiriye,

lewma pirsyar kir:

— Eve çi bû?

— Bira ez negehiştim ji te re qala kiryara xwe ya duhî bikim, Şêroyê xwest pirsê li ber Segvanî ronî bike. Min û Bêwarî şivêdî çal valakiriye û me çekê tê de bar kiriye û di mala Bêwarî de hilgirtiye. Û me sê narincok bi depê ser devê çalê de asêkiribûn, bi awayekê weha ko digel rakirina wî depî ji ser devê çalê, xelekên wan narincokan jê biveresin û narincok bipeqin. Eve pişka yekê ji pilana me bicî hat û bila kelexên wan herduyan li cihê xwe bin heta spêdeyê serbazên iraqî tên û wan dibin. Niha rabin da em biçin Ahmoyê Keçel bigirin û wî û çekên me şivêdî birîn bibin û bidin dest komîteya deverê.

Li wî çaxê ew ji cihê xwe livîn bona ko biçin bo gundê Çimbilkê pêjnek hate guhên wan. Wan careka din xwe di cihê xwe de veşart, ew seh dikinê ko Ahmoyê Keçel e. Segvanî xwe peyt kir bona ko biçeyê û wî bigire lê Şêroyî ew kêşa ve cem xwe û gotê:

— Xwe bigire bila ew biçe ser çalê û bila bizanibe ka çi qewimiye.

Ahmo nêzîkî çalê bû û gelek pêve neçû, bêhin maliqbûyî û pir tirsiyayî vegeriya û hê du sê pêngav nehavêtîn grupeka çekdaran li ber xuyabû û lê kire qêrî:

— Raweste û ji cihê xwe nelive heke me tu kuştî.

Şêro bi hevalên xwe ve man hêbetî û xwestin bizanin ka ew çi çekdar in. Wan xwe pîçek ji cihê xwe livand bona ko bikaribin wê grupê nas bikin, lê wan hind xwe dît bi çekdarine din dormandorkirî ne, Şêroyî zanî ew pêşmerge ne, ji ber ko ew nas kirin û endamekî komîteya birêveber ya deverê jî bi wan re dît.

— Eve çi ye?! Şêroyî pirsyar ji wî endamê komîteya deverê kir. We ji kûve zanî ko em li vir in?

— Hema her ji wê gava te ji me re qala wî Mehemedî kirî û heta niha tu li bin kontrola pêşmergeyan de bûyî, endamê komîteya deverê bersiv da.

— Boçî ez li jêr kontrolê bûm û ne ew? Şêroyî pirsyar kir.

— Çunkî me zanî tu dê her li pey wî kevî û dê her bi ser rastiya wî kabrayî hilbî û bi xêra te karê me jî hêsantir lêhat, endamê komîteyê peyivî. Lê me nezanî ko te narincok bi depê ser devê çalê ve asêkiribûn heta me guh li peqînê bûyî û me guh li te bûyî tu ji Segvanî re qala wan dikî. Heke me zanîba tu dê weha bikî, me wesa qebûl nedikir, ji ber ko te hem kuştin kir û hem jî te du kes ji dest me kirin, ko dibe me zanyarîne

giring li ser peywendî û livînên wan li deverê ji wan standibana.

— Ya kuştinê, min ew ne kuştine û wan bi xwe, xwe kuşt û ew bi xwe kujek bûn, Şêroyî berevanî ji xwe kir. Wan li ber bû bi awayekê pilanekirî kuştinê bikin, ya zanyariyan jî, ew Ahmoyê Keçel di dest we de ye û eger hûn bixwazin hûn dikarin her zanyariyeka pêwîstiyeka we pê hebe ji wî bistînin, ji ber ko bi dîtina min ew e serê wan li deverê, Şêroyî weha berevanî ji xwe kir.

— Ya rast em jî wê dizanin, ji berku duhî xeber ji rêxistineka me ya nihînî ji bajarê Duhokê gehişte me ko Ahmoyê Keçel dest digel hukumetê heye û sîxur gelek pûte didin wî.

Ew her wê şevê çûn mala Bêwarî û pêşmergeyan ew çek ji wir bir bo komîteya deverê û roja paştir ew heşt kesên din jî ji aliyê komîteyê ve hatin girtin. Şêro û Bêwar roja dîtirê bi Segvanî re çûn wî cihê mala wî lê, bona ko beşdarî aheng û şehyana jinanîna wî bibin.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 10–

Di wê dawiyê de Şêroyî senga xwe xistibû ve ser xwendinê; xwendina her pirtûkeka diket ber destê wî, zêdebarî kovar û rojname û belavokên bi kurdî û erebî yên bi dest dikeftin. Wî her wisa radyoyeka Filîps kirî û ji wê radyoyê guhdariya nûçe û deng û bas û programên cuda cuda yên înformatîv kir. Wî, ji bilî êzgeyên partên kurdî, guhdariya BBC, Dengê Amerîka, Montîkarlo û radyoyine din dikir. Wî dixwest, ji bilî wergirtina zanyariyên nû li ser babetên cuda cuda, bizanibe ka cîhan qala gelê Kurdistanê û pirsgirêka wî û ya bi serê wî dihêt dike yan na. Dixwest bizanibe ka dengê gelê wî yê perîşan digehe derve yan na, ka çawa cîhan temaşayî Kurdistanê û doza wê dike.

Çaxê di nava wî de hizr û lênerîn û tişt diketine serêk û aviz dibûn û ne dikarî wan di nava xwe de bihêle hilgirtî, wî dest dida qelemî û ew berdidane ser kaxezan. Belê, hêzeka mezin ew neçar dikir ko binivîse, ko ya di mejî û serê xwe de bi nivîsandinê vala bike. Wî ji bilî bîr û bawer û lênerînên xwe yên taybetî li ser rûdan û bûyerên cur bi cur, her weha jî bûyer û carna jî dîmenên hûr ji devera rizgarkirî di defterên xwe de tomar dikirin. Wî wê dawiyê ev nivîsî:

— »Di vê dawiyê de Bergiriya Millî bi hejmara xwe ji pêşmergeyan pitir lêhatiye. Piraniya Bergiriya Millî ew kes in yên ko nexwstine beşdarî şerê Iraqê û Îranê bibin û her weha ew pêşmerge ne yên ko nexwestine beşdarî şerê birakujiyê yan şerê xwekujiyê bibin. Xwe ez jî di Bergiriya Millî de me.

Min duhî spêdeyê posteyek bire gundê (x). Tiştê ez li wî gundî veciniqandim ew rewş bû ya gund tê de. Gundî hemû li derê bûn; li kolan û serbanan. Xem û tirs li ser navçav û livînên wan perçivî bû û ev axiftine bi ber guhên min ketin:

— Ax ji derdê birakujiyê.

— Tu dibêjî ew hevudu ne kujin?

— Ma ez çi bibêjim, hêvîdarim wê bê aqiliyê ne kin.

— Hey ho, hey ho, ma tu bo kê dibêjî?

— Heke van dev ji vê hevrikatiya bê wec berdaba, heke wan ji bo xatira miletî û azadî û tenahiya wî yekgirtiba, halê me ev ne dibû û em di vê perîşaniyê de nediman û em jî da karin bi serbilindî bijîn.

— Herê herê, heke em yekbana, da rejîma Bexda û yên din jî bo me hên ser çokan.

— Xwe bab û kalan rast gotiye; eger kirmê darê ji darê nebe, çi cara nemana darê nabe.

— Belê we ye û her ji dehmana mirovî agir berdibe mirovî.

Ji reng û ruxsar û rewş û axiftina gundiyan xuyabû ko tiştek qewimî bû, yan li ber qewmînê bû, û diyar bû jî di mala Reşoyê Nalbend de tiştek hebû ji berku çavên gişan li wê malê bûn, lewma min pirsyar kir ka ew çi qewimiye:

— Şivêdî pêşmergene ser bi parta (n) li mala Nalbendî bûne mêvan û berî çendekê jî pêşmergene ser bi parta (z) çûn mala Nalbendî.

— Pirbêj mişe ne û diyar e kesekî xeber gihandiye wan, lê eve demekê dirêj e herdu teref di hundur de ne û ne çi deng hatiye û ne jî kesek hatiye derê.

— Û hûn li vê derê rawestiyane li hêviya ko tişt biqewime û paşî bêjin; de aha eve wan çi karekê xerab û pîs kir? min pirsyar ji komeka zilaman kir.

— Ma çi ji dest me dihêt? Em dikarin çi bikin?

— Gelek ji dest we dihêt eger hûn bixwazin û xwe pîçekê bisteh bikin. Li şûna ko em li vê derê rabiwestin û li benda hindê bin ko tiştek biqewime, em dikarin biçin mala Nalbendî û bizanin ka rewş di hundurê malê de çawa ye û eger ya xerab be û li ber peqînê be em bikevin navbera wan û we nekin xwîn birije. Em dikarin ji wan bixwazin ko şerê hevudu nekin, em dikarin xwe pavêjin ber pêyên wan û tikaya jê bikin ko hevudu nekujin, belkî li ser xatira me çi ziyana negehînin yekudu. Eger wan bi vê hemûyê jî nekir em dikarin êdî, hindî ew di şerê birakujiyê de bin, wan di malên xwe de ne hewînin û alîkariya wan nekin û weha em wan neçar dikin ko siyaseta xwe ya xelet biguhorin, heke milet bi wan re namîne.

Piştî vê gotina min, çend kesekan xwe da digel min û me berê xwe da mala Nalbendî. Hê em nêzîkî malê nebûbûn û pêşmergeyên parta (z) ji mala Nalbendî derkeftin û dêmên wan xemokî bûn. Ez keftim gumanê; ev çima dêmxemokî ne? Pa nê dengê teqîna tivengan ne hatiye, tu dibêjî ko ew bi çeqokan ketibine giyanê hevûdu? Gundî jî di cihên xwe de man çandî û hêbetî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Berî ko pêşmergeyên parta (z) bêne gundî, wan zanîbû ko pêşmerge ne ji parya (n) di gundî de, li mala Nalbendî ne. Lewma wan xwe zûka, bi dizîkî ve, di rêya nav baxçeyan de gihande mala Nalbendî û dewr û berên xanî girtin. Hinekan ji xwecihên gundî çav bi hatin û wê livîna wan keft û xwestin tiştekî bibêjin, lê wan pêşmergeyan bi îşaretine ji destên xwe ew têgihandin ko xwe dûr bêxin û mayê xwe di pirsê de nekin û qalşî wan nebin.

Pêşmergeyên parta (z) xwestin bikevin hundurê xaniyê Nalbendî bona ko pêşmergeyên parta (n) bigirin, lê dengê axiftina ji hundur dihat weha kir ko sergêrê wan pêncan operasyona xwe rabiwestîne û li ber derî guh bide suhbeta di hundur de tê kirin bona ko bizanibe ka ew qala çi dikin. Wî guh veçinîn ser suhbeta di nava xaniyî de dihate kirin û ev bihîst:

— Baş e ma eve durust e ya hûn herdu alî dikin? Ma heta kengî dê hûn ji wan kujin û ew ji we kujin û dijmin jî ji we herduwan û ji me hemûyan?

— Kes nikare bibêje ev karekê baş e û bêguman ne di berjewendiya çi aliyekî ji me de ye û her di xizmeta dijminî de ye.

— Bawer bike mam, heke niha bêne telba me û heta eger em bizanibin ko sed der sed ew dê me kujin jî, em desta nadin tivengên xwe û em kuştinê ji wan nakin.

— Baş e, lê hûn kêm in û ew in li vê derê xudan hêz û heke ew yên kuştinê bin dê hûn çi bikin?

— Rast e, eger yê xwedî hêz û desthilatdar li dijî xwekujiya navxwe be, hîngê hemû tişt hêsan dibin. Lê heta eger ew û em weko hêz, di vî warî de, bi durustî ne xwedî helwêstekê xuya û baş bin jî, di nav herdu hêzan de kesine hene weko me hizir dikin û li dijî birakujiyê radiwestin û yên weko we jî, roj bi roj di mişebûnê de ne. Ez bawer dikim eger serkêşên me vî rengê şerê navxwe bixwazin jî, ew nikarin li ser berdewam bin, eger em, weko milet li dijî bin.

— Nê çi cara hemû di hizirkirin û dîtinên xwe de weko yek nabin û bab û kalên me ji kevin de gotine »her serek aqilek e« tu dibêjî sergêrên me vê rastiyê nizanin yan hema xwe di ser de dibin û xwe xişîm dikin?

— Te ya rast bivêt mamo te li kakilka rastiyê da. Problem di hindê de ye, mezinên me carna tiştine baş dibêjin lê ew qet li gora gotina xwe nakin û eger bikin jî tiştekê gelek kêm jê bi cî tînin. Mixabin ko me di vî warî de dîrokeka dewlemend heye û şerê hevudukirin li Kurdistanê ji kevin de heye û sedemeka serekî ya bindestbûna me ye. Dijminên me jî hemû hewla xwe didin bona ko ew rewş neyê guhertin, em jî ji wan re di wê

pirsê de arîkar in. Tiştê mirovî mendehoş dike ew e ko em û bi taybetî serokên me vê rastiyê dizanin û her qala hindê dikin ko wan ders ji dîroka gelê xwe standine û êdî we nakin ew karesat û çewtî û kêmanî dubare bibin ve, lê ew peyvên wan dimînin peyv û dîrok bi şêweyekî ji şêweyan, ne bes dubare dibe ve, lê sêbare û dehbare û sedbare dibe ve û xencera me jî her li piştа me û li sînga me dikeve ve. Heke me ji gotinên xwe yên xweşik û baş ji sedê bîst bi cî anîbana, dibe ko îro rewşa me çêtir û xweştir bibaya.

— Ya ji hemûyan jî nexweştir ew e ko ev di wextekî de diqewime, ko tê de, rejîma faşîst ya Bexdayê, êrişekê ji bo vebirandina gelê me tîne ser Kurdistanê.

— Eve kula dilê me hemûyan e û pirsyara me ya her tim bê bersiv e; ew çima vê niha dikin? Ew çima niha xwe ji bo rizgrkirina welatê xwe û azadkirina miletê xwe nadine hev û bila paşî, piştî azadiyê û danîna dewleta xwe mijûlî problem û aloziyên navxwe bibin? Evca hîngê milet kê dixwaze bila ew be, heke ew rast ji bo miletî û bi ya miletî dikin.

— Xalet ev gotina te zêr e û xwezî bibaya guhar û di guhên her xwecihekê Kurdistanê de baya.

Piştî vê gotinê deng hebekê hate vebirîn û di wan gavan de sergêrê pêşmergeyên parta (z) ferman da pêşmergeyên xwe ko biçin di hundurê mala Nalbendî de. Dergeh hêl hate paldan û ew bi tivengên xwe yên arasteyî yên di hundur de kirî ketine jor û sergêrî kire qêrî:

— Kes ji cihê xwe ne live!

Çiwar pêşmergeyên parta (n) û Reşoyê Nalbend û jina wî, xaleta Gulbuhar di jorê de bûn. Tivengên sêyan ji wan pêşmergeyan bi singan ve hilawîstî bûn û ya yê din, ko bi sergêrê wan xuya dibû, bi rex wî ve, paldayî dîwarî bû. Ne wî û ne jî hevalên wî destên xwe birine tivengên xwe. Xaleta Gulbuhar têgehişt ka çi rû dide û zanî ewên nûhatîn ji parta (z) ko li dijî parta ewên rûniştî ne. Wê xwest weneke tiştekê xerab biqewime:

— Kurên xaletê, guhê xwe nedin xerabkaran û xwîna yekudu ne rêjin, xaletê ev got û xwe avêt ber pêyên wan û bû lave lava wê.

Ji ber wî dîmenê xaleta Gulbuhar ya di navsal de çûyî û ya li ber wan ketiye ser çûkan û tika ji wan dike, herdu destek li ber xwe ketin û herduwan ji xwe şerim kir. Xaleta Gulbuhar ew pêşmerge bi çavan nas dikirin, çunku car û bar li cem wan dibûn mêvan û xaleta Gulbuhar bi xwe jî di deverê de pir nas bû, ji ber ko jineka welatperwer û dilovan bû û derê mala wê li ber pêşmergeyan her tim vekirî bû. Her pêşmergeyek,

ko diçû mala wê û kesê wî li deverê nebû, wê cil û kincên wî dişûştin û xwarinên xweş jî ji mêvanên xwe yên pêşmerge re çêdikirin û roj jî derbas nedibû ko çend pêşmergeyek li mala wê nedibûn mêvan.

Sergêrê desteka parta (z) pir ji xwe şerim kir. Wî tivenga xwe bi milê xwe ve kir û destên xwe dane milên xaletê û tika jê kir ko ji ser çokan rabibe. ko xalet rabû, wî maçî destê wê kir û gotê:

— Xalet te em şehmizar kirin. Eve te çi kir, te em gunehbar kirin. Divêt em li ber jineka weko te bikevin ser çokan. Xalet bawer bike me jî, dil li ser wê çendê nîne, lê em çi li yên serî bikin? Wan ev ferman daye me û em hinartine bona ko van biraderan bigirin.

— Xurtên delal, ma yên serî bi kê dikin? Nê her bi we dikin, xalet berdewam bû li ser axiftinê. Ma yên serî bê we çi ne û dikarin çi bikin? Nê hema, heke hûn û yên weko we bo tiştên weha bi ya wan nekin, ma dê ji kûve birakujî çêbibe?

Sergêrê pêşmergeyên parta (n) got xaletê:

— Wey ez sed carkî qurbanê te û van gotinên te yên zêrîn bibim, xalet.

Pêşmergeyên din jî, yên desteka parta (z), weko sergêrê xwe, luliyên tivengên xwe şor kirin. Bi wê kiryara wan dilê xaletê hîn bû û bişkurînekê cihê xwe li ser lêvên wê çêkir, ji kêfa de rondik ji çavên wê barîn. Wê bi lewendiyên xwe rondikên xwe vemaliştin û gote wan:

— De evca kurên xaletê yên delal, de rabin li ser xatira min herin dest û stuyên yekudu, evroke hûn jî mêvanên me bin û xwarineka xweş pevre bixwin.

Sergêrê pêşmergeyên ser bi parta (z) berê xwe da tirşika bi kifte ya li ber mêvanan danayî û got:

— Xalet bi rastî em gelek ji tirşika te xerîb bûne û ev demekê dirêj e me xwarineka weha xweş ne xwariye, lê me ferman heye ko zû vebigerin ve û heke em zû neçin, ez ditirsim ew hizir bikin tiştek bi serê me hatiye û paşî pêşmergene din li hawara me bişînin û wê çaxê mirov nikare tiştekî bike û dê ji dest me der bikeve. Lê berî em biçin, xalet, ez dixwazim bêjim ko van hevalan rast digot; em jî weko wan li dijî vî şerî ne û em hatibûn bo girtina wan û qet di dilê me de nebû em kuştinê bikin û em qet jî nakin û heta eger yên li serî jî, ji me bixawzin, peyman be em nekin.

Herdu alî çûne dest û stuyên hevûdu. Giriyê kêfê hefikên wan girtin û wan xatira xwe ji hevudu xwest. Li ber derî, sergêrê pêşmergeyên parta (z) li pêşmergeyên parta din zivirî û gotê:

— Hevalno! Eger hûn hebekê zû ji gundî derbikevin çêtir e, neku

mejîhişkek bi ser we de hilbibe û ew biqewime ya kes ji me hez jê neke.

Ew weha derkeftin û zû gund li pişt xwe hişt û berze bûn. Ez bi wan çend kesekan re ber bi mala Nalbendî çûm. Hê çend pêngavek mabûn dema der vebû û pêşmergeyên parta din jî, sax û bi çekên xwe ve derkeftîn. Li pey wan xalet jî hate derê û her weko wê dizanî ko gundî li hêviya şirovekirinekê ne, got:

— Çi ne qewmiye û herdu teref çûne destên hevudu û her yek ji wan diçe ser rêya xwe. Evê nûçeyê kenî anî ser dêmên gundiyan û axiftinên dilveker ji her aliyekî ve derkeftin:

— Aha divêt hosa be.

— Xwezî hemûyan ho kiriba.

— Xwezî mezin û serokan zehrî wan kiriba.

— Dê rojek hêt, ew tê de neçar bibin ko guh bidin me yên li binî.

— Lê hema, ew roj dereng neyê û di wextê xwe de bihêt.

— Pûşmanî di nîva rêyê de jî baş e.

— Xwezî û sed hezar cara xwezî wan dest dabana yekudu û bila min çi tiştek li ser darê dinê nebaya.

— Ma ew li benda çi ne, nê ha dijminî em jinavbirin û qutbir kirin.

Dilxweşî û kamuraniyeka pir mezin kete nav xwecihên gundî û her kesekî ji wan, di wan gavan de, hest bi hindê dikir ko wî ji her carekê bêtir welat û miletê xwe divêt û ruha biraiyê di nav wan de gerim dibû.

Bêguman dîtina xelkê me pir rast û di cihê xwe de ye û nemana şerê birakujiyê ruha xweragirî û berxwedanê li cem xelkê me geştir û xurtir dike û roja xelasbûn û azadbûnê nêzîk dike.

Li van deverên rizgarkirî kesine hene rexneyê digirin, lê pir kêmin yên ko rexneyê dikin û çewtî û çawaçareserkirina çewtiyan jî destnîşan dikin. Li vir hindek grup peydabûne, ew di piraniya xwe de ji fîlarbûyan pêkhatine, ev grup rexneyan bi rengekê pir dijwar digirin û rexneyên wan di piraniya xwe de bi kerb û kîn in û xelkê deverê li dijî partên serekî teyar dikin. Carna jî pirsa kuştin û jinavbirina serkêşên pêşmergeyan tînin ziman. Zimanê wan pir dirêj e, di markisî û lenînizmê de lewleban in, mirovên bê ezmûn in û çi alternatîveka wan nîne û xuya ye ew bi axiftin û rexnegirtinê xwe diyar dikin û xwe diînin pêş.

Tiştekê pir baş e ko mirovên bi cerg û bisteh peyda bibin û bersînga çewtî û lengiyan û yên pê radibin bigirin û rêçareyên baştir dabinin ber van partên desthilatdar yan bibin alternatîveka baştir û bi xêr û bêrtir, lê mixabin rexnegirtina van grupan xeber û xwepîvan û gotinên kirêt û

keşefir in. Ez di destpêkê de, bi wan re ketim danûstandin û gêngaşe û axiftinkirinan, lê ko min dît ko ew ji bilî ya di serê xwe de çi ya din qebûl nakin, min xwe ji kêşmekêş û pirbêjiyên wan dûrxist.

Tiştê gelek keyfa min pê dihêt xwendekar û mamosta ne. Mamostayên deverê di piraniya xwe de bi rolekê welatparêz radibin û ruha welatparêziyê di xwendekaran de bihêz dixin. Hukumetê her ji sala 1977-ê rewşa xwendenkarên Kurdistanê xerab kiriye; yek, zimanê erebî kiriye zimanê xwendinê. Weha li ber xwendenkaran tev li hev dike; car bi erebî, car bi kurdî û careka din bi erebî, ji bilî ko xwendenkarên kurd ji mafekê wan yê neteweyî, ko xwendine bi zimanê xwe yê zikmakî, bê behir dike. Dû, wê dest pê kiriye hinek dibistanan digire, bi bihaneya ko dûrî desthilata wê ne û weha hejmara xwendingehan kêm dibe. Sê, hejmara mamosteyan jî kêm dike û her çendsed xwendenkarekan yek mamosteyê xwe heye.

Li deverê ji xwendenkaran re pir zehmet e bi erebî bixwînin, ji ber ko erebiyê nizanin û weha di dersan de zîrek nabin û nikarin dahînanê tê de bikin.

Weke nerazîbûn li ser nehiştina zimanê kurdî di dersan de, xwendenkarên debistanan li gundên deverê biryar standin ko pirtûkên dersan yên bi erebî bisojin. Mamoste di piraniyê de digel de bûn, lê hinek baban asteng xistine di rêya mamosteyan de û ev karê sotina pirtûkan dixiste di stuyê mamosteyan de. Wan baban dixwest ko zarokên wan bi erebî bixwînin, lê zarokan ne dixwest. Bes zarok neçar e bi ya babê bike.

Hêceta wan baban ew bû ko di zankoyan de, li Mûsil û li Bexdayê, xwendin bi erebî ye û eger zarokên wan bi kurdî bixwînin, ew wê çaxê nikarin xwendinê li wan unîversîteyan bidomînin û ji ber hindê jî ew dixwazin zarokên wan bi erebî bixwînin.

Lê piraniya xwendenkaran li dijî xwendina bi erebî bûn û wan pirtûkên xwe hemû xwendenkaran bi hev re sotin. Pirtûk vedicemandin serêk, weke girekî lê dihat û agir berdidanê û disotin. Wan dixwest, bi wî awayî, bibêjin desthilatdarên Bexdayê ko wan divêt bi zimanê kurdî dersan bixwînin, ne ko bi zimanê erebî. Lê ma kengî Bexda di xema dîtin û hezkirina xwendenkar û miletî de ye!«

# – 11 –

Êvariyeka rojeka havîna sala 1988-ê çend pêşmerge û çend sivîl li gundê Bazê li bin keprekê rûniştibûn û guhdariya radyoyê û nûçeyan dikir. Hemûyan guh dida deng û basên wan hewildanên dihatinn kirin ji bo rawestandina şerê Iraqê û Îranê û aşkirina herdu layenan:

— Wey xwezî me dîtiba ko ev şere jî rawestaba û êdî xelik nehatiba kuştin, ev Gencoyî ko berî çend mehekan ji berokên şerî li hember Îranê reviyabû û hatibû deverên azadkirî û bûbû pêşmerge got.

Şêroyî ne xwest destpêşxer be di bersivdanê de, lewma wî xwe li benda kesekê din girt ko komentarekê li ser gotina Gencoyî bibêje. Lê hemû bêdeng mabûn û çavan hêv dikire çavan, Şêro nikarî bêdeng bimîne û xwest dîtina xwe bipeyivîne:

— Pismam tu şekirê dişkênî, mirov ger bi durustî mirov be û ji mirovan hez dike divêt li dijî şerî û teror û destdirêjkariyan be û ez di wê bawerê de me ko çi kesek di nav me de nîne ko şer pê xweş be. Ez bi bawer im jî ko me gişan pê ne xweş e ko ev xelkê bêguneh di rêya van hukumet û rejîmên zordar de têne kuştin, lê ez nizanim ka bi dîtina te çi wec û başiya me di rawestandina vî şerî de he ye, eger hukumdar her hukumdarê caran be? Ev got û mêzekire Gencoyî, her weçku daxwaza bersivdanê jê dikir.

Bi xwîn germî û mîna kesekê baweriyeka pir mezin bi gotina xwe heyî Gencoyî welam lê vegerand:

— Ez dizanim mebesta te ji vê pirsyarê çi ye, lê rê bide min ez pirsyarê ji te bikim ka me di van heşt salên vî şerî de çi wec ji şerê wan dîtiye? Li şûna ko em wecê ji derfeta bi dest me keftî bibînin, part û rêxistinên me, her ji Suleymaniyê bigire heta Zaxoyê, berbûbûn bersingên hevudu û xebata wan ya serekî bûbû birakujî. Evca bi dîtina min eger ev şerê Iraqê û Îranê rabiweste çêtir e û belkî xêreka me jî tê de hebe.

Bi dengekê nerim û li ser xwe Şêroyî dom da kêşmekêşê:

— Ya wec jê newergirtinê ez bi te re me, lê kêm tişt, baş e ko di vê dawiyê de û bi fişara miletî partên me dev ji şerê birakujiyê berdaye û

hewil didin ko di navbera xwe de xweş bikin û pirensîpên karê hevbeş yê nîştîmanî di navbera xwe de binecih bikin.

Şêroyî dixwest hê bipeyive li dema Gencoyî axiftin lê qut kirî:

— Piştî çi? Piştî karesata Helebçe û şehîdkirina Helebçe, piştî jidestxwekirina heşt salên şerê Iraqê û Îranê? Piştî xweêxistinê bo ber destê Îranê û Iraqê û belavkirina bêzariyê di nav xelkê me de? Hevgirtina çi? Hinek teref di vê yekgirtinê de hene eger hat û subehî bi hêzkeftin û bîva xwe dît dê careka din berê luliyên tivengên xwe bidin ve yekudu û dê rûpelên kevin vedin ve. Hemû jî bes bo pêşxistina partên xwe bi tenê ye, ji pêxemetî hindê ye ko beyava li bin kontrola hêzên xwe mezintir lêbikin û Kurdistanê bikin ve çend mîrgehek.

— Birawo ev yekgirtine çi be û çawa be û sedmên çêbûna wê çi bin jî pêngaveka dîrokî ya pîroz e û cara yekem e di dîroka me ya nûjen de tişteka weha rû dide, Şêro li ser xwe diaxivî. Divêt tu ji bîr nekî ko eve daxwaza miletê me bû, lê ez tiştekî bi te re me, ew jî ew e ko em bi vê pêngavê bi tenê qayîl nebin û fişarê bêxin ser van partan bona ko ew ruha yekgirtinê û ruha karê hevbeş yê nîştîmanî di nav xwe de weko serkirdayetî û weko rêxistin belav bikin û biçespînin. ko ew guhertinan di nav xwe de bikin bona ko bikaribin vê qonaxa nû fêhim bikin û li asta berpirsyariya xwe ya dîrokî bin. Karê me ew e, em vî şêweyê pêkhatinê biparêzin û mukumtir lêbikin û ber bi pêşde bibin. Nê her em bûn yên ko gazinde û gilî ji van partan dikirin û me çekên xwe dideynan û me dev ji pêşmergetiyê berdida, hemû ji bo diyarkirina nerazîbûna xwe li ser çewtiyên wan û bi taybetî li ser şerê birakujiyê û neyekgirtina wan. Ez digel te me ko van partan ne ji bawerî ev tiştê baş kiriye, lê ew ji tirsa hindê kir neku ji miletî dûr bikevin û wan ji bêgaviyê bawerî bi rastiyê anî û rêya mana xwe weko part di birakujîrawestandinê de û di hevgirtinê de dît. Eve rast e, lê em çi bikin? Divêt em ji bîr nekin ko yekgirtina miletê me girêdayî yekgirtina part û hêzên wî yên siyasî ye û part û hêzên me jî ev in. Evca kêm tişt, heke ew berhingarî hevudu nebin û ji yekudu nekujin, wê çaxê, em dizanin ko em weko milet şerê hevudu nakin û ji hevudu nakujin. Her ji ber hindê jî divêt em pêngavên ji vî terzî, ji dil û can himbêz bikin û ji dil hewil bidin wan bikn pirensîp ji bo jiyana xwe di paşerojê de.

— Ev axiftina te weha min têdigehîne ko divêt em xwe di kevilê xwe de bend bikin û me dil bi van miletan ne be û me bes çav li miletê xwe û doza wî be, Gencoyî bi tingijîn xwe anî ve nav gêngaşeyê. Ma tu dizanî vî şerî

çi bi srê herdu miletên Îranî û Iraqî aniye, nê şerî ew herdu di nav agirê xwe de qelandine. Rawestandina şerî, ragirtina xwîna xelkê hejar û perîşan e, ragirtina xwîna mirovê Iraqî û Îranî ye.

— Birawo eve tu qala çi dikî, xwe tu jî baş dizanî ko miletê me digel vê hemû perîşanî û bindestî û bêazadî û daplosîna tê de dijît, ji miletên dewr û berên xwe dilovantirîn e û ji wan re û ji bo xweşkirina jiyana wan û ji bo rehetiya wan her tim arîkar û hevkarê pêşîn bûye, Şêroyî hedar nema û bi xeyidîn li ber devê Gencoyî da. Ez li vê derê, dê perdeyê dirînim û dê xwe bisteh bikim û bêjim ko her xemsariyeka hebe jî, ew ji aliyê miletên cîran e, ne ji ba me ye. Ez dizanim kesine dê hebin ko min ji ber van gotinan bi regezperist li qelem bidin, lê ev ne nifişperêsî ye, ev rastiyek e û divêt ew milet wê baş nas bikin û bizanin çewtiya wan li kûderê ye û ka wan pê daye ser mafê kê. Bira, eger şerê Iraqê û Îranê berî heşt salan dest pê kiribe, şerê ko van dewletan bi ser miletê me de sepandî gelek û gelek ji wî kevintir e. Eve çend sal in em tên bindestkirin û kuştin û derbiderkirin û jinavbirin û me hê ji aliyê van miletên dirawsê ve çi piştevanî û arîkarî û hevkarî ne dîtiye. Evca çima tu qala vê nakî û boçî tu bizavê nakî vê rastiyê bêxî ber çavên wan, ji bona ko ew xwe baş nas bikin û bizanibin ka hukumetên wan, bi rêya wan, çi tadakarî li miletê me kiriye. Nê bêdengiya van miletan li ser zordariya ko hukumetên wan li gel û welatê me dikin, bi xwe zordarî ye.

Her weçku Gencoyî dixwest berê axiftinê biguhore û bibe ser ya ko ji mêje dixwest bibêje û ya di dilê xwe de birêje, lewma qisekirina Şêroyî birî û got:

— Li gor lênerîna min rawestandina şerê Iraqê û Îranê û aşbûna wan di çakiya bizava azadîxwaza Kurdistana Iraqê de ye.

Şêro bi wê gotina Gencoyî vecininqî û yekser axiftin lê vebirî û bi vê gotina xwe berbû navçavên wî:

— Te çi got? Çakiya me tê de ye! Ew çi çakî ye ji vê şerrawestandinê digihîje welat û gelê me? Eger mebesta te ew be ko digel şerrawsetandinê ev rejîma hukumdar jî nemîne û demokrasî cihê wê bigire ew rast e, eger mebesta te ew be ko kenkeneyên cîhanê mîna Amerîka û yên din piştî şerrawestandinê rêçareyekê ji pirsa me re payda bikin û we nekin êdî Iraq xwe taloqetî ax û welatê me bike ew jî rast e, lê eger mebesta te bes şer bi xwe be, ew dîtineka bilecîb e. Em jî li dijî şerî ne û her kesek ji hevalên rûniştî jî li dijî şerî ye, lê tu divêt bizanibî çi çakiya miletê me di şerrawestandinê bi tenê de nîne, ji ber ko hema şer rawestiya, dê bînî ka dê çawa


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Iraq berê leşkerê xwe bide Kurdistanê û dê çawa fermana me rabike.

— Eve we xêr e hûn wisa li çekî û şerî aşiq bûne, weko kesekî marî gestî Gencoyî got. Xwe heta hetayê karê me çek û şer nabe.

— Hey çav lê korebin yê ji çekî û şerî û kuştinan hez dike, pêla dengê Şêroyî jî bilind dibû. Ev şerê em tê de, ne di dest me de ye û ev şere bi ser me de hatiye sepandin. Yên şerê me dikin û me pal didin ko em şerî bikin serdar in û xudan dewlet û hêz û çekê nûjen in û zimanê wan bes şer e û bes zimanê hêzê û şerî fêm dikin û heta niha çi çareyeka din nebûye pê bersiv li şerî bête dan. Em li ser axa xwe ne û ew bi çek û cebilxane û leşkerên xwe ketine nav axa me û hatine bona ko me bindest bikin û eger em bi ya wan nekin û em nebin kole û beniyên wan, ew me ji nav dibin. Em neçûne ser axa çi miletekî û me êriş nebiriye ser çi miletekî û ya em dikin, em berevanî û bergiriyê ji mana xwe dikin. Ya em dikin, şerê man û nemanê ye û her giyanewerekî mafê hindê heye berevaniyê ji xwe, li hember neheqiyê bike û em bes wê dikin. Û her ji ber wê berxwedana miletê me ya dirêjxayen hê miletê me maye û hîn li ser axa xwe ye. Eger Iraq pêngavekê ber bi aştiyê bavêje em dê li hember wê pêngavê bi dehan pêngavan bavêjin û eve ye hezkirina durust bo aştiyê û nexwestina şerî. Çawa mirov weko kit serşorî û milkeçiyê ji çi kesekî qebûl nake, her weha milet jî wê naxwazin û ji bo nepejirindina wê li ber xwe didin.

— Bi dîtina min eger şer rabiweste dê partên burjuwa û rastrew lawaz bibin, li vir Gencoyî dest pê kir mebesta xwe ji cirrenîxê bi awayekê zelaltir û vekirîtir xiste ber çavan. Xwe piraniya xelkî ji bêgaviyê, ji şerê Iraqê û Îranê û ji kuştinê reviye û fîlarbûye û hatiye van deran û xwe neçar dibîne ko çekî hilbigire û xwe bide digel aliyekî ji aliyên ko qada çekdar li deverên rizgarkirî di dest wan de ye. Di rastiyê de, vî xelkî bawerî bi van partan nemaye û pir bêzar e û eger şer rabiweste dê piranî rubide xwarê û dê dev ji van partan berbide. Hîngê partên burjuwa kesê xwe namîne û dê lawaz bin û ji bo mana xwe dê bi her layekî re be bikevin lave lavê. Bi wî terzî delîve li ber hêzên şoreşger û bizava teorî û rewşenbîrî vedibe. Ew tevgera nû dê zû pêş bikeve û werar bikeve nav û weha dê bizava şoreşger û parta çîna zehmetkêş, parta pêşverû mezin û berfireh bibe û dê pêşengiya xebata millî ya gelê me bike û eve ye, bi raya min rêya serbestbûna miletê me.

— Hey maltirnêsnek, ma haya te ji te heye tu çi dibêjî, Şêro enirî û li Gencoyî kire qêrî. Hê tu ne hatiye nav jiyana rastîn û hê tu di nav wan kevnepirtûkên teoriyan de dijî. Xuya ye tu hê rejîma hukumdar li Iraqê

nasnakî, yan tu xwe xişîm dikî. Kuro ma kî dibêje heta wî wextê tu destnîşandikî, dê miletê me li ser axa xwe bimîne û nahête jinavbirin? Diyar e tu hukmî li ser miletî didî ko divêt ew bi raya te razî bin û li benda cenabê te û cenabên hevrêyên te bin heta ko partên burjuwa jinav diçin û paşî tu û hevalên xwe bizava xwe ya teorî û rêxistinkî dikin û paşî parta xwe dadimezrînin û paşî dest bi xebata xwe ya siyasî dikin. Mamo, dîrok li kar e û ranaweste. Heke bi axiftinê be hemû rê diçin aşî û çi ji axiftinê û rêzkirina peyvên ciwan û xweşîmank û teyisok jî hêsantir tineye. Tişt li ber te tevlihev bûne; tu tiştê rast û çewt têkel dikî. Tu carna destê xwe dadinî ser kem û kuriyên di nav me de û carna jî tu bê hizirkirin, axiftina xwe diavêjî û pê çewtiyeka mezintir dikî. Nê hema ev şere rawestiya û Iraq ma bê şer û mijûlahî, dê lêhmişta çek û şer û kîn û cebilxaneya Iraqê werbigere ser Kurdistanê û hîngê ne partên burjuwa û ne jî partên te yên nûjen dimînin. Rejîma ko Melekan û Şêxwesan û Helebçe bi çekên kîmyewî û jehrîn bombebaran kirîn û bi komel xwecihên wan kuştîn û birîndar û seqet û derbider kirîn, ew rejîm amade ye ko Kurdistanê bi xelkê wê ve bisoje û tovê Kurdan biqelîne û wan qutbir bike. Ev teorî û dîtina tu ji me re dibêjî ne ya te ye û ya hineka ye, teoriyeka biyanî ye û bi kêr me nayê. Ew bi kêr wan ne hatiye yên ko ew afirandiye, evca dê çi weca me tê de hebe. Ya ji hemûyan jî giringtir ew e, divêt me ageh ji xwe hebe û her tim li ber çavên me rastiyek xuyabe; milet ne tişt e ko taqîkirin û tecrube li ser bêne kirin, divêt ew rêbaz û rêçareyên ji bo azadbûna wî dihêne destnîşankirin û hilbijartin, piştî gelek vekolîn û liserrawestiyanan bêne pejirandin. Tu her ji niha qala çînayetiyê dikî, baş e bila ew parta tu behsa wê dikî û her çi parteka din jî hebe, bila çêbibin û bila xebata xwe bikin û ew tiştekê herî normal e. Lê divêt tu berî her tiştî baş bizanî ko xebata me ya serekî ji bo azadbûna mirovî û neteweyî ye. Hê em bê dewleta xwe ya neteweyî ne û heke ew çêbibe, bi awayekî automatîk rê li ber hemû curên hevrikatiyên din vedibe. Di vê Rojhilata Navîn de, bi vî şiklê nuke, ko dewleta qanûnê hê tê de cihnegirtiye, pir zehmet e em kurd bê şer û bê pehevçûn dewleta xwe dabinin, eve, çi me viya û çi ne viya rastiyek e. Genco, ez nizanim tu çi kesekî, aya tu kesekî ko xwe di bazinê teoriyan de bend kiriye yan kesekî ko hê komelê xwe û doza xelk û welatê xwe û cîranên me nas nekirine yan jî tu mirovekê westiyayî û ji xwe re li delîveyekî ji bo bêhinvedanê û ji bo bi xwe ve mijulbûnê digerhî. Xwe tu li benda hindê nînî ko şer rabiweste û dirbek bi tevgerê bikeve û bibe ve aşbetalekê din û lêborîneka din ya giştî ya xapînok ji aliyê Bexdayê ve bête

dan û xelik ref ref, weko heftê û pêncê neçar bibin û xwe bidin dest rejîma desthilatdar û tu yek bî di nav hemûyan de? Hîngê kes nabêje Gencoyî xwe da dest rejîma Iraqî û kes nabêje ew mirovekê tirsinok û xweperist bû, kes nabêje wî taqeta pêşmergetiyê ne bû, ew ne xwefîdakar bû. Lê belê, li şûna hindê, xelik dê bibêje partan şoreş xelet birêvebir û milet hevrûşî karesat û setimînê kir. Hîngê, tu li cihê ko bi xem bikevî û axînkekê bo wê karesatê rabihêlî, dê bişkurî û bibêjî; nê min çend gote wan û min çend caran ji wan re şaşî û çewtiyên wan dest nîşan kirin lê hemû, ya bê hode bû, ew part di binyatê xwe de rizîn e û çakî ji wan çênabe û ev dîtina min bû, lê çi kesekî guhdariya van gotinên min nedikir. Tu di serê xwe de, bi endêşeyên weha genî çareyan peyda dikî. Hey pa tu mirovekê pir xweperistî û dindikeka welatparêziyê di nav te de nîne. Ne weha jî, ko mirov dijminê gel û welatê xwe bêxe pêş part û hêzên welatê xwe yên siyasî, heta eger xeletî û çewtiyên wan jî pir û pir bin.

Wê rojê keniya Gencoyî bi wê axiftina Şêroyî dihat û xwe didît ji wî rastir û ji bilî rêçareya xwe, wî çi metodeka dî ya çareserkirinê bi ya durust û baş ne didît. Wî, ne bes li wê dîwanê û bi Şêroyî bi tenê re ew gotûbêj kir û ew dîtina xwe xiste ber çavan, lê li gelek dîwan û cihên din jî babet hate hilêxistin û ew yê rik bû li ser lênerînên xwe.

Ya Şêroyî wê rojê ji gotinên Gencoyî fêmkirî nedilnerehetiya Gencoyî bû ji şerê Iraqê û Îranê, lê bi dîtina Şêroyî wundabûna Gencoyî bû di bazinê partîtiyê yê teng û tesk de. Bi şirovekrina Şêroyî bo gotinên Gencoyî, gencoyî tilên xwe li têleka pir giring dixist; aya milet ji bo partan yan part ji bo miletî yan jî herdu ji bo hevûdu. Li ber Şêroyî weha xuyabû ko Genco digel pirta yekê bû û wî bes parta xwe li ber çav bû û bila pêşxistina wê li ser kîstê çaxî û miletî û welatî jî be.

Lê digel hindê jî, Şêro ji xwe nerazîbû ko bi wî awayê dijwar li ber devê Gencoyî dida. Şêro di wê bawerê de bû ko Genco di rastiyê de mirovekê welatparêz e, lê şêweyê şirovekirina wî bo welatparêziyê, li gor dîtina Şêroyî, ne yê durust bû. Bi ya Şêroyî ew awayên xelet yên fikirîn û bizivînê jî berhemên xeletiyên mezin yên serkirdayetiyên partên kurd û politîkên wan yên çend sala nin. Şêro digel hindê bû ko van partan çewtîne mezin kirine û ew wan xeletiyan çend bare dikin ve û ew ziyaneka mezin digehîne gel û welatî. Wî dizanî ko lihevhatina wan hêzan ne ji dil û can û bi bîr û bawer bû, ne li ser bingehê parastina berjewendiyên giştî yên gel û welatî bû, lê weko taktîkeka berwext bû. Şêro ji xwe nerazîbû ko wî ew hizir û dîtina xwe li cem hemûya û bi awayekî vekirî ne-

got. Wî, ji wî rexî ve, Genco ji xwe bistehtir dît û hest bi hindê kir ko helperistiyek di nava wî de jî maye. Şêroyî hest bi hindê kir ko ew di derheqê Gencoyî de yê dijwar bû û kêm tişt, Genco ji tiştekî ne razî bû û wî ew nerazîbûna xwe aşkira dikir û hewil dida ji wan probleman re çareseriyan peyda bike.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## – 12 –

Her digel şerrawestandinê û axiftinên aşbûnê di navbera Iraqê û Îranê de li Genêvê, li bin sihwana Neteweyên Yekgirtî, hukumeta Iraqê ji nav de dest bi şarandina şerê din kir; şerê jinavbirina kurdan û xwecihên Kurdistanê.

Hîngê Şêroyî çav bi Gencoyî keftin, lê çi axiftin li ser hindê pê re ne kirin, ji ber ko bi dîtina wî dem, ne yê pit pit û cirrenîxan bû. Kîmyewî û gazên jehrîn gund û bajêrk û bajarên Kurdistanê, xanî û dibistan û dêr û mizgeftên wê werdipêçan û dixwarin.

Top û agir weke baranê bi ser xelkê de dirijiyan. Holakoyê Iraqê bi hemû tuxmên çekên xwe yên giran û kujek û jinavbir ve êrişên xwe dianîn ser Kurdistanê û hişk û ter, zaro û pîr, jin û mêr, hemû tişt didan ber şaloka xwe ya kujek û kîndar. Enfal bûn, êrişên tuximperist û durunde bûn û mebest jê nemana mirovê Kurd bû, nemana Kurdistanê û xelkê wê bû, nemana her tiştekî bû ko bikeve ber wan û ber wê kiryara wan.

Hemû, mirov, balinde û tilor, terş û tewal, dar û bar, giş jehrî dikirin, disotin, dikuştin. Wê karesatê li pêş çavên her kesekî rû dida, dibin destê faşiyan de bêhinhilkêşan jî bûbû mirin.

Carekê, wextê çavê Şêroyî bi Gencoyî keftî, wî da dilê xwe ko pirsyarê jê bike ka dîtina wî ya niha çi ye û ka hê weko berî nuke hizir dike, lê ya dev li wî girtî reftara Gencoyî bi xwe bû, ko şêroyî didît ka çawa wî xwe xistiye ber xizmeta xelkê sewdaser û derbider û perîşanbûyî. Şêroyî jî wextê hindê nebû ko gêngaşeyan bike ji ber ko ew mijulî arîkariyê bû; arîkariya xelkê dikir bona ko xwe zû bigehînin ser sinûran bi bakûrê Kurdistanê re û xwe derbasî aliyê din bikin, hêşta êrişa enfalan ne gehiştiyê û ew jinavnebirîn.

Carna jî çavên wî bi çavên Gencoyî diketin û didît ka çawa serê Gencoyî ji şerman de li ber wî ranabe. Belê, Şêroyî şerimjixwekirinek û jixwenerazîbûnek di çav û dêmê wî de didîtin.

Di êrişê de herdu, Şêro û Genco, birîndar bûn; kîmyewî ji navçavên Gencoyî girt û destê Şêroyî yê çepê bi dijwarî hate birîndar kirin. Herdu

mabûn li ber derê şkeftekê, li ser rêya, ko diçû ber bi bakûrê welatî û gelek nêzîkî tuxîban bû.

Şkeft tijî birîndar bû, pir bû ji kal û zarok û jin û mêran. Revdeyên xelkên perîşanbûyîn, yên ko hemû tişt û mal û heyîna xwe li pey xwe hiştibûn, yên ji dehbeyê kuştinê û kîmyewî reviyabûn, bi wan çel û çiya serdikeftin û di ber deriyê şkeftê re, ber bi bakûr diçûn. Di wan delêveyan de Şêroyî mêzekire Gencoyî, yê ko çend pêngavekan ji wî wêvetir raketibû û bi dengekê birîndar û mandî gotê:

— Ha birayê Genco tu niha çi dibêjî? Te dît rawestandina şerê Iraqê û Îranê li ser kîstê kê timam bû? Yan jî eve derdê me ye; em baweriyê bi serboran û ya rastîn nayînin heta ko em careka din, di wî serborî de nejîn û bi çavên xwe nebînin. Xuya ye hinek hene hez dikin her di serborgeriyê de, di ezmûngeriyê de bijîn û miletî ji xwe re bikin baxçeyê ezmûn û taqîkirinan.

Birîna Şêroyî gelek diêşiya û ne dikarî gelek li ser hev bipeyive û bêhin lê maliq dibû. Genco jî yê bê deng û mit û serçemyayî bû, te digot qey ew çûbû cîhaneka dî û ketibû nav malxulyan û dalxeyên kûr û dûr. Piştî pîçek bêdengiyê Şêroyî domda ve axiftina xwe:

— Ax ji me û vê mejî hişkî û serreqiya me. Çima em weha ne. Li ser darê dinê çi miletekî ji bo serbestiya xwe hindî kurdan pêwîstî bi yekgirtinê nîne û em xwe di vê rastiyê de nagehînin.

Axiftina xwe vebirî û çavên xwe ji ser Gencoyî ranekirin û her weçku dixwest ko ew bipeyive, lê Gencoyî lêvên xwe ji serêk ranekirin û Şêro neçarbû bipeyive ve, bi hêviya ko ew bi wî rengî Gencoyî pal bide axiftinê:

— Ax ji vê demokrasî û azadiyên mayîne peyv û di jiyana me ya rojane de nehatine bikaranîn. Bes e ko du kes ji du partên cuda bin, bona ko neyartiya hevudu bikin û senga xebata xwe bêxin ser hindê bi tenê û ji aliyê din ve dibêjin miletî: em daxwaza demokrasî û azadiya bîr û bawer û xebata siyasî dikin. Erê gelo, heta kengî xwediserdabirin û direw li xwe û li xelkê xwe kirin? Heta kengî dozkuştin? Kengî em dê bi rastî hewil bidin ko em di hizirkirin û peywendî û reftar û danûstandin û kar û jiyana xwe ya rojane de bibin mirovekê kurdistanî yê azad û demokratîk. ko ew azadî û demokratiya me ji xwe re divêt em wê ji hemû xelkê xwe re bixwazin û bi destvebînin.

Şêro di germiya axiftinê de bû dema ko Genco ji raketinê rabûye ser xwe û temaşayî birîndaran û refên derbiderbûyiyan kirî û paşî têndaye


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Şêroyî û got:

— Birayê Şêro te rast got, lê mixabin ez dereng bi ser rastiyê hilbûm. Lê ez di yek gotina xwe de dê dijwar bim û ji wê dijwariyê nayêm xwarê, ew jî ew xinizkarî ye ya ko di derheqa miletê me de tête kirin. Neyartiya hêzên Kudristanê û pevçûnên wan yên berdewam, di wextekî de miletê me tê jinavbirin, ne bes çewtiyek e lê xinizkarî ye û yê pê radibe çi kes be û çi jî part û rêxistin be gunehkar û xinizkar e. Evê, ez jê nayêm xwarê, lê ewa min di derheqa rawestandina şerî de gotî, ez lê peşîman im û ez çewt bûm.

Digel hewkirina axiftina xwe Genco ji cihê xwe livî û berê pêyên xwe dane wê rêya xelik jê dihatin, ber bi pêşiya êrişa leşkerê Iraqê. Ew li pişt xwe nezivirî û wî xwe li tikayên Şêroyî û kesine din negirt ko ji wî xwestin bimîne û ji wê derê neçe, ji berku birîna wî dijwar e û baş nabîne. Şêroyî lê kire gazî:

— Genco! Bizivire pismam, û bila dilê te bi gotinên min ne êşe. Were ve, tu nikarî şerî bikî. Ez ji tingijîn û êşa xwe van axiftinan dikim.

Lê Genco ne vegeriya û tivenga xwe ji milê xwe vekir û xiste nav lepên xwe û sirûdeka agirîn û dilveker ji sîngê wî, ji gewriya wî derdikeft û ber bi pêş diçû û li paş xwe nedizivirî.

## – 13 –

Tiştek hate bîra Şêroyî, wî bi dengekî bê qam bilind kire kenî û kelevajî ser teniştên xwe bû. Êdî keniya xwe ji dengvedana wê nas nekir »canê canemerg û miriyan ji kavlankan, ji laşên wan dihên derê, derdikevin û difirin û bilind, di bayî de dimînin hilawîstî li benda ko bikevin nava kavlankine din, laşine din«, ev teoriya felsefî hate ber hizra wî. Wî çaxekî henekên xwe bi vê lênerînê dikir, lê niha dibêje xwe »dibe ko ev teoriye rast dibêje, hema bêguman rast e.«

Tava hilatî xwe di laş û canê wî werkir, wê çavên wî bi geşî û germa xwe ya havînî vemaliştin. Lê hê kilmîş û gilîze û birs û serma û xwîn û ax û tiştine din digel bêhin û sehma ewrên kîmyewî di nava wî de têkel dibûn. Wan şilqênek bi wî dixist û ew radikire ser pêyan. Wî destên xwe li çokên xwe dan û ew li ser pêyên xwe yên giranbûyîn rawestiya. Her weko wî dixwest hêza pêyên xwe nas bike, ka dikarin wî li ser xwe ragirin ya na. Hêvkire dewr û berên xwe, paşî hemû tişt û rûdan û ya qewimî, mîna filmekê sînemayî hatine pêş çavên wî. Ew di nav xwe de tingijî û wî bi xinzirîn gote xwe:

— Ma heta kengî xudan şiyan û hêz dê lawaz û hejaran tepeser bikin? Ma heya kengî dê heqiyê li bin neheqiyê tire tir be? Xwe ne dê heta hetayê weha be?

Wî xwest li tavê mêze bike û daxwaza bersivê jê bike, lê ew ji geşatiya wê nikarî lê binere û berê çavên xwe wergerandin bo ser Zinarê serbilind û kûfî xwar. Belê, wê gavê li cem wî, ji wî Zinarê her tim li cihê xwe mayî, hemû raman û pejin û ruha xweragirî û berxwedan û reseniyê dipeşiyan. Hest bi xwe kir ko hêzek ji wî çiyayê sehimdar tête nava wî û wî jî weko xwe lêdike.

— Çima na? ji xwe pirsî û weko kewê rubad sînga xwe deranî û perand. Ez kurê vî çiyayê hemîşe kevnar û nû me, ez kurê Zinarê serbilind im û her ji ber hindê jî divêt ez jî heta hetayê weko çiyayê xwe li cihê xwe bim. Çi hêz nikarin min û çiyayê min ji hev dûr bixin. Belê, dê evîna wî di dilê min yê siyamendî de her û her şîn bimîne.«

Wî ev ji xwe re got û bejna xwe ya dirêj û tijî rast kir û serê xwe bilind kir, her weko wî dixwest zehrî çiyayî bike. Destên xwe birine cil û kincên xwe yên peritî û ser û bin lê rast kirin û paşî ew dest dane pişt xwe û hat û çûneka tawûskî û qiralkî kir.

— Bo çi na? Wî ev pirse çend carekan, bi mendehoşî û azirîn ji xwe kir û axiftina xwe bi xwe re domand. ko em ji nû dest pê bikin ve, lê çawa? Em her wî tiştê dubare û sêbare û dehbare bûyî careka din, ser ji nû çendbare bikin ve? Yan em bi awayekê din, yê nûtir, bi rengekê wecwergirtî ji çewtî û qenciyên metodên berê, ji nû dest pê bikin ve. Lê ya giring ew e ka em çawa nûtiyê û nûkirinê têdigehin. Em çi pirensîpan jê re datînin û em çawa avakirina wê dibînin û çawa bi cih diînin.

Malxulyanê mîna landikê ew veleqand û niqoyî deryaya xwe ya bê bin kir. Vehewyayên geliyê Bazê hatine bîra wî. Ew gelek bûn, ne yek û ne hezar, lê bêtir bûn. Zaro, pîrejin, pîremêr, genc û pîr, ji nêr û mê û ji hemû temenan bûn. Hêşta karesata Helebçe kevin nebûyî, wan ji Hitler û berşiyên wî xerabtir kir û yên di geliyî de, di geliyî de kuştin û binbir kirin.

Destên wî di berîkên wî de, li kaxezekê û qelemekî gerhan, lê berîk vala bûn. Ew rawestiya û ser li xwe xurand û bi rengekê bêzjixwe kirî tif kire xwe û gote xwe:

— »Ma kaxez û pênivîs ji te re bo çi ne? Qey dê ew ji bîra te biçin? Na, giş, bi dêm û navçav û sîmayên xwe ve li bîra min in. Belê, ew bi wan xem û tirs û xweragirî û hêvî û bêzarî û tiştine din yên pîroz, ko di nav çavên wan de dikirine qêrî û xiriqên, li bîra min in. Ma ez çawa wan ji bîr dikim, nê ew ez im û ez jî ew im. Yê ew dîtine dibe ko xwe ji bîr bike lê ne wan û wê perîşanî û trajîdiya ew tê de bûn.

Firokeyan barana mirinê bi ser wan de dibarand. Ew di agirê Nîronê Bexdayê de dişewitîn, ez û Zinar û Metîn û Xudî û kujek bi tenê bîner bûn li ser wê kuştarê û cîhanê hemûyê jî ageh jê hebû. Wey xwezî ez bi wan re mabama û ne xweziya vê bîneriya ez ketimê.«

Di geliyê ko bûbû goristaneka gorvekirî de hat û çû û ne dizanî ka ew bi durustî li pey çi digerhe, lê hest pê dikir, hêzek wî pal dide ko tiştekî bike. Hind dît, bivrek û qelemekê hesinîn di destên wî de nin. Û li ber wî dareka pir mezin, ko bombeyan ji binî ve qirandibû dirêjkirî ye. Xwe dît bi bivrî dikeve ber darê. Wî tîvilê wê ji ser havêt û dara xwe baş hulî kir. Bi navên wan hemûyan yên ko di gelî de hatibûn kuştin sûnd xwar ko karê xwe bigehîne dawiyê.

Wî şev û roj kirine yek û dev ji wê xebata xwe berneda. Dêmên wan çendhezarên şehîdbûyîn li ser bejna darê dinexşandin, hildikolandin. Çi tiştekî ew xav û sist nekir; ne têhin û birs û êş û janên laşê wî û ne jî dengê balafiran û gurmên û peqîna top û bombeyan û ne jî bêxewiyê.

Wî, digel wî karî, dest pê kir baweriyê bi tiştekê din jî diîne; ew jî roja vejîn û sizadanê, roja »qiyamet û hisabê«. Lê bi metod û dêtina xwe ya taybetî û weha ew bawerîpêkirin ji xwe re şirove dikir:

— Vejîna mirovan bi destên mirovan. Roja vejîn û sizadanê ew e ko hemû tepeser û perîşan û bindest, yên mirandî û yên nivandî, sindirîkên xwe bişkênin, kifnên xwe bidirînin, xewa xwe biveçirînin û serî hil bidin û bibine lihî û lafaw, bibine dadgeh û dadwer û dest bidin hefka zordar û ziyankaran û wan siza bidin. Sembol û peykerên tepeserkirin û koletiyê bişkênin û xende û bişkurînan vebigerînin ve bo ser lêvên jiyanê li vî welatî. Ew roj jî hîngê dihêt li dema ko mirovên me di piraniya xwe de li xwe û li doza xwe bi xwedî derdikevin.

Digel vê diyalogê bawerîbixwekirineka mukum li cem wî çêbû û ew li ser karê xwe bêtir rik û rijd bû. Mirovên weko wî, ji hemû tiştan bûyî, kes û kar û niyas lê tera bera bûyî, ne gund û bajar û mal û cihwar jê re mayî, westiyayî, birsî, tirsiyayî, rezîl û birîndarbûyî di ber wî re derbas dibûn. Ber bi parçeya din ya welatî, ber bi bakûr diçûn. Ji zulma dagîrkerekî direviyan ber zulma dagîrkerekê din, lê çawa be, miletê li nêzîkî sinûrên çêkirî, her çend ew jî bindest û perîşan e, lê ew jî kurd in û welatê wan yê dagîrkirî jî parçeyeka Kurdistanê ye.

Ya kêfa wî pir pêhatî ew bû, çi kes bê awir û têbînî di ber wî re ne dibuhurîn. Gotinên cur bi cur ji devên wan derdikeftin:

— Ax Xwedêyo ma edaleta te bo kengî ye?

— Derew e, rojhilat û rojava, hemû tinazên xwe û bazarî bi me dikin û em di dest wan de lîstikek in.

— Me xwe li benda hinekan hişt û me guh neda gotina dibêje: her reşo bi destên xwe heke avê tu birî.

— Em hind dilsoz û xemxorên doza xwe nebûn, hindî em dilsoz û xemxorên doz û pirsên miletên dîtir bûn.

— Manê heta niha jî kurd hene weko iraqiyekî yan tirkiyekî yan îraniyekî fikir dikin û mîna wan tişt û pirsan şirove dikin û hêşta ne hatine ser hindê ko bikaribin bi durustî, hiştî kurdistaniyekî bijîn û hizir û reftar bikin.

— Xuya ye ev dînbûye, heke ka çi raman di vî karê wî de ye û ka eve

wextê hindê ye mirov xwe bi darî û resimçêkirinê ve mijûl bike.

— Pa ez dibînim karê wî ji yên me hemûyan durustir e.

— Pa heke wesa be û tu vî karê wî bi tiştekê baş dibînî, fermû here arîkariya wî bike û weneke ew bi tenê bimîne.

— Min ew hêz tine ye û ya din jî min bawerî bi çi nemaye û ez pir bêzarbûme.

— Her kesê bixwaze ji dil û bawerîpêkirin tiştekî bike dê karibe bike. Lê divêt, wî kesî, berî her tiştî, bawerî bi wî tiştî û bi wî karî û wan metodan hebe û mixabin baweriya me gişan weko xwe nemaye û hatiye sistkirin.

Van deng û gotin û rayên jêkcuda ew xav û sist û bêzar ne kir lê bi pêçewaneyî wê, wî bi girgirtî dom da karê xwe. Gotinên dawiyê yên bi ber guhên wî keftîn ev bûn:

— Lezê bikin, leşkerê Iraqê nêzîkî me dibe û çi nemaye me dormandor bike.

— Hey li wî û babê wî yê xwe qurtal bike.

— Birevin, eve faşî û kujekên Iraqê bi ser me de hatin.

Wî qet hest bi tirsê nekir, lê lez li karê xwe kir. Dêmek bi tenê mabû û bi çêkirina wî dêmî karê wî timam dibû, lê ew dêm ne dihate bîra wî. Dêm yê zarokekî bû, zarokeka sava ko di himbêzên dayika xwe de, bi wê re hatibû kuştin. Dixwest dêmê zarokî jî bêxe ser wî cihê li ser darî, bi rex dêmê dayika wî ve, jê re mayî vala.

Bizaveka dijwar digel xwe kir bona ko navçavên wî di mejiyê xwe de wêne bike, lê bi dest ve nehat. Dibe ji ber ko zarok berî kuştina xwe bi çend seetekan ji dayik bûbû û hê ruxsarê xwe yê durust ne girtibû. Dengê peqîn û teqîn û balafir û dengine nexweştir nêzîkî wî dibûn û hilma kîmyewî ya kujek xwe li difnên wî dida. Lê hizra wî mabû bes li ser dêmê wî zarokî bi tenê bona ko wî jî bêxe ser bejna darî, bi rex wan çend hezar dêmên din ve.

Çi nemabû êriş nêzîkî wî bibe. Çavên xwe niqandin û cîhana derve bi hemûve ji hizra xwe dûrxist û hizra xwe bi hemû ve xiste ser dêmê zarokî û ka çawa bû. Tefşiyê di dest wî de, hê li ser wî cihê vala yê li ser darî bû, li dema ko qêriyeka dijwar ew veciniqandî û cilfek pêxistî. Ew qêrî ji kê û ji kûderê hat, ji wî, ji darî, ji kê, wî nezanî. Lê ya ew pê hesyayî dar êdî nemabû dar û dema çavên xwe niqandîn û vekirîn ve, dit ko li ser wî cihê vala di darî de, dêmê zarokekê di xwînê de werbûyî çêdibû, geş dibû û ronahî jê dipeşî. Ew dêm bi dêmên din yên li ser darî re bi can dikeftin û

dibûn mirovên bi goşt û hestî. Di wan gavan de dengên durunde û hovên Iraqê nêzîkî wî dibûn û wî neviya darî bi tenê bihêle.

Temaşayî Zinarî kir û xwe weko wî didît, mîna Zinarî li cihê xwe mayî û mukum û xweragir û biryar stand ko darê xwe ji êrişa faşiyan biparêze. Lê çawa? ji xwe pirsî. Hizra rakirina wî kir, lê dar yê giran bû. Xwe dît ko hêzek di nav wî de, destên wî pal dide û di bin darî re dibe û wî xwest bi hemû hêza xwe ve darî ji cihî bilivîne. Tiştê ko çirîse bi serê wî xistî ew bû, dar bi xwe, ji cihê xwe livî û weko zarokekê pir sivik kete ser destên wî û li ser milê wî binecih bû. Ronahiyek ji darî diçû û car bo car geştir dibû. Hemû dêmên li ser darî bi ezman dikeftin û sirûda »Herne pêş....herne pêş« bi dengekê bilind û hêzdar ji devên wan derkeft. Wî hest bi hindê kir ko dar bilind dibe û ew jî pê re bilind dibe û digel darî difire.

Leşkerê Iraqê jî berê tev çek û amîrgeha xwe ya şerî û kuştinê dida darî. Lê kêla çekên wan her dibûn ew bi xwe. Tevaya agir û gulle û bombeyên wan vedigeryan bo wî cihê jê derdikeftin û her bi wan bi xwe ve dipeqiyan.

Wî xwe didît yê li hindavî Suleymanî û Duhok û Mehabad û Diyarbekir û Kerkûk û Sine û Dêrsim û Erbîlê. Li hindav tev bajar û bajark û gund û hîşetên Kurdistanê. Didît ko giş rûniştivanên welatê wî li derve ne, çavên gişan bi darî ve girêdayî ne û ew pevre, bi dengekê dijwar û pir xurt, duruşm û sloganên mîna hev dibêjin. Dêmên wan yên li ser erdî her mîna wan dêman bûn yên wî li ser darî hilkolandîn.

Wê gavê wî dizanî ko canê canemergên Helebçe û Behdînan û sertaserî Kurdistanê dadikeftin bo nav wan laşên li ser erdî mayîn. Her canek li ser gelekan belav dibû û weha xelik hemû digehandine hevudu û dikirine yek hêz û ew hêz dibû lihî. Wê lihiyê dijminên mirovatiyê, faşîst û nifişperês radimaliştin. Piştî ko lihiyê hemû erd vegirtî, ba û bahoz û lihî rawestiyan û dibû roja vejîn û sizadanê.

— Şêro! Hilo rabe hê baranê xîveta te ne birî.

Wî bi wî dengî ageh ji xwe bû. Seh kire xwe, wî xwe ji serma û sirê werpêçabû serêk, baran ji banê xîveta tenik û dirhayî, ji teniştên wê yên kunkun hatibû ser wî û bin wî. Wî lêvên xwe miçandin û lama xwe ya jêrî gest. Wî serê xwe hijand û ew bi herdu destên xwe girt û givaşte serêk. Dixwest xwe qayil bike ko ew, ya ko wî dîtî, rast bû. Çavên xwe girtine ve û xwest hizra xwe bêxe ve ser wê bûyerê, lê dengê cendirmeyan û çadira diryayî û birs û sermaya wê derê û sîma ko kempa Mêrdînê dormandor dikir, guman li nik wî nehişt ko ew, ya ko wî dîtî, ne rastî bû lê xewnek

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bû. Lê di nav wî de baweriyek hebû ko çi zû û çi dereng dê her tiştekê wisa rûbide.

## – 14 –

Ew çend heyvek bûn li ser hatina wî bo bakûrê Kurdistanê derbasbûbûn. Wî wesa hest pê dikir her weko ew ji devê gurgekî verestine bona ko bikevin bo nav devê gurekê dî ko bi dîtina wî Tirkiya bû. »Ew dixwazin me ji xwe re bikin dûvelank û me ji bo berjewendiyên xwe bikarbînin, hey pa xişîm in. De bila di kevilên xwe de birizin«, ev gote xwe û hizra wî kete ser tiştekî; Ka çawa wê nalenal û janên wî xelkê derbiderbûyî û li qinarêdayî bigehîne cîhanê.

Hêj defterkên wî pê re bûn, di yekê de navnîşanên dost û hevalên ko ji welatî derketibûn hebûn. Berperên wê vedan û li navnîşana hevalekî ko demekî pêşmerge bû li devera Berwarî Bala, gerha. Wî pêşmergeyî welat hişt û derkeft derê û piştî derkeftî kaxezkek ji Şêroyî re şandibû û tê de navnîşanên xwe jî nivîsandibûn. Wî navnîşanên wî hevalî dîtin û kêfa wî pir bi hindê hat.

Wî hizra xwe di hindê de nekir ka ew heval dikare çi bike û çi neke, lê ya giring li nik wî ew bû ko wî kesek dît ko dikare ya di nav xwe de, wê lihiya pengiyayî berde ser kexezekê û ji wî re bişîne. Qelem bi dest xwe girt û kete ber nivîsandinê û piştî çendekê ev kaxezk ji wî hevalî re nivîsand:

»Silavên mişextî û derbiderî û rezîliyê!

Kekê min, ez nizanim çawa vê kaxezkê ji te re binivîsim, çunkî eger ez ya di dilê xwe de hemûyê ji te re bibêjim, kaxez têra nakin.

Îro her kesekî, her gund û bajarekî, her çiya û geliyekî, her darekê û her tilorekî çîrokeka xwe ya pir xemgîn û bi jan heye.

Her piştî ko Îranê biryara 598-ê qebûl kirî, xwecihên deverên azadkirî ketine di teqeleqê de. Çunkî giş di wê bawerê de bûn ko dijmin dê êrişekê bîne ser wan. Rejîma Iraqê her zû hemû hêzên xwe ko hejmara wan nayê gotin vekişandine Kurdistanê. Bawer bike çi hêzeka weha mezin ne birbû, ne Faw û ne jî Mihemereyê.

Enfalan, ji hemû deriyan dest pê kir: Ji Akrê, Dînartê, Nihêlê, Bakurman, Şêxan, Etrûş, Duhok, Zawîte, Sersing, Mangêş, Dêrelûk, Şêladiz, Geliyê Zaxo, Batûf, Bêgova, Kanîmas, Amêdî, Qediş, Bamernê,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dûkerê û hemû cihên dîtir mîna Senat, Şeraniş, Kişan, Balole, Hiror, Bêduh, Deştanê û li seranserî Kurdistanê.

Iraqê li 18/8 1988-ê pilana xwe ya Enfalan û destpêkirina êrişan danî. Mebesta wan girtina sinûran û paşî jinavbirina kurdan û xwecihênKurdistanê bû. Di 25.08.1988-ê de firokeyên cengî bi awayekê berfireh gundên deverê dane ber bombeyên kîmyewî. Xelkekê pir hate kuştin.

Di 28/8 1988-ê de êrişa dijminî ya mezin, ji wan hemû rexên min li jor destnîşankirîn û bi mebesta girtina tuxîban û ji kurdan re deynana kuştargeha giştî, dest pê kir.

Xelkê, mal û tiştên xwe hêlan û bi canê xwe bi tenê ve derkeftin. Rewşeka weha peydabû ko di xeyala mirovan de nebû. Her pêşmergeyekî û her çekdarekî berê xwe da mala xwe bona ko wan biparêze û wan derbasî sinûran bike.

Sehmeka mezin bi serê xelkî keft û ew ji hêz keftin. Şer ji me nehat. Her yekî ji me xwe dît yê bi tenê. Nêzîkî 70 hezar kes hatine ser sinûrên ko li ser navê Tirkiyê ne. Gelek jî bi rêve mirin yan ketine nav destê dijminê har û hov. Çendhezar malbat di geliyê Bazê de ketine nav destên neyarî û hemû berzebûn û dibêjin ew di 29/8 1988-ê de, bi bombeyên kîmyewî hatine jinavbirin. Rewşeka wisa tengav û aloz bû ko keç û kur û dayik û bab û jin û mêr hevudu wunda bikin.

Gelek jê ketine nav xefk û boseyên dijminî; çwar zarok di sevîkekê de li ser pişta dewarekî ketine dest dijminî û ji hinek malan, ji hejmara bîst kesan, yek jê ji dest dijminî qurtalbûye. Hinekan jî heya vê gavê jî ageh ji kes û karên xwe, ji dayik û bab û zarokên xwe nîne û nizanin ka çi bi serê wan hatiye.

17 kes ji gundê Çelkê, 11 kes ji gundê Kurêmeyî û gelek ji gundê Wermêlê hatine girtin û di cih de gullebarankirin. Piraniya wan yên ko xwe dane dest Iraqê her di cih de, piştî êxsrîrbûnê hatine kuştin. Yên ne kuştîn jî girtin û birin bo deşta Erbîlê. Ew di wan ordîgehên zoremilî de pir rezîlbûn e.

Hindî gundên devera Behdînan bûn xwe kolikek jî ne hiştiye, hemû xanî û gund û tişt û mişt sotin û xerab kirin. Piraniya rûniştivanên deverê berî hatina leşkerê Iraqê xwe gihandine ser sinûran digel Kurdistana bi ser Tirkyê ve.

Di 29/8 1988-ê de hemû peywendiyên me bi serkirdayetiya pêşmergeyî re hatine birîn.

Hêzên leşkerê Tirkiyê pêkul kirin rê li ber me bigirin lê neşiyan wê lihiya xelkî rabiwestînin û bo paşde vebigerînin. Qereqolên wan gundan daxiryane ser wan sinûran û ketine nav jin û zarok û pîremêran û ew dane ber qontaxên tivengên xwe û xwestin wan bavêjin ve bo nav agirê şerî, bo ber bombe û top û jehra Iraqiyan.

Rewşeka gelek nexweş û tengav bû, bawer bike, wî halî carna em wisa tengav dikirin, ko bû egera hindê ko hinek, xwe ji xeman û bêgaviyê bikujin.

Armanca Tirkiyê ew bû sinûran bigire û arîkariya Iraqê bike. Lê ji dest wan derkeft û ew xelkê bêzar û perîşanbûyî bi dar û keviran êrişî cendirmeyan bûn û cihên xwe di wan geliyan de kirin.

Piştî sê rojan Tirkiyê daxuyaniyek derxist ko dê me vebiguhêze kempan. Em deh rojan man li Colemêrgê û paşî em birin bo ordîgehê Silopiya. Kemp 4 heta 5 kîlometran ji Birehîm Xelîlan dûr e. Kemp bi dîwarekê bilind dormandorkiriye. Li ser wan dîwarên bilind têlên ji hesinî hene û stiriyên ji hesinî bi têlan ve nin.

Em di vê kempê de deh hezar û pênc sed kes bûn. Nêzîkî heşt sed kes di bin çadiran de bûn û yên mayîn li ber tehirka tavê bûn. Xwarin li wê derê tirşikeka zelal bû; dema mirovî nokek yan pirteka pitatan tê de dîtiba, da ji kêfan de giriya mirovî hêt. Bi kurtî xwarin, nan û aveka bi tematê şêlandî bû. Ça tune bû. Derkeftin ji kempê qedexe bû, seredan qedexe bû û arîkarî ji derve, ji kurdên deverê dihat, lê cendirmeyan ne dihişt ew bikeve hundurî kempê.

Piştî 15 rojan hinek ji me hatine veguhaztin bo kempa Mêrdînê. Hejmara me di vê kempê de nêzîkî 16 hezar kesa ye. Ha zivistan hat û hê em li bin çadirên diryayî nin. Li vir sermayeka zor heye û bayekê sar yê bi hêz dihêt. Cilkên zivistanê û nivînkên xewê tine ne. Her deh dwazde kesan sê çiwar betenî hene. Xelik neçarbûye ji tirsa sermayê, ji wan beteniyan, ji xwe re cilkên zivistanê çêdikin.

Gelek êş peydabûne; zikêşî û serêşî û gêjbûn ji hemû êşan mişetir in. Her roj neh deh zarok dimirin. Derman û dermankirin weko pêwîst nîne.

Birîndarên kîmyewî di nav me de hene, lê Tirkî dixwaze wan wunda bike yan weneke rojnamegerên biyanî wan bibînin. Me pir hewilda rewşa xwe, bi ruyê wê yê rastîn bêxin ber çavên Xaça Sor û Amnestî û Parlementoya Ewrupî û rojnamegeran.

Di van rojên dawiyê de otomobîlek carna cilka û pêlavan û tişt û miş-

tine din tîne û difiroşe, lê belê giran, bi du qatî bazarî difiroşe. Niha tiştên hişik yên xwarinê mîna noka û nîska 10 rojan carekê didin me û ew pir kêm e û carna ew deh rojên wan dibin 15 û 25 roj. Hindî birinc û şekir e bi çavan jî nayên dîtin.

Hizir bike, di van rojan de cendermeyan naylon anî bona ko bi ser çadirên diryayî de vedin û gotin eve ji we re 25 hezar metrên naylonî, lê dema me naylon pîva derket 7 hezar metir. Evca her tiştek û karek li vê derê, bi vî terzî û vî awayî ye. Bertîl rolekê pir mezin dileyize û çavên berpirsyarên Tirkan heta li wî parîkî jî ye yê di devê me penaberan de.

Her weko ji gotin û reftarên Tirkiyê xuya dibe, ew me bi penaber nastîne. Hindî ji dest wê dihêt, ew probleman ji me re çêdike û jiyana me li vir nexweş û tengav dike bona ko em bêgav bimînin û xwe bidin dest Iraqê. MÎT penaberan dibe vekolînan û ji wan dixwaze ko bi wan re kar bikin. Dema kesek gelek ne xweş dikeve, ew wî dibin nexweşxaneya bajêrî lê nahêlin çi kesek ji kurdên wî bajêrî pê re bipeyive û eger kesekî hewilda bi wan re bipeyive, mîtên bi nexweşî re, wî kesî didin ber zileh û şeqaman.

Ji bilî penaberên Silopiya û Mêrdînê, 13 hezarên din jî di kempa Diyarbekrê de ne û 7 hezar di ya Mûşê de ne.

Di vê dema dawiyê de sê xwepîşandan di kempan de hatine kirin. Yek ji wan di 12/9 1988-ê de, di kempa Silopiya de, li dijî rewşa kempê ya pir xerab hate kirin. Rojnamevanên rojava hatin bo nav kempê. Cendirmeyan jî birîndarên kîmyewî ji ber çavan veşartin bona ko rojnameger wan nebînin. Penaberan jî ji cendirmeyan daxwaza wan birîndaran kir ji bo ko rojnameger wan bibînin û li ser wan binivîsin, lê cendirme û polîsan guh neda daxwaza penaberan û hevalên wan yên birîndar neanîn. Penaberan jî xwe bê deng nekir û dest dan kevir û beran û êrişî cendirme û polîsan bûn. Cendirme û polîsan jî berê luliyên tivengên xwe dane penaberên xwepîşander û gullebaran kirin. Du penaber hatin kuştin û sê birîndarbûn û her weha çend cendirme jî birîndarbûn.

Di kempa Diyarbekrê de jî û ji ber reftara cendirmeyan ya nebaş digel penaberan, penaber û cendirme û polîs hevrûşî yekudu bûn û di herdu aliyan de birîndar keftin.

Bawer bike hindî mirov binivîse hê kêm e û mirov nikare hemû êş û janên vî xelkê me yê perîşan û derbibre bîne ziman.

Ez nizanim, gelo wujdana mirovatiyê miriye yan ageh ji vê karesata me

nîne, heke çima ew arîkariyeka rastîn ji me re nakin?

Mirov digel vî xelkî be û kesek be ji van çîrokan be, bê çîrok nabe û pêwîst e her yek ji me çîroka xwe bibêje û wê bi ziman bêxe.

Carna ji ber sermayê û nebûna lihêfk û beteniyan heta berê sibê xew bi çavên me yên mandîbûyîn nakeve.

Dibe ko tu bawer nekî ko eve ji sê mehan bêtir e, me, ne goşt û ne fêqî û ne zerzewat, ne bi çav dîtine û ne xwarine. Em di rêza toalêtê de nêzîkî seetekê radiwestin heta gera me û mîstin û rîtinê dihêt. Eve sê meh in, ji bilî ko carekê, di edebekê de, bi ava tezî, heke me ser û laşên xwe ne şûştine.

Tirkiyê di van rojan de xelkî dizoxîne bona ko derbikevin û kî ve biçin bila biçin, bes li cem wê nemînin. Piraniya penaberan weha dikin û formên daxwazîkirina mafê rûniştinê bo welatên cur bi cur pir dikin û piranî ji bo welatên ewrupayî ye. Ez bi xwe, bi rastî li dijî vî karîm e û ez pir pê diêşim û min navê xwe di çi lîsteyan de ne nivîsandiye û min çi formên ji wî rengî jî ne pir kirine.

Ez hindî tême xwe, ez nikarim dev ji welatê xwe ber bidim; dilê min her digel xelkê min e, bi bajar û gund û Kurdistana min re ye, digel wan de ye yên ko xwe ji bo azadiya me şehîdkirine.

Rast e kêmasî gelek hebûn û nexasme vê carê; serkirde û serkêşên me ji çewtiyan bûbûn tilove û hê dikin, lê divêt em ji bîra xwe nebin ko ev dirbê dijminî dirbê tirsinok û hov bû û bi tivenga rep û rût şerê kîmyewî nayê kirin. Lewma ez dibêjim ko pêwîst e em û nemaze rêber û siyasetmedarên me, bi ciddî li ser ya ko heta niha wan kirî û hatiye kirin rabiwestin. Wê hemûyê hilbisengînin û vekolînan li ser bikin û berî ko pêngavine din bavêjin bizanin dê çawa û bo çi û ber bi çi armanc û ber bi kûderê ew gav dê hêne havêtin. Divêt em li dû metod û rêçareyên nû û armancbertir û kêmziyantir bigerhin.

Ez li vir nizanim ka hûn, kurdên li Ewrupayê dikarin çi bikin, lê bêguman tiştek ji dest we jî dihêt û hûn ji me bêtir dikarin cîhana derve û raya giştî ya wan welatên hûn tê de dijîn li ser vê ya bi serê me têt agehdar bikin. Ji wan re bibêjin ko Iraq û dagîrkerên din yên Kurdistanê, me bi wan çekan dikujin, yên ko ew çêdikin û difiroşin van mirovkujan. Hûn dikarin dostên me li wan dera pir bikin ji bona ko destê arîkariyê dirêjî miletê me yê bindest bikin. Lê wan têbigehînin jî ko ew arîkariya wan ya bi rêya Tirkiyê dihêt, ji gayî guh jî nagehe me; Tirkî, eger ne hemûyê, piraniyê ji xwe re didize. Hûn, eger xwe hebekê biêşînin, dikarin di warê di-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ravî de alîkariyeka diravî ji miletê xwe re bişînin.

Heval, xwezîkên wê rojê em û hûn, hemû bi hev re di welatê xwe yê azad de hevudu bibînin û miletê me serê xwe bi tenahî û aştî dabine ser balgihê xwe.«

**Şêro, 18/11 1988, Mêrdîn**

Piştî ko Şêroyî kaxez timam kirî, ji wî hevalê xwe re şand. Paşî xatra xwe ji hevalên xwe yên di kempê de xwest û xwe bi şev vedizî û ji kempê derkeft û berê pêyên xwe da warkên caran li başûrê welatî. Şêro gelek yê bi lez bû ko xwe bigehîne wê derê. Wî digote xwe »xwezî neçarî hindê nebim ko careka din dest bidim ve tivengê û xwezî ko her tişt bi aştî û diyalogê bihête çareserkirin«. Lê wî baş dizanî ka çawa çeplelêdan bi destekî bi tenê nabe her weha aştî jî bi hezkirina wî û bi wî bi tenê bicînabe û divêt yên din jî baweriyê bi hindê bînin û ji dil bo hewil bidin. Hindî ew nêzîkî rûgehê dibû, wî, di nav xwe de, hesteka bêtir bi şadbûn û serbilindiyê dikir û her weko barekê giran ji ser milên xwe dihavêt û digel xwe sirûda nîştîmanî ya kurd »Ey reqîb« digot û rêya ber bi bûka dilî berneda û li pişt xwe ne zivirî ve.